كان للحوريين أثر وتميز كبيرين في استخدامهم للخيول. حيث أنهم كانوا بارعين في ترويضها بمعرفة كبيرة، وكان للحوريين معرفة واسعة في مجال الموسيقى خاصة «النوطة»، ونقرأ تأكيداً لهذا الكلام في نص مكتشف في أوغاريت، وكان الحوريون رواداً في تدريب الخيول واستخدامها في جر العربات أثناء المعركة.

وفي الأدب، منذ البدايات الأولى أسهموا في إغناء التراث الأدبي، إذ أنهم كتبوا الأساطير التي كانت تعكس تصورات خاصة عن قصة خلق الكون على شاكلة «إينوما إليش»، وعن أصول الآلهة وصراعاتها وعلاقاتها بالبشر، وألفوا أناشيد وحكايات مستقاة من الموروث الشعبي، كتبوا كل هذه المؤلفات بلغتهم الهندو– آرية. واستعملوا أيضا اللغتين الآكادية والحثية، كما اعتمد الحوريون الكتابة المسمارية في تدوين لغتهم، وهي لغة لا تنتمي إلى اللغات السامية ولا إلى اللغات الهندو أوروبية. يقول العلماء أنها لغة قريبة من لغة أورارتو الشمالية.

المثقف .. بين الوعي بالتحديات وتحديد الأولويات

يشعر المثقف اليوم أن مسؤوليته أصبحت الخوض في واجهات متعددة، الأولى هي خوض صراع مع ذاته أولاً، والثانية مع الأنظمة التي تلغي الصبغة الثقافية وبالتالي الإنسانية عن المجتمعات.

مصطفى عبدو

يلعب المثقفون دوراً مهما في شرح وتوجيه دفة الحراك الاجتماعي والسياسي في شتى الميادين لكن تنظير حالة ومشكلات المجتمعات واقتراح بعض الحلول لا يلقى دائماً الترحيب، بل يؤدي في كثير من الأحيان إلى حالة من الصدام والاتهامات المتبادلة، وفي النهاية يبقى المثقفون روح المجتمعات لأنهم أولاً وأخيراً جزء من المجتمع ويستطيعون التأثير بشكل كبير في توجيه المجتمعات وإضاءة الحقيقة ...

ابتعاد المثقف عن الأحداث

مفهوم المثقف نفسه لم يعد مفهوماً ثابتاً، فالمثقف على الرغم من تمتعه بقدرات فكرية ومعرفية، فهو أيضاً له استراتيجياته الخاصة. ربما أصبح سياسياً. أو ربما ظل على مسافة من التاريخ، ولا يتورط في اتجاهات معينة، ويحاول تجنب الأعاصير. في الأخير يتعين مراعاة المعطيات الملموسة للمثقف، وتفهم أسباب ابتعاده عن الحدث التاريخي الساخن، كون هناك فئات أخرى أقدر منه على مشاهدة ووصف ما يجري. من هنا يمكننا القول أن المثقف استخلص العبر من التاريخ، ومن الشعارات ومن الأيديولوجيات المثالية الطموحة، وبذلك، أصبح ربما أكثر واقعية وحذراً اليوم.

عندما يعود المثقف إلى هويته الطبيعية..

كانت العلاقة بين المثقف والعمل السياسي ضمن



تعبير عن المثقف

الأحزاب السياسية خصوصاً طويلة ومتشابكة، تغلب عليها الحماسة حيناً، والفتور والنفور حيناً آخر، يؤكد ذلك العديد من المثقفين، وأشار العديد منهم خلال كتاباتهم عن استغلال السياسي والحزبي للمثقف والتعامل معه باعتباره أداة تحشيد وتعبئة.

نتيجة لكل ذلك، يحاول المثقف اليوم العودة إلى هويته الطبيعية، كونه أولاً وأخيراً مواطن تعرض للابتزاز عقوداً خلال اندماجه في الأحزاب والمؤسسات المدنية وجمعياتها، كما يؤكد بعض المثقفين دوماً.

بينما يرى البعض أن العلاقة بين المثقف والأحزاب السياسية هي علاقة شائكة تحددها وتحكمها جملة محددات أو متغيرات، أهمها أن أغلب الأحزاب السياسية، حين تكون في مرحلة التأسيس تغلب عليها لغة الاحتجاج والنقد والثورية، فتظهر في ثوب ثوري مما يجعلها بحاجة إلى المثقفين. أما بعد مرحلة التأسيس ، ينتقل الحزب إلى مرحلة الوصول إلى السلطة. فيتحول تدريجياً إلى حزب آخر، ويحتاج بشكل أقل إلى المثقفين، لأن حاجاتها تتغير بدخول الحزب إلى «مرحلة الانحياز أو الموالاة».

بالمختصر، هناك هوة تتسع بين المثقف ورجل السياسة، أو لنقل بين ممارسة السياسة بحسب رؤية المثقف. ولعل أبرز مظهر لهذه الهوة، هو أننا لا نرى مفكرين بارزين في قيادات الأحزاب. ففي أحيان كثيرة يتقمص السياسي وظيفة المثقف فيسيسها، وينساق المثقف لإغراء السياسة فيتخلّى عن دوره النقدي كمثقف. وقد بدا واضحاً وجود هيمنة ساحقة للسياسي الذي أصبح يصول ويجول على شتى المستويات. يحدث هذا على المستوى العالمي مثلما يحدث في مجتمعاتنا. وعليه فالظروف الحالية أصبحت تتطلب من الجميع إيلاء صوت الثقافة والمثقف المكانة الاعتبارية اللائقة بهما.

أين يقف المثقف اليوم؟

كما سبق ذكره فالشأن العام في المنطقة، كما في العالم ، أصبح جزءاً من حياة المثقف بالقوة؛ بحيث كل شيء يتنفس الإشكالات الاجتماعية والسياسية

والاقتصادية والثقافية. فقد عرفت المنطقة مساراً طويلا من الصراع الشرس والعنيف والذي جعل المثقف يقف في الصف الساخن، ولم تتغير هذه المعادلة إلا في العقد الأخير، حيث دب الفتور في حماس المثقفين وفي مواقفهم. وبات المثقفون يشعرون بخيبة أمل وبمرارة ثقيلة، لأنه أصبح بين فكي كماشة. فلم يعد ممكناً إقناع الناس بالتغيير كونهم استسلموا لمجريات الأحداث، فمنهم من ساير اللعب واندمج فيه، ومنهم من انزوى صامتاً...

فيشعر المثقف اليوم أن مسؤوليته أصبحت الخوض في واجهات متعددة، الأولى هي خوض صراع مع ذاته أولاً، والثانية مع الأنظمة التي تلغي الصبغة الثقافية وبالتالي الإنسانية عن المجتمعات. وأهم شيء بالنسبة لهذا المثقف هو منح المزيد من الأمل لذاته ولقارئه ومجتمعه عبر صورة عودته إلى المساهمة في المعارك اليومية داخل المجتمع. ونرى بالمقابل زعماء بمستويات دراسية بسيطة وضحالة فكرية تجعلهم لا يخجلون من قول الشيء ونقيضه والقيام بعمل والتنكر له في الغد، ويستخلص أنه حين تغيب الثقافة تصبح الكلمات جوفاء، وتصبح السياسة في المجمل هراء.

من هذه الزاوية، لا يمكن للمثقف وهو يرى من يتصدر الواجهة وينظر للبلاد والعباد إلا أن يحزن ويضع يده على قلبه مخافة الآتي. لأنه يرى اللوحة مظلمة حقّاً.

المثقف ما له وما عليه!!!

كانت مشاركة المثقف في غاية الضعف خلال الأزمات التي عصفت بالمنطقة مؤخراً، محزن حقاً غياب المثقف، نعم محزن أن يغيب مفكرونا ومثقفونا عن خارطة الكلمات المفتاحية في مخاض المرحلة الحالية. لم يعد بالوسع السكوت واغتيال التفكير وبكل صراحة ووضوح نقول: أن حياة الشعوب تشهد حالة من اللامبالاة ولم يعد هناك خيار إلا بالمشاركة القوية من قبل الجميع وخاصة المثقفين في بذل الجهود وتحمل عبء المخاض العسير، واتخاذ المواقف الصعبة إزاء التغيرات الحاصلة وما تحويه من تهديدات. فالمثقف ملزم بابتكار أدوات ملائمة لخوض المرحلة، فقد مات وقت الادعاءات... فلنتقدم في مسار ينبئ عن استيعاب الأزمات وانعكاساتها بالبحث عن خطط لحياة تتسع للجميع في وقت أصبح الكل منشغل بالسعي خلف احتياجاته ومتطلباته ومصالحه.

تلك هي المهمة التي سيتولاها المثقف اليوم وغداً.. أن يتولى قيادة الدفة ويصدر التوصيات والمقترحات وهو الذي يجب أن يكون بمثابة البوصلة الأخلاقية التي ستوجه المجتمعات نحو عالم أكثر عدلاً وإنصافاً وأمناً أننا ننتظر منه أن يلعب دوراً بمثل هذه الأهمية وأكثر.

في النهاية، المثقف مبدع وفنان في تصوير الأحداث ورسم الخطط وله قدرة فائقة على إثارة الأحاسيس.

فمن غير المثقف يستطيع رفع صوت قيمنا المشتركة ؟

ومن يطلق الصافرات غير المثقف؟

قرية دورقليا

الأمر الآخر الذي يميز قرية دروقليا هو أنّ أول مدرسة كردية في روج آفا أسسها أبناء هذه القرية المخلصين، حيث افتتحت بشكلٍ رسمي بمراسيم مهيبة من قبل محبّي اللغة الكردية وأهالي القرية في ٢٠١١/٩/٦ باسم (مدرسة الشهيد فوزي)..

شريف محمد - وليد بكر

دورقليا قرية كردية تتبع ناحية شرا في مقاطعة عفرين، على بعد ٢٥ كم شمال غرب بلدة شرا و٦ كم جنوب قلعة النبي هوري. وهي الآن واقعة تحت الاحتلال التركي منذ آذار ٢٠١٨م.

كانت القرية تحوي قبيل الاحتلال التركي على ١١٠ بيتاً ويسكنها حوالي ١٦٠٠ شخصاً. وهناك اجتهادات حول أصل اسم القرية ، فرأي يقول أن اسمها مستمدة من كلمة يونانية والتي تعني (الرجولة)، وهناك رأي آخر يقول إن هذا الاسم أطلقت على القرية في عهد العثمانيين وهي كلمة تعني (مكان الاستراحة).

يعمل معظم سكان القرية بالزراعة مثل باقي القرى المحيطة بها تأتي زراعة أشجار الزيتون بالدرجة الأولى وكذلك هناك عدد من أشجار الفواكه المتنوعة مثل المشمش والرمان واللوز والتفاح والتين والخوخ والكرز والعنب، إضافة إلى زراعة الحبوب من قمح وشعير وعدس. كما أنّ البعض يعملون في مطحنة روكان، والبعض الآخر يتدبرون معيشتهم على تربية الأغنام والماعز والأبقار.

كان أهل القرية قبل تأسيسها يعيشون في خراب فيها مغارة قديمة، بعدها انتقلوا إلى مكان القرية الحالي وبنوا البيوت. ويعتبر إبراهيم جنجق أول من سكن القرية وبنى أول منزلٍ فيها.

تحدّ القرية من الشرق نهر عفرين الذي يمر من سهل بليسانك باتجاه مدينة عفرين، ومن الغرب مزار قره قوجه الذي يوجد فيه بئر لكنه جفّ فيما بعد، حيث أصبح مكاناً لمقبرة القرية، كما أنّ هناك ثلاثة آبار شرق القرية ما تزال مياهها متدفقة، ويتزوّد منها أهالي القرية بمياه الشرب ويسقون مواشيهم منها،

قرية دورقليا

وهناك نبع باسم نبع (قاني) شرق القرية حيث تتدفق مياهه حتى بداية الصيف.

وكان هناك مطحنة قديمة على النهر في سهل بليسانك. ويحدّها من الجنوب وادي حيرا – حيث يتدفق فيه الينابيع في الربيع وتستمر مياهها حتى أواسط الصيف.

كانت قرية دروقليا من القرى الأوائل التي انخرطت ضمن حركة التحرر الكردستانية، لذا سميت في أعوام التسعينات بـ (بوطان)، حيث قدمت الكثير من التضحيات والشهداء والمناضلين.

كانت توجد في القرية مضافة حيث كان يجتمع فيها أهالي القرية لتبادل الأحاديث والقصص والمعارف، وكذلك لحل قضاياهم ومشاكلهم، إضافة إلى كونها مكاناً لعابري السبيل والضيوف الذين كانوا يقصدون القرية.

وهناك معصرة قديمة لعصر الزيتون واستخراج الزيت لكنها لا تعمل الآن، بسبب ظهور المعاصر الفنية الحديثة، إضافة إلى ذلك يوجد معمل لصنع البطاريات ومطحنة حديثة باسم مطحنة روكن (نسبة إلى صاحب المطحنة فارس شيخو وزوجته روكن) التي تعمل مدة ٢٤ ساعة لتغطية نسبة كبيرة من حاجة مقاطعة عفرين من الطحين، وتعتبر هذه المطحنة مشروعاً اقتصادياً ووطنياً استطاعت إلى حدّ كبير من تأمين مادة الطحين لأفران المقاطعة، خاصة في فترة الحصار التي كانت تعيشها المقاطعة بسبب حصار المجموعات الإرهابية التي كانت تحاول بين الحين والآخر إخضاع عفرين لمشيئتهم عبر فرض الحصار الاقتصادي، وقد بدأت عملها في آذار ٢٠١٣

والأمر الآخر الذي يميز قرية دروقليا هو أنّ أول مدرسة كردية في روج آفا أسسها أبناء هذه القرية المخلصين، حيث افتتحت بشكلٍ رسمي بمراسيم مهيبة من قبل محبّي اللغة الكردية وأهالي القرية في ٢٠١١/٩/٦ باسم (مدرسة الشهيد فوزي)، حيث ضمت المجموعة الأولى من الطلاب ٣٥ طالباً وطالبة.

الصحافة الحزبية الكردية

- من التنوير وزاد معرفي إلى زواريب الحزبية الضيقة -

مع أن تسارع الأحداث أعادت الروح إلى الحركات التحررية ومنها الحركة التحررية الكردية، إلا أن صحافتها الحزبية بقيت في دوامة مخاطبة القارئ الحزبي بعينه، ثم دخلت تلك الصحافة في مستنقع السجالات بين أطراف الحركة ذاته..

إبراهيم بركات

«يقول العلماء انه كلما ازداد عدد الحواس التي تشارك في نشاط انساني معين زاد إحساس الشخص بما يفعل او يمارس»

لعبت الصحافة الورقية تاريخياً دوراً مفصلياً في بناء الحركة السياسية الكردية ومرتكزاتها الجماهيرية مع بواكير انطلاقة أول تنظيم سياسي كردي في منتصف الخمسينيات من القرن الآفل، فكانت قيادتها للمجتمع وحشد الرأي العام وتوجيهه من خلال الصحف الورقية، وأعني بالصحافة الحزبية الورقية، تلك الصحف والمطبوعات التي تصدرها الأحزاب السياسية تخاطب عبرها حاضنتها الشعبية والجماهيرية، بغية نشر مبادئ الحزب وبرامجه السياسية ومنهاجه الفكري والإيديولوجي ونضاله على المستوى الوطني حيث ترتكز أهداف والبرامج السياسية لأي حزب كان على قضيتين مهمتين الأولى: المطالبة بحقوق الشعب الكردي الثقافية والسياسية ورفع الغبن عن كاهل هذا الشعب الذي يعيش على أرضه التاريخية، والمهمة

الثانية: كانت لها بُعد وطني بالدفاع عنه وحماية حدوده واعتبار الشعب الكردي جزء من التركيبة الاجتماعية في الوطن، وتالياً يعتبر نفسه معنّي بكل ما يحدث ويحصل في الوطن.

كون قيام وتأسيس أي حزب نابع من استجابته لجملة من الأسئلة التي تشغل الرأي العام، ليناضل في سبيل البحث عن الأجوبة، بالاستناد إلى منهاجه السياسي والفكري، والتي يحدد وفقهما خياراته في النضال والكفاح، وتالياً تحقيق طموحات الجماهير في سعيها ونضالها لرفع المعاناة وممارستها لحياتها ببعُدها الإنساني والوطني في مسارها الطبيعي.

وفي تاريخ الحركات التحررية والثورية والتي كانت تقودها أحزاب الشيوعية والعمالية التي ناضلت منذ قيامها مرتكزة على النظرية الماركسية (الصراع الطبقي، هو محرك التاريخ) ، كانت الصحافة والمطبوعات التي تصدرها تلك الأحزاب تعتبر مناشير ثورية للجماهير الشعبية وتعبئته ودفعه لحشد طاقاته وإمكانياته في سبيل انتصار ونجاح الحركة في قيادة الجماهير، ووصولاً إلى تحقيق آمالها وطموحاتها.

لذلك فبقدر ما كانت الصحافة الحزبية هي الحامل لمطالب الجماهير الشعبية وطموحاتها في التحرر والعيش الكريم، كانت تلك الجماهير هي الحاضن الشعبية لتلك الأحزاب وديمومتها.

كما لعبت الصحافة الحزبية التقدمية دوراً رائداً في تزويد القارئ والمتلقي زاداً معرفياً وفكرياً يجعل منه قوة فاعلاً في مجتمعه، وتالياً خلق مناخات يؤسس لقيام حراك ثقافي اجتماعي من خلال تلك الشريحة الواعية والمثقفة التي تدرك الواقع وتقرأه قراءة واقعية وبموضوعية، وتضطلع بدورها في نشر الوعي والثقافة بين المجتمع، وإيجاد سبل كفيلة بتقدم وازدهار البنية الفوقية لهذا المجتمع تصونه من كل الأفكار والثقافة المستورة التي تهدد قيمه ومفاهيمه الأخلاقية الخلاّقة، وخاصة تلك الأفكار والمفاهيم القادمة من الدول الرأسمالية، والتي كانت تهدف اختراق بنية المجتمعات الناشئة، ومحاولة القضاء على هويتها وقيمها الوطنية، وضخ مفاهيم وثقافة رأسمالية، ونشرها في أوساط المجتمع، وخاصة شريحة الشباب.

ومع الانتكاسة التي أصابت تلك الحركات التحررية وأحزابها في مطلع التسعينيات من القرن المنصرم، وانغلاق الأفق أمامها، أدت إلى انحسار انتشار صحافتها ومطبوعاتها، بل أن كثير من تلك الأحزاب أصابها الوهن والترهل، وكون حركة التاريخ لا يمكن أن ترجع للوراء، استمرت كثير من الحركات والأحزاب الثورية في نضالها وسعيها لإعادة فتح الأفق أمام نضالها، وكانت الصحف والمطبوعات هي وسيلتها للوصول لجماهيرها وإعادة الروح لها.

ولعل الحركة السياسية الكردية والكردستانية، كانت من تلك الحركات التي تأثرت بالانعطاف الذي أصاب جسد حركات التحرر في نهاية القرن الآفل وأدت إلى تراجعها، ومع أن تسارع الأحداث أعادت الروح إلى الحركات التحررية ومنها الحركة التحررية الكردية، إلا أن صحافتها الحزبية بقيت في دوامة مخاطبة القارئ الحزبي بعينه، ثم دخلت تلك الصحافة في مستنقع السجالات بين أطراف الحركة ذاتها وتحولت إلى منصات لمهاجمة أبناء جلدتها، ونسفت قاعدة (الرأي والرأي الآخر)، ليدعي كل حزب بأنه المحتكر الذي يمتلك الحقيقة، والتمثيل الحقيقي للقضية الكردية، فلعبت الصحافة الحزبية الكردية دوراً محورياً في هذا الصدام، ومازالت.

Ciwan Ibrahîm - جوان إبراهيم

Mihemed Xenaş - محمد غناش

Mihemed Şahîn - محمد شاهين

Fatma Çolo ـ فاطمة جولو

û jiyanê de çêbûye. Dibe ku hinek vê şaş bibînin, wêje gelekî pêş ketîye. Lê wêje milkê gel e, tenê li ser kaxez û ragihandinê pêş nakeve, pêşketina wêje di danûstandina civakê de xuya dibe. Em dikarin bêjin: Wêje di dema berê de, ji niha pêşketîtir bû ji ber ku di nava jiyana rojane de jiyan dikir, gel li benda şahîyan nedima da ku stranekê yan helbestekê yan jî gotineke xweş bibihîze. Di hemû alîyên jiyana wan de huner hebû, di êşên wan de, di şerên wan de, di rabûn û rûniştina wan de ....

Tim nîqaş li ser pisgirêkên vê herêmê tên kirin, yek ji pirsgirêkên mezin parçebûna civakî ye. Di vê nivîsê de, em ê hewl bidin ku çirûskekê li ser rêya çareserîyê vêxînin.

Gelo çi têkilîya wêje bi parçebûna civakî re heye???

Wêje xwêya jiyanê ye, çawa xwarin bê xwê bêtam e, jiyan jî bêwêje bê wate ye.

Sedemên parçebûna civakî çi ne???

Yek ji sedemên bingehîn ew e, ku gotinên xweş di nav me de kêm bûne. Mirov di xwezaya xwe de meyla gotinên xweş dibe. Wêje dayîka gotinên xweş e, nexwe wêje kilîta çareserîyê ye. Lê mixabin tu kes girîngîyê nade vê mijarê. Em nabêjin; Her ku te mirovek dît helbestekê jê re bêje, lê bila gotinên te xweş û erênî bin. Bi xwedîderketina li nirxên wêjeyî û xwendina (roman, çîrok, helbest û ....hwd), gotinên xweş bi mirov re derdikevin. Û pêwîst e hûn wêjeya cîhanî jî bixwînin, ji xwe berî hezaran sal ve H. Zerdeşt rêya çareserîyê dîyar kiribû di gotina xwe de:" Baş bihizire, xweş biaxive û rast pêk bîne".

Nivîskarê Emerîkî Andirê Niyobark dibêje: "Ji bo ku tu karibî fikrê xwe yê dogmayî bişkînî (bila gotinên te xweş bin)".Her wiha dibêje: "Amojgarîya min ji bo gelên Rojhilata Navîn, ji bo jiyanek hîn bêhtir mirovahî, romanan bixwînin".

Gotinên erênî + ramana erênî + karê erênî = Bawerî.

Di zanista mêjî de jî tê gotin ku: Gotinên erênî, hêza zekaya analîtîk zêde dike û bi demê re pirsgirêkên mirov kêm dikin.

Mirov dikare biceribîne, gotinên xweş û erênî di navber xwe û nefsa xwe de, di navber xwe û malbata xwe û bi kesên derdora xwe re, bi kar bîne. bêguman wê bi ferqekê bihese.

Di roja îro de, her kes li ser malperên enternêtê xwe dike mirovê herî baş û gotinxweş û demokrat, lê mixabin di rastîyê de nikarin gotineke xweş bikin. Li alîyekî din jî tê gotin ku Kurd di xwezaya xwe de gotinhişk in. Ev gotin ne di cihê xwe de ye, wêjeya Kurdî ya nazik û xweşik şahidê nazdarîya gotinên vî gelî ye. Pêşîyên me gotine: Bi gotina xweş, ji kunê derdikeve marê reş.

Her wisa dibêjin: Kurd serhişk in, nezan in, gotinhişk in û bi hezaran bêbextî dikin. Ka em bi hev re nifşên siberojê ji bo jiyaneke biwate amade bikin, ka em bi hev re derw û bêbextîyan vala derxînin û paşeroja xwe saxlem ava bikin.

berxwedanîyê li gel wê qels û lewaz bûye. Gava behsa wêjeya Kurdî tê kirin yekser dewlemendîya xaka Mezopotamîyayê tê bîra mirov, ev xaka ku di hembêza xwe de gelek şaristanî, bawerî, xwedawend, zanyar, hozanvan û oldar xwedî kirine. Ne weke pesndayîn, lê roj nayê veşartin. Xaka bi xêrûbêr çavên her kesî lê bûn. Weke ku Ş.Rustem Cûdî dibêje: "Ê ku destê xwe bi ser xaka Rojhilata Navîn de, dikare dunyayê tevahî bi rêve bibe". Şerê werê derîyê malê, dîlan e. Gelên vê herêmê û gelê kurd di nav de, berxwedanîyên bêhempa yên dîrok jê re, rêzdar disekine kirin û berdêlên buhagiran dan. Dagirkeran dixwastin wêjeya di vê herêmê de bihelînin, ji ber vê yekê wêje û zimanê Kurdî zîyanên mezin dîtin. Ez wêjeya Kurdî bi "wêjeya bikeramet" bi nav dikim, ji ber ku li hember tofana bişaftinê li ber xwe da. Gelê berxwedêr, wêjeyeke berxwedêr afirand. Lorîkên dayîkan, stranên şivanan, şevbuhêrkên dengbêjan, çîrokên evîndaran , destanên lehengan, gotinên pêşiyan.... û hwd. Mîna xelekên zîncirê zargotina Kurdî parastin. Wêjeya Kurdî ya nivîskî jî xwedî dîrokeke dûr û dirêj e, dibe ku negihîştibe asta wêjeyên din, lê xwedî cihekî bilind û binirx e.

Ji nivîsên li ser dîwarên şkeftan û çermê lawiran bigire heya xwegihandina rêkûpêkîyê. Di asîmanê wêjeya nivîskî ya gelê Kurd e, gelek stêrkên ku weke Supernova her tim geş mane, hene. Van stêrkan di dil û mejîyê her Kurdekî de cihê xwe girtine, weke Zedeştê Kal, Manî, Mezdek, Behlûlê Mahî (Omer leheb), Elîyê Herîrî, Baba Tahirê Hemedanî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Melayê Cizîrî.....û hwd. Di serdema nû de jî gelek Supernova hene, weke Seydayê Cegerxwîn, Apê Osman, Mîr Celadet Bedirxan, Rewşen Bedirxan û wek wan bi dehan ên ku bi hestên welatperwerîyê wêjeya Kurdî gihandin hemdemîyê .

Wêje û jiyan, mîna laş û giyan in, tu carî ji hev qut nabin. Lê di roja îro de pirsgirêka qutbûnê di navbera wêje

Wêje û Jiyan

Mehmûd Misto

Wêje û jiyan, mîna laş û giyan in, tu carî ji hev qut nabin. Lê di roja îro de pirsgirêka qutbûnê di navbera wêje û jiyanê de çêbûye.

Serbest

Wêje, zimanê hest, raman û xeyalan e, xweş hûnandin, xweşristin û xweşvegotin e, hunera hûnermend û hozana ye. Wêje, watedayîn e, bê watedayîn jî mirov zindîyekî mirî ye.

Gava mirov li herikîna çemê dîrokê meyze dike, jê re xuya dibe ku mirovahîyê bi rêya wêjeyê, gav ber bi rastîya hebûna xwe ve avêtîye. Bêguman ji bo her gelekî wêjeyek heye, ew wêje arşîva ked û xebata wî gelî ye. Heger ku tu dixwazî gelekî nas bikî wêjeya wî nas bike, heger ku tu dixwazî gelekî tune bikî wêjeya wî tune bike, wê demê wê ew gel bê nasname bimîne û nema dikare bijî.

Wêje, di hundirê xwe de dibe du beşan:

Wêjeya devokî (zargotin) û wêjeya nivîskî.

Cîhana wêjeya devokî pir fireh e, ji ber ku mirovahîyê demên dirêj ji jiyana xwe bênivîs derbas kirîye. lewre ji wêjeya devokî re Malzaroka wêjeya nivîskî tê gotin. Divê em ji bîr nekin ku di dîrokê de gelek ziman ji holê rabûne, sedem jî ew e, ku wêjeya wan ya devokî nexwedî hêz bûye û taqeta

■ **Gundê Şekerîyê**

de dixebitin.

Xelkên Êzdî yên li gund dijîn ta niha li ser şopa bav û kalan dimeşin û rêûresmên ola Êzdî di bone û cejnan de pêk tînin.

Yek ji cejnên ola Êzdî ku ta niha merasîman li dar dixin, cejna Êzî ye.

Êzî navek ji navên Xweda ye, tê wateya (Ê ku ez çêkirime).

Xelkên Êzdî di vê rojê de rojîya xwe digirin ji ber ku roj kin dibin û şev jî dirêj dibin. 4 tiştên pîroz li ba Êzdîyan hene; ro, agir, av û ba , û di heyama 3 rojan de gerdûn çêbû.

Dûvre di Çarşema yekemîn ji meha Nîsanê de bi daketina melekê Tawûs jîyan ava bû. Navê Çarşema sor ji xwîna ku di damarên mirov û zindîyan re digere hatîye, û wateya wê ew e ku divê tu xes û lehanan nexwe.

Meshefa Reş ku niha li muzexaneya Berlînê ye. Ta niha naveroka wê nehatîye eşkerekirin ji ber ku alîyê felsefî tê de gelekî bi hêz e.

Li gorî rîspîyên Êzdî dibêjin ku demên êrîşên li ser Mûsilê pêk hatin, dijmin êrîşî Êzdîyan jî kirin. Ji ber ku Êzdî miletekî aştîxwaz in şeran naxwazin, gelek kes ji wan revîyan û di rê de dema birçî bûn rastî bexçeyeke xes û lehanan hatin û jê xwarin, lê dema dijmin ew dîtin êrîşî wan kirin û gelek kes ji wan kuştin, lewre piştî wê bûyerê Êzîdîyan xwarina xes û lehanên Mûsilê li xwe heram kirin.

Mîsolojîyeke din heye dibêje ku di civaka xwezayî de xwarina Êzdîyan ji şînkahîyê bû, û xes û lehan ji wê gîyayên ku dixwarin bûn, lê ji ber ku tê de gelek bektîrîya hene, bû sedema mirina gelek kesan, lewre li ser xwe heram kirin.

Gundê Şekerîyê

Şerîf Mihemed– Welîd Bekir

Koka vî gundî vedigere dîrokeke demdirêj ku hê şopên nîştecihên pêşîn li ser dîwarên şkeftên vî gundî hene.

Gundê Şekerîyê girêdayî navçeya Zirgan a bajarê Serê Kanîyê-kantona Cizîrê ye.

Gund ji du eşîreyan pêk tê; eşîra Xalta ji Kurdên Êzdî ye û eşîra Edûyan ji pêkhateya Ereb e. Her du pêkhate ji demeke zû de bi hev re mîna bira dijîn, di şahî û xemgînîyan de bi hev re alîkar in.

Berê gund bi navê (Xiraba Cesê) dihat naskirin, dûv re bû(Şekerîyê). Ew nav jî ji peyva Şekir hatîye, ji ber ku çelemên şêkir li derdora gund dihatin çandin.

Gund nêzî sînorê Bakurê Kurdistanê ye, tenê 300 metr dûrî sînor e.

Drdora 46 mal li gund hene, nîvê wan Kurdên Êzdî ne û nîvê din jî Ereb in.

Li başûrê gund, rêya Serê Kanîyê û gundê Mirêkîz e, li rojava gundê Cantemir, li bakur sînorê Bakurê Kurdistanê û li rojhilat ,gundê Bab El-Ferec e.

Xelkên gund debara jîyana xwe bi çandinîyê dikin, ji genim, ceh, nîsk, nok, çelemê şekir û pembo dikin. Hin kes sewalan ji mih û çêlekan xwedî dikin, û hejmarek ji xort û keçên gund di sazî û desteyên Rêveberîya Xweser

Eşqa te

Zerdeştê kal

Ti sînor nikarin hestên min
Dîl bikin
Ji eşqa te pêve
Û ne jî awirên min
Ti şev nikarin min ji janên xwe
Serxweş bikin
Ji bîranînên te pêve
Hestên daxdayî
Bi êşên evîna te
Gavên min dilikumînin
Mîna pêlekê ji sira berbangê ingirîye
Mîna gulberojeke şermok
Serê xwe ji keda mirinê re ditewînim
Mîna zinarekî li çîyayekî tazî
bendewarê gîyanekî terqîyayî me
Ku min vejîne
Mîna hejîreke gihiştî
Eşqa te wisa min têrxem kirîye
Û bin pê dibim dibin dara evîna te de
Tu mîna heyveke ku pişta tarîyê dişkînî
Û tarîyê ji şevê re nahêle
Û ez mîna sîyek bê bejin
Ji şevê direvim
Û ji xwe jî
Bila ti kes ji te hez neke
Û ne ez jî ..

Qada qafê wî diqelişînin bi tundî ...
Û bi her zorbûna xwe
dadikevin dikevin serê hundir vala
yê tije
Û dest bi (xerabûn û demara HOLAKî dikin)
Ta vî qafî li qadê raxin
Û wî di bin axê de bipêçin
*** * ***
Êrîş e êrîş
Geh yeko yeko
Geh dido dido
Geh sêyo sêyo
Geh çaro çaro
Û pirê caran bi hev re
bi hevbeş
Vî qafî didin ber hev
Ji xwe re qullik û kadînan tê de çêdikin
Û ev qaf bi wî alî de diçe
û bi vî alî de tê
Ta ...
Ji bejna xwe ve tê xwar
dikeve
nav lepên heştpêyan,
Zemîn ji ber ketina wî dihej .
Pêlên derya berovajî xwe vedigerin
Bi paş de vedikşin
Li hev dikevin ,
Çeman berê xwe dane kanîyên jê derketî,
Çiyayên biçûk mezin dibin
Û yên mezin dibin zixur ,
Goga zemînê avis bûye
Li benda pîrikê ye.

Cenga li ser qafê min

Yasin Ahmad

Têne hev li min tayên pêledayî
Li hev dikevin
Bi hev re dibin hevalbend
Serên xwe bi hev disûtînin
diçirisînin
dibe şinge şinga wan
Li ser serê berata min .
Wax ...wê çi bikin jê?!
Serîkî çi biçûk e
Pir dwelemend e di hundurê xwe de .
Wê hilqetînin ji gewd?!
Yan wê tê de biçêrin?!
* * *
Çi nêçîreke hesan e
Pir aloz e di hundrê xwe de,
Hatîye ber devan
wernê êrîş bikin
yekane
Giranbuha ye ne erzan e
Ne tu kes li pêş heye û ne tu kes li paş heye
Li vê bêlana hovîtîyê tenê maye
Û wê tenê bimîne
Wernê noşîcan be li ser aşê me .
* * *
Li hawîrdora wî qotî zîz dibin
Tîrên birûskên xwe lê didin

Helbest

Girzîro, Mişteûr û çiyayên Lêlûnê
Biskên xwe
Ji rûyên dêmên xwe ve
Bera nava axê dane,
Welato
****
Di nava hîm û latên te de
Em bûne Spîdar û Şemşemok
Çavên gerdûnê
Li me digerine,
Welato
****
Aso…
Wê xwe nû bike
Di nifşên nû de
Çala ji şînbûna te biherike
Koleyan azad bike,
Welato
****
Em ê…
Ji nû ve
Birînên xwe kom bikin
Bikin tovên şoreşê
Bi bayê rojava re
Di berbanga sibehê de
Biweşînin,
Welato!

Te…
Di bihara jiyana xwe de
Kulîlk civandin
Di nava sînoran de
Winda bûn,
Welato
****
Di nava kavilên rûxandî de
Li me bigere
Ji tilîyekê…
Ji parsîyekê…
Bila em ne winda bin,
Welato
****
Di himbêza te de
Şad dibin…
Ta digirin
Ji berê te dimjin…
Di nava baskên te de
Zîl didin,
Welato
****
Dêmên zarokên te
Di pêlên koçberîyê de
Qirmûş girtine
Lîstokên xwe
Di nava toza bêbextîyê de
Winda ne,
Welato
****
Seqema zivistanê
Dirêj e!
Ne ardî maye
Ne rêcber û kebanî
Bihar…
Bê wate maye,
Welato
****
Her der bû qulemişk
Gel lê hêwirî
Dibû reqereqa
Tav û birûskan
Lê ew…
Ne bihar bû,
Welato
****
Di kolanên te de
Gelek leheng…
Pesnên qelew…
Navên dirêj…
Di ezmûnê de
Di nava tozê de
Winda bûne,
Welato
****

Hîna li xwe digere

Gêlo Îsa



Helbest

Welato,
Di wargeha te de
Êş heye
Di êşa te de
Evîn heye
Di evîna te de
Çima em winda ne,
Welato?
****
Me…
Ji memikên te
Mêtîye ava jiyanê
Nema Beko
Nema bahoz
Me ji bin sîya te bavêje,
Welato
****
Hinek hêvî
Ji ewrên xwe biweşîne
Bi tîrêjên birûskan re
Têxe dilê me
Û me bişewîtîne,
Welato
****

Xewnek

Ehmed Tahir

Bi rêbaz û felsefê
Tebat bi min nakevê
Bi kar û xebat û liv
Xew ji çavan direvê

Ez hawar dikim xwedê
Hêzekê bi min bidê
Kurdan bikim xwedî maf
Azad bibin li dinê

Bila xelk bêjin çibû
Mêrek ji Kurdan hebû
Kurd li hev civandin tev
Pir zîrek û zane bû

Ji derya navê ta reş
Welat bibe gula geş
Milet bibe wekî hev
Gel jiyanek rind û xweş

Ez ji xew rabûm bi lez
Hatim tilyên xwe bi gez
Pir xweş bû ev xewna min
Hîn gur dijî di nav pez.

bûyî Peyvên dawîya hestên dilopan ....
Di hevjînîya te û axê de
Bêhnek xweş
lêvên xeyala bi evînê sor kir
Tu jî bûyî helbestek nû
di şevbuhêrka xeman de
Wekî wêneyekî xweşik
Ji xewnên zarokan re bûyî bûka baranê
Ser bedenên kolanên jibîrkirî.....
Ax bi bêhna te
cilên baranê berxwe dike
Û çûkên rêwî
ji pencereya te de heyv mêvanê hawizê avê kirin
Çaxê ku ax û baran bi bîranînên te
şilşil ser min de dibarîn
Milîtanek balgirtin dixwast dilê wî
Û di dilên zuha de hestên xweşk şîn dihatin
Lewma zarok ji keskesorê hez dikin
di welatê baranê de
Hêdîka xewke delala baranê
Muzîka azadîyê ye bîranînên te .....

Delala Baranê



Nûrî Yekta

Şevê di porê te de hêlîn veda bû
stêrk dibarîn ji nav hevokên helbesteke evîndar
Û ez di pencereyên şevê de
Dibûm demên bendewarîyên dereng
Dem hatîye
ku ava çeman pêl bi pêl biherike
Ji ber ku payîz e
dema xatirxwestinên bê wext e, delalê
Hevokek dixeniqe ser lêvên pênûsê
Û hêvyên te payîz digirin
Pel diweşin
di mûsimên xatirxwestinê de
Û awazek bedew û xemgîn
dibe kirasek teng di bejna vî bajarî de .....
Helbestên şewitî
Bi dawî kirin rêwîtîya şevê
Xwelîyên wan
Wê bibe kulîlkek bedew di buhara tê de
Wekî tu
Çewa ku di baranên duh de

Min maçî kin, himêzkin
Yan jî bi xeml xêz kin
Her hişk e ew ne nerm e
Ne wek a ca min germ e
Ez dûr bû me j`hêlînê
Warê jîyan û jînê
Tim welat û bav û dê
Ew pîroz in li qadê
Peyvek heye dêrîn e
Eyn guharê zêrîn e
Ji çanda mey kevnar e
Bi nirx û watedar e
Dê û bavê min gotin
Bi dir nayê firotin
Giya di bin tehtê de
Derdikeve d` wextê de
Wexta me jî ne dûr e
Giyayê me difûr e
Ji bin kevir tête der
Va şîn dibe her dever
Agirê me bi tîn e
Şoreş û têkoşîn e
Azadiyê geş dikin
Rûyê dijmin reş dikin
Bi xwîna pakrewanan
Bi bawerya şervanan

Berê min ketye reşyê
Bê par ma me ji xweşyê
Bê xwedî û xwedan im
Bê kes û sermîyan im
Her ez digrim rîya xwe
Di bîr tînim dîya xwe
Ew dayika dilovan
Bû ji min re sermîyan
Ez tazî û birçî me
Bê dirav û xercî me
Dinê reş e d` çavê min
Piştî dê û bavê min
Ji encama ceng û şer
Ji malê bûm derbeder
Neyarên wek dirindan
Bi topan û firindan
Êrîş anîn şarê min
Sotin cih û warê min
Hêlîna şarevanî
Bajarê Waşokanî
Ew kela berxwedanê
Li pêş çavê cîhanê
Dê û bavê min kuştin
Tu kes tê de nehiştin
Tev bi xuşk û birê min
Heval û hogirê min
Ji ber ku hirç û hov in
Ew dijminê mirov in

Ev e cenga malmîrat
Lê rûdidin bobelat
Dişewite hişk û ter
Tên qirkirin ev beşer
Çiye gunhê minalan?
Me zarok û tifalan
Tewanbarîk mezin e
Tu kes lê nasekine
Ev hovên desthilatdar
Dikin vî şerê dijwar
Wêran dikin xwezayê
Ew pêk tînin qezayê
Bi yexma û bi talan
Bi serbirrîn û zindan
Da sûda xwe bibînin
Mirovayê d`qelînin
Digrîn li ser zarokan
Tenê di nav pirtûkan
Lê hêsirên wan sext in
Tev xwînmij û bêbext in
Gur in li berxê govan
Dibên mafê mirovan!
Bê sincî û bê rêz in
Bes berjewendî parêz in
Çendî l` sêwîxana bim
Ez qet û qet şa nabim
Çendî bikin guhdanê
Bi xwarin û razanê

Sêwî



Salihê Heydo

Zarokekî sêwî me
Li ser riyan rêwî me
Ez rondikan dirêjim
Derdê xwe pê dibêjim
Derdêm dijwar û kûr e
Rê pir dirêj û dûr e
Diçim kîde nizanim
Li her cihî biyan im
Ma me bê bav û bê dê
Tenê ma me li qadê
Dema li min dibî şev
Kul û keder têne hev
Li ezmana dinêrim
Siteyrika dijmêrim
Ketim binê bîrek kwîr
Tek û tenê bê debîr
Jiyan li min bûye doj
Hew dizanim şev û roj
Li çar hawîr dizêrim
Xwe l` qederê dispêrim
Niza berî bidim kê?
Ez biyan im ji xelkê

jî bi destê qîza xwe bigire.

Bi çavên hêvî westîyayî. Konê hêvîyê hêdî hêdî li ser min biçûk dibû û min nema karî bêhna xwe berdim.. Melîhe, Fatme, Sakîne û Xedrê ketibûn nava nîqaşên virt û gotinan yek digirtin û yek vedikirin.. carinan du sê nîqaş bi hev re vedikirin. Di vê taxê de tu gotin ji dev wan nediflitî. Ez ji hundir ji xesûya xwe xelas bûm ku hinekî bêhna xwe vedim. Ji ber bayê hatim ber baranê, di ber gotinên wan re îskesîka min dihat. Ma ji bilî dilê min heye ku tê de bêjim û min di dilê xwe de digot ‘’Ey Dijwar. Ez ê niha çi ji xwe bikim, berê xwe bidim kê. Ku ez xwe bikujim, wê piştî min şîrîn li ortan rezîl bimîne, ku ez li vê jiyanê bimînim mirin bi xwe ye, lê ku Osman rastî min bixwaze ez ê ji te re çi bêjim, ecebe ez û keça xwe birivin û ji vê jiyanê koç bikin. Ax Dijwar te bidîta piştî çûyîna te çi ji min kirin. Piştî çûyîna ebeyeke reş li min kirin, ji hemû deran mehrûm mam. Hemû karûbarê malbatê li ser milê min bû. Herzar çîrok û çîrvanok li ser min gotin yên dibin û nabin’’. Ji nişka ve sakîne bi dawa min girt:

-Ma tu hatî vê derê bêdeng bî. Ê de bêje wê rojê te û Osman li derve pêş derî ji hev re digot. Heke tiştek heye bêje ha fedî meke. Wela bê mêr nabe. Mêr her tişt e. Xwedê Hesoyê min ji min mehrûm neke. Duh Heso ji min re cilşoyeke ser kehrebê anî û du mirîşk jî anîn. Way ez pê re qeherî û min jê re got’’Heso!.. Ku te cilşo neanîbaya, tu yê xwe nekî ba min’’

Jinan bi hev re kirin pîrqînî. Melîhê destên xwe hirdimalandin:

Erê wela mêr wanî ne, heta ku tiştekî ji te re neynin. Heram be ku me merî wan di ba xwe ke.

Êdî şev tarî dibû û bi rûnişkandina wan re dilê min tarî dibû.. jiyan bixwe dibû hesreta jehrekê û li min digerîya. Ew bi çi difikirin û ez û Dijwarê xwe me bi çi difikirî. Nizanim ev jiyan çawa herimî ye û çi xezeb bi ser min de hatiye. Gelo di qedera me de wisa hatîye xêz kirin. Her ku min dixwest ez rabim Melîheyê bi patika min digirt û bi zor ez didam rûnişkandin. Ez a reben axaftin ji min re bi tirs bû.. axaftin ji min re qedexe bû. Tenê mafê min ê guhdarkirinê hebû. Êdî Fatme û Sakîne qaqilên dendikan ji dawên xwe daweşandin û dixwestin herin malê. Sakîne di ber xwe de got:

-Niha Heso were mal. Min hîn şîvek jî jê re nekirîye.

Her duyan bi hev du girtin û çûn û hîna jî axaftinên xwe berdewam dikirin. Şîrîna min ji nava zarokan hat bi tevî cilên xwe yên qirêj. Bi dengê kenê wê re ruh bi min hat. Min ser rûyê bi destmalê paqij kir. Min bi destên wê gir û çawa kê bikevim ser rê. Xedrê gotina xwe mîna şeqemekê di rûyê jiyana min de lêxist û got:

-Yên wan mêrên wan li benda wan e, lê tu yê bi ku ve biçî?!..

Min rûyê xwe ji wan birî, pişta xwe da wan û hêdî hêdî da ser rê û meşîyam. Û min ev pirs ji xwe û we kir:

-Gelo ez ê bi ku ve biçim?!...

mala Melîhê jixwe re rûnin.

Min hemû karûbarên xwe qedandibûn. Kirasekî xweşik û sorikî li bejna şîrîna xwe kir û em bi hev re derketin heta pêş derîyê mala Melîheyê ve çûm. Dema ku ez gihîştim wir min dît Melîhe, Fatme, Sekîne û Xedrê li pêş mala Melîheyê kîsek dendikên berbero danîne ber xwe û çerez dikine û di bera jî nîqaşên germ vekirine. Dema min merhebe li wan kir. Di nava wan de ya herî ku şorçî û Xedrê bû. Xedrê xwedîya destên tijî bazin, xwedîya lehif û tiran hema gotina di nava xwe de nîvî hîşt û got:

-Way tu bi xêr hatî Ferîde. Wîî wîîî.. Eyba reşê va çira wa porê di ber destmalê te re derketî, bînî jinên hane be... wê xelk li ser te nebêjin çi. Qey hîn wê rojê.. keçeke serqot di ber mala me re derbas bû. Xortne rapê ketin heta keçik kete devê bînayetê.. xwedê me stra bike. Min bi xwe nedît, lê jinên cîranan wanî gotin.

Qey te digot min hema bê şermîyeke mezin kirîye. Min hema porê xwe yê mayî bi destmala ku Dijwar diyarî min kiribû li serê xwe bi girêk mezin gerandin û destên min di bin çengên min de ji xwe re li wan û axaftina wan guhdar dikir. Xedrê wisa şor germ kiribû ku pê du sê jinên din jî tevlî cumeta me dibûn. Xedrê li destên Fatmê nêrî û got:

-wayy.. Fatme te va bazinên xwe ji ku derê anîne?.

Fatme dest li xwe dihejandin û wisa bi kenê xwe yê sist digot:

-Wela hînga ez bi ser mêrê xwe de bikim pitepit ku min çar fer bazin pê dan kirîn. Me îsal kê xanîyê xwe lê kirina, de min got bila niha bimîne.

Ez a belengaz.. xwedîya bazinekî zîv û tenekeyî ku berî Dijwarê min here leşkerîyê diyarî min kiribû bi ser de kerser mam û diponijîm. Hîna bi ser xwe de diponijîm Xedrê dîsa gotin guheran û bada ser min.

-Qîzê piştî ku mêrê te mir, xwedê bi rehma xwe şa bike, tu yê çi bikî, tu yê li ser zarokên xwe rûnî, lê..?

Helîmê bi tepan destê xwe di destên Xedrê de lêxist:

-Lê na naa.. xwasîya wê got ku bibe qismet em e bidin tîyê wê Osmên.. Tu peya ji wî baştir tune ne.

Sakîneya ku gotin ji bin çengê xwe derdixistin.

-Wela ez dibêjim Osman pir baş e.. wê te bike Jina xwe ya duyem, çêtir e ku çavên xelkê li te bin û te bidin yekî din.

Fatme û jinên din wan bi çavên neçê li min û zikê min dinêrîn û digot:

-Qîzê Ferîde.. Va zikê te hêdî hêdî mezin dibe. Ecebe ev zarok a Dijwêr e lê ya Osmên e. Ya ku ez zanim hîna Dijwar berî here şer tiştekî te tune bû û te digot piştî Şîrînê ez tu zarokan nayînim.

Hêsir di çavên min de xeniqîn û zimanê min giran-giran bû ku êdî min nedizanî çi bersivê bidim wan. Çawa ez ê peyvekê bilêv bikim. Mafê min ê wê peyvê jî tune bû. Hema di dev min de Xedrê wekî li ser gotinê bişo:

-De ku ya kê be.. xwedê xêrekê bide vî lawikî. De qene qîzê serqot tenê negere. Bila wan sînga te neheje.. eyba reşî fedî nema ye. Tu ku de çûyî

Gelo ez ê ber bi ku ve biçim?

Ew bi çi difikirin û ez û Dijwarê xwe me bi çi difikirî. Nizanim ev jiyan çawa herimî ye û çi xezeb bi ser min de hatiye. Gelo di qedera me de wisa hatîye xêz kirin.



Aras Hiso

Min wêneyê wî ji dîwarê xanî danî. Hinekî da ser dilê xwe û bi çavine hêsir bi ser ve girîyam. Bi vî wêneyî re ez vegerîyam wan rojên xweş û geş ku me bi hestên xwe ji hev hez dikir. Lê niha tenê wêneyê te di destên min de ye. Bi wêneyê te re dijîm, bi wêneyê te re hembêzên evînî par ve dikim. Min hêdîka wêneya wî ji çarçoveyê derxist û da ber dilê xwe, da mistandin û bi lêvên xwe yên şil ji rûyê wî têr maç kir. Carinan bi keserên tijî êş min jê te re digot:

-Dijwar!.. Te çawa ez û şîrîna xwe tenê li pey xwe hîştin? Erê, tu çûyî. Lê te tenê êş di dawa min de hiştin.. Xwezî te zanîbûya ku niha em di rezaletîyeke çawa de dijîn?

Hîna ez bi wêneyê di nav destên xwe re diaxivîm, dengê teqereqa derî ji derve de hat. Min ji lêdana derî de zanîbû ku Fatma ye. Min destmala xwe li serê xwe gerand û çûm ku derî vekim. Dema min derî vekir.

-Tu çawa yî Ferîde, Tu tenê li hundir çi dikî? were em herin pêş derîyê

■ **Di zeviyê genim de - Wênexêza Fransî Perth Mauricio**
Di sala 1875›an de hat xêzkirin

Ebdilîlahê Amedî xwe bi ser hev de qermiçand rûyê wî tirş û tehil bû, çavên wî çûne pişta guhên wî deynekir.

Ebdilîlahê Hewlêrî got: Min ji wan re digot; ev genim Mesîkî ye, lê bîya min ne dikirin.

Cardî Ebdilqudûsê Qamişlokî got: Belê xalo ez dibêjim genimê te Meksîkî ye ne?

Zilam ji wî re jî got: Na xwarzê, genimê min ne Meksîkî ye.

Rûyê Ebdilîlahê Hewlêrî reş qelîya, pê re rûyê Ebdilîlahê Amedî vebû, lê keyfa Ebdilcebarê Mihabadî hat.

Ebdilcebar ji wan re got: Min ji were ne got; geminê xalê min Emêrkî ye, we kenê xwe bi min dikir. Ne xalo mane genimê te Emêrkî ye?

Cardin Ebdilqodûsê Qamişlokî xwe avêt gotinê ji zilam re got: Min dizanî genimê xalê min Emêrkî ye ne xalo?

Zilam got: Na bavê xalo, genimê min ne Emêrîkî ye.

Herçaran li hev meyzand û ji xalo re gotin: Ev tu kenê xwe bi me dikî?

Zilam bi dengekî bilind kenî, ji wan re got: Na, ez kenê xwe bi we nakim, lê dîyar e hûn kenê xwe bi xwe dikin. Ev ne genim e bavê xalo, ev cehe ma hûn ceh û genim ji hev nas nakin endazyarno. Ma ne we li zankoyê pênc şeş salan li ser çandinîyê xwendîye!!?

Ebdilîlahê Hewlêrî di ber xwede kenî, lê nehişt ku Ebdilîlahê Amedî li wî bîne der ku ew kenîye.. serê xwe rakir ji wan re got: Rast e, ez jî dibêjim wê verêja vî genimî pir baş be, lê ev genim ne Îtalî ye, ev genim Meksîkî ye!

Ebdilqudûsê Qamişlokî ji wî re jî got: Belê rast e, ez jî dibêjim ev genim Meksîkî ye û verêja wî pir baş xuya dike.

Ebdilîlahê Amedî pir tengijî, rûyê wî tevlîhevbû ji xwe re got: Çawe dibêje ev genim ne Îtalîye, lê deynekir.

Ebdilcebarê Mihabadî bi qasî mirov hilmekê li çixara xwe bide ma sekinî li genim meyzand, ji wan re got: Ez bi we re me, wê verêja vî genimî pir baş be, wê xwedîyê wî di genim de bimîne, lê ev genim ne Meksîkî ye û ne jî Îtalî ye, ev genim Emêrkî ye, ji simbila wî xuya ye ma hûn genim ji hev nasnakin?

Herdû Ebdilîlahan di zikê xwede tengijîn aciz bûn, rûyê wan sor û şîn bû zimanê xwe gezkirin, lê deynekirin.

Ebdilqudûsê Qamişlokî ji xwe re li wan meyzand wek ku di dilê xwe de bikene, lê nediwêrî li xwe bîne der?

Hersê bira her yek di dilê xwe de, ji hev tengijîn, lê kesî deynekir bi qasî mirov bijmêrê ta bi dehan.

Ebdilîlahê Amedî ji Ebdilqudûsê Qamişlokî re got: Te ji min re got; weke te ye genim Îtalîye û te ji Ebdilîlahê Hewlêrî re got: Weke te ye genim Meksîkîye, lê te ji Ebdilcebarê Mihabadî re ne got: wek te ye û ne te got: Ka ev genim çî ye ka tu jî ji me re bêje ka ev genim çi ye?

Ebdilqudûsê Qamişlokî serê xwe berda ber xwe deynekir her sê ketin gewrîya hev her yek ma li ser ya xwe, ew dibêjê Îtalîyî ye, yê din dibêjê Meksîkî yê û yê dîtir dibêje; na Emêrkî ye.. Dengê xwe li hev bilind kirin gotin motinê ne di rê de dane rûyê hev, çavên xwe li dora xwe gerandin lê erdekî ripî rût e tiştek lê xuyanake.. Hino hino ji hev çûne paş kara xwe û şer kirin çavên xwe li dora xwe li bervir meviran gerandin, ew erdê berîya kêlîkekê, ji dermana re zixorek jî lê xuya nedikir wek ku kevir ji ezmana barî bin dora wan tev bûne kevir? keysa xwe li şer xweş kirin xwe tewandin keviran li ber hev pehin bûn berîya ku keviran deynin hev Zilamek ji nav zad derket dengê xwe li wan kir ev hûn çi dikin, ji wan re got: Çi bela we ye gelî camêran?

Dema ku dengê zilam kirin, di cihê xwe de mane sekinî kevirên xwe di ber xwe re berdan. Jêre gotin: Ev zad ê te ye?

Zilam got: Belê, zadê min e, çima?

Her çaran bi hev re gotin em li ser genimê te li hev nakin!

Dema ku gotin em li ser genimê te li hev nakin, zilam kenîya, ji wan re got: De ka bêjin çima hûn li hev nakin?

Ebdilîlahê Amedî got: Xalo, ma genimê te ne Îtalîye?

Berîya xwedîyê genim bersiva wî bide Ebdilqudûsê Qamişlokî got: Erê xalo ez jî dibêjim genimê te Îtalî ye.

Zilam got: Na xwarzê, genimê min ne Îtalî ye?

Keyfa Ebdilîlahê Hewlêrî û Ebdil-

Çar bira



Luqman Silêman

Ev ne genim e bavê xalo, ev cehe ma hûn ceh û genim ji hev nas nakin endazyarno. Ma ne we li zankoyê pênc şeş salan li ser çandinîyê xwendîye!!?

Çar bira Endazyarên çandinîyê ne
Ebdilîlahê Amedî.
Ebdilcebarê Mihabadî.
Ebdilîlahê Hewlêrî.
Ebdilqudûsê Qamişlokî.

Piştî ku her çaran xwendina xwe bi dawî kirin, ji hev re gotin ka em vê Buharê ji xwe re derkevin seyranekê. Buhar xweş xuya dike berîya ku em herin malên xwe mane vaye me xwendina xwe bi dawî kir, dibe ku çend salên din em nikaribin hev bibînin.

Vegerîyan hatin malên xwe dema ku buhar bi riwekî geş bi ser wan de hat xwe karkirin berê xwe dan seyranê, di rê de li zevîyek erd rast hatin, şîn dike mirov guneh dike lê meyzênê, serdîyê simbila wî bostekê dirêj bûye, didê noqa zilama.. Herçar li ber zad sekinîn Ebdilîlahê Amedî dihna xwe dayê çend gavan ber bi zad ve çû beşişî ji û wan re got: Ev genim Îtalî ye, dîyar e wê verêja wî pir baş be, ez bawer im wê xwedîyê wî di genim de bimîne îsal!

Ebdilqudûsê Qamişlokî yekser got: Rast e, ez jî dibêjim ev genim Îtalî ye û pir baş xuya dike.

devê xwe ji bo deng dernekeve û çi çêbû bê deng be, heya Cendirme diçin. Min got: Temam dayê, ez gelek ji te hez dikim.

Min bangî dayîka xwe kir dayê, dayê megirî megirî. Pişt re dayîka min derî girt û li hemberî min rûnişt.

Ji nişka ve li derî xistin û lêxistin û lêxistin, heya derî jêkirin, nêzî deh lingan bi hundir ketin û li her deverê digerîyan hemû dever xirakirin û vegerîyan gel dayîka min, dayîka min bi Tirkî nedizanî biaxifîya, ji nişkan ve dayîka min li erdê ket û bi ço û destan lêxistin û lêxistin, ji bo ku ez rondikên wê nebînim min serê xwe kir ber dîwêr. Bi lingan û bi ço lêdixistin, lêxistin heya hemû hestîyên wê şkestin, dengê hestî û lingan ji dengê qirşînan bilindtir bû, laşê wê mîna volkanekî sorsorî bibû di nav xwînê de mabû, di çavên wê de çiroska mirinê xuya dikir. Bi lingan lêdidan bi lingan, piştî çend deqe cendirmeyan gotin: Başmak 49 (pêlava 49), hat hemû jê dûr ketin tenê dayîka min ma. Min dît yekî dirêj solên wî reş û dirêj bûn, her gavek wî bi deh gavên min bû. Min ji xwe re got: 49 wê alîkarîyê bide dayîka min, dema gihîşt dayîka min, lingê xwe rakir û li sînga wê xist û lê xist deh caran dubare kir. Min dengê dayîka xwe yê dawî bihîst, got: Aaax dayê, pişt re dengê wê nema derket.

Fermandara wan got: Lêde bila bimire bila bimire, ev ne mislimanin ev çete ne, xwîn li her deverê belav bû, rûyê wê li kenbû.

Min bihîst Fermandarîya wan digot: Em biçin cihekî din hîna gelek gund mane karê me gelek e.

Piştre min çavên xwe vekir destên min girêdayî ne, çar tilîyên min tune ne. Bavê min digot: Piştî Cendirme ji mal çûn. Ez hatim mal û min te dît tu di bin text de dirêj kirî bûyî û destê te li erdê bû, xwîn ji destê te diherikî û çar tilî di devê te de mabûn.

Ji dest êş û şewata giran min ji bîr kiribû ku destê min di devê min de, tenê çar tilî di nav diranên min de mabûn.

Binire çar tilî çar bîranîn.

Hemû xanî di gund de şewitandin û xirakirin. Em di welatê xwe de penaber in, bê cih bê mal bê ax û bê dayîk.

Tu dixwazî em hîn berdewam bikin?

Nivîskar: Ez nizanim çi bêjim ji ber pênûsa min ker û lal bû, êdî kaxiza spî, tîp, peyv û hevok yek li pey yekî girîyan, ez jî girîyam, êdî hubra pênûsa min jî sor bû. Bese, bese Apê Riza.

Apê Riza: Dayîk û bavê min her dem digotin: Dawîya zilmê heye, dawîya zulimkeran jî heye.

Nivîskar: Apê Riza, çîroka te gelek biêş e. Te çima ji mêj ve çîroka xwe nedigot.

Apê Riza: Raste, bawar bike, dema welatê mirov bindest be, hemû tiştên girêdayî mirov jî bindest in, heya ziman jî.

Hest û raman bi zimanê dayîkê xweş in. Bi zimanê xwe bikene, bigirî, biqîre û bixwîne, wê çiqas xweş be.

Ji bo vê jî min xwest çiroka xwe bi zimanê xwe pêşkêş bikim.

■ Tabloya- Erdelan Ibrahîm

Digot: Riza, dema buhar û havîn tên, bela, şer, xirabûn û kuştin çêdibe. Ji bo vê jî hemû rojên me yên buhar û havînê bi bîranîn in.

Di buhar û havînê de Cendirme li nav gund digerîyan û lêpirsîn ji gel dikirin. Ji bo vê jî em naxwezin buhar û havîn bên. Vê salê zivistana me jî kin bû, ji zû de çîyayên me kirasê spî deynane û yê buharê li xwe kirine.

Roj yekşem bû, êdî dunya şev dibû, dengê zarok, dayîk, kal û lawiran dihat. Dayîka min bangî min kir û bi dengekî zirav û aram got: Riza, Riza, Riza.

Min got: Çi dixwazî dayêcan?

Got: Riza, divê tu baş guhdarî min bikî. Tu qêrîn û hewara însanan dibihîzî ne?. Ez bewar im îşev oprasyoneke mezin wê li van gundan destpê bike. Divê tu netirsî û deng jî dernexînî, tu yê xwe dibin têxt de veşêrî, temam?!

Min got: Temam dayêcan.

Wê şevê jî qêrîn û hewara jin û zarokan ji dengê balafir û tangan bilindtir bû. Dayîka min çiqas hewil dida ku negirî, lê agirê di hundirê wê de pir geş bû, ji agirê sînemaya Amûdê bilindtir bû.

Digot: Riza, ma ne ez ji te re dibêjim çavên xwe bigire. Her demê li min dinêrî çavên wê sor dibûn, bavê min jî çûbû çîyê, ji me re digot: Gava oprasyon bidawî bibe, ez ê bêm mal.

Dayîka min her digot: Riza raze, Riza raze, Riza raze. Ez nizanim ew şev çiqas bi min giran û dirêj bû, gelek dîmenên xweş li pêş çavên min xêz dibûn.

Bi berbanga sibehê re qîreqîr ji nava gund dihat. Dayîka min got: Riza xwe baş veşêre, û destê xwe deyne ser

Çar bîranîn

Dayîk û bavê min her dem digotin: Dawîya zilmê heye, dawîya zulimkeran jî heye.

Elî Silêman

Apê Riza di gund de yekî zana û jîr bû. Her dem digot: Heya şêr û qehremanên me hene, em natirisin. Heya çîrokên wî bi guman bûn, ji wî nedihat naskirin. Bewarîya wî bi zarokên welêt hebû.

Apê Riza bi nivîskar re got: Tu amade yî, kaxiza te spî ye, ximava pênûsa te pak e û heysîyet e nivîskaro?

Nivîskar: Belê Apê Riza, hibra pênûsa min pak û hesîyet e, mîna rondikên dayîkan zelal e.

Apê Riza: Dest pê bike, em binivîsin û pêşkêşî xwendekarên welatparêz bikin, ji kerema xwe straneke giran jî vêxîne, deng piçekî bilind bike.

Nivîskar: Temam Apê Riza, xuya ye çîroka te ji stranê girantir e.

Apê Riza:

Mala me nêzî sînor bû. Dema zivistan dihat, hemû rêyên gund dihatin girtin, me tu kes li gund nedidît, ji bilî xebatkarên azadîyê, wan alîkarîya me dikirin.

Wê demê ez 7 salî bûm. Min ji dayîka xwe dipirsî: Dayê, ev kî ne, çima bi çek û rext in?

Dayîka min digot: Ev parêzvanên zivistanê ne, zarokên çîyê ne, zarokên xweda ne.

nine mîna we hêja werin deynin ber wan.

(hersê bi hev re vedirşin)

Cerdevan-2

Min ji tere got ku kirte-kirt ji vê dimsê tê, te got şekrokê wê ye.

Cerdevan-3

(lingê xwe li kodka dimsê dixe)

Ev ê kezeba me di devê me re derxist.

Keç:

(digirî)

Cerdevan-1

Ji xwe re binerin, tişta ku anîye serê me hîn digirî jî.

Cerdevan-2

Hey belqtîyê tu bi ser çi de digirî?

Keç:

Kodik, kodika..

Cerdevan-1-2

(bi hev re)

Kodka çi xwedê nehiştê.!

Keç:

Te kodik şikand, wê kûçkê me yê belengaz avê di çi de vexwe?

(hersê cerdevan)

kodika kûçik!!!

(dîsa dibe ulqîna wan û ji mal derdikevin)

Keç:

Wey hûn bi qurbana kûçkan bin hey çeqelên heram.

(çawîşek û bi du neferan re)

Çawîş:

Hela hela, ît oxlî ît hûn li çî xwe digerin, weha li bayê serê xwe bê destûr ...heydê esker wan kelepçe bikin.

Keç:

Xweska ku ev celeb kûçik lawên kûçkabana û ne rovî û çeqelê ber deryê we guran bana.

Dawî

re serjêkirana.

Cerdevan-3

Bi telaq, wê kar û berx ji me re serjêkirana, heger zaroka malê ewqas comerd e, dê û bavê wê çawa ne. Ez dibêjim ku ev qîzik şaş bûye.

Cerdevan-1

Di çi de şaş bûye?

Cerdevan-2

Na ,na tu dûr diçî ew ê baş em naskirine.

Cerdvan-3

Yê dûr diçe tu yî, ez dibêjim di navbera denê hingiv û dimsê de şaş bûye.

Keç:

Keremkin hûn sehetê bixwin.

Cerdevan-2

Xwîya ye dimsa we pir e.

Keç:

Pirekî pir e.

Cerdevan-3

Xwedê em kurmî kirine, ev serê çend salan e me rez nedîne, em tama tirî nema dizanin.

Keç:

(di ber xwe de)

wey rebî hûn ti carî ifleh nebin.

Cerdevan-1

Qey zarokên we tune ne ku heya niha dimsa we maye?

Keç:

Şukir ji xwedê re, hundir tije zarok in, çûne mala xalan. Lê ew qet vê dimsê naxwin.

Ceredvan-2

Ew çima naxwin? Ma ev dimsa ku mera nexwe.

Keç:

Ji ber zarokan bi xwe dîtin ku mişk di nav denê dimsê de za bû...

(hersêyan bi hevre)

Mişkê mişk?

Keç:

Dîya min nerijand, ji mer re got heger carekê mêva-

Ji mirûsê me diyar e.

Keç:

(derî vedike)

Derbas bin.

Cerdevan-1

Şensê pîs kes li malê tuneye.

Keç:

Tune çawa, ma ez kî me?

Cerdevan-3

(di ber xwe de)

rewşa me ne tebût e. Keça min em birçîne, bi xêra dê û bavê xwe heke gezek nan ji we biqede.

Keç:

Rûnin! niha ez ê nan ji were bînim.

Cerdevan-2

Qîza camêra ye, mirov ji ber marefeta wê şerm dike, wan têketê xwe ji ber çavê me bidin alî.

(çêl li çiftan dike)

Cerdevan-1

(keça malê kodikek û çend nanan tîne)

Wey destê te sax be, nan û dims!

Cerdevan-3

Heyra ev ne dims e, hingiv e. De ka werin tu dibêjî qey kaba me dawîya rojê pik hatî.

(hersê weke ku ji ber xelayê filitî bin ketin ser kodika dimsê, tev alastin)

Cerdevan-2

Kirte-kirt ji vê dimsê tê, dimsa wilo min nexwarîye.

Cerdevanê -1

Kengî te dims xwarîye?

Cerdevan-3

Na, xebera wî ye,ku dims kevin dibe kirte-kirt jê tê. Ev şekrokê wê ye.

Keç:

We têr nexwaribe ez ê careke din ji were bînim?

(hersê bi hev re devên wan tije dims)

im im im.

Cerdevan-2

Şensê pîs gerek bavê wê li mal bana wê mirîşk û dîk ji me

■ **Tabloya- zubêr şêxmûs**

Cerdevan-1

Ma ev ne gundê Qurucîya ye, ev çima deryê malan girtîne? Dibe ku bar kiribin? Wilo hatîye serê we jî, qey ro li me gerîyaye.

Cerdevan-2

Dibe ku piştî sîleh danîbin, barkiribin!..ka em ê li vî derî bixin. ez neşaş bim pêjna mirîşkan hate min. Malê, gundîno, hûn mêvanan nahewînin?

Keç:

(dengê keçê ji paş derî) Hûn kî ne?

Cerdevan-2

Ez bêjim em..

Cerdevan-3

Na, nebêje belkî...

Cerdevan-1

Em û şensê xwe

Cerdevan-2

Sê Cerdevan

Dîya min nerijand, ji mer re got heger carekê mêvanine mîna we hêja werin deynin ber wan.

Beşîrê Mele Newaf

(Sê çete li devera çayekî nêçîrvanîyê dikin, li malekê dibin mêvan.)

Cerdevan-1

Şensê me ketîye tehtê, ha va roj diçe ava em li kwêsîyekî jî raşt nehatin. Ne bi me û ne bi vê nêçîra me be, qey hûn birçî nebûne? Ka em dagerin vî gundî bê gezek nan ji malekê peyda nakin...

Cerdevan-2

Tu li qilêra şefqa xwe û li mikûsê xwe nanere wê kî gezek nan bide te?!

Cerdevan-1

Wax lo lo, hema tu Silêmanê Mişt̂ê yî!.

Cerdevan-3

Li min heram be careke din bi we re derkevim nêçîrê. Nizanim çima bi çawîş re venegeryam qereqolê?

danîne ser rûyên xwe û sibehan bi çîroka "rewiştê" çavên xwe vedikin û bi şevan jî bi çîroka "rewiştê" çavên xwe digirin. Lê ew "çîroka rewiştê" tekane sermîyanê wan e û eger ew kiras ji ber wan bê rakirin, pûç û tazî dimînin.

Spas ji bo helbesta surrealîst a Ferhad Pîrbal ku şermgeha surrealîst a wê grûpa civakî nîşanî me da û wek bertekekê li ser helbesta Ferhad Pîrbal vê grûpê malperên civakî bi gotinên wek "ajel", "êm" û "dîn" û …hwd tijî kir.

Ev zimanê ku xwedîyên "exlaq û rewiştan" li hember Ferhad Pîrbal bi kar anîn, eşkere dike ku ew "rewişta" wan a bi dev, çi qasî li gor danasîna André Bretonê surrealîst e ku dibêje di navçeyeke aqil de "derhişî û ne derhişî" û "xeyal û rastî" û "bilindî û nizmî" dibin mîna hev. Hinek grûpên din ku heman danasîna André Breton li ser wan jî rast tê, ew in ku di bingehê de helbestê wek "cadûbazî û heram" dibînin, çi helbesteke watedar yan bêwate be, lê ew tên qala "bêwateyî û ne rewanîya" helbesta Ferhad Pîrbal dikin.

Eger dîtina helbestê wek cadûgerî û di heman demê de behskirina bedewî û erzanîya wê cadûgerîyê ne tevlihevbûna berhest û ne berhest û xeyal û rastîyê di aqil û hişmendîya wê grûpê de be, nexwe wê çi be gelo? Komeke din a rexnegirên helbesta Ferhad Pîrbal ku dikevin heman qada nerîna André Breton de, ew in ku ne dostên helbestê ne û ne jî nerîneke wan li ser helbestê heye, redkirina wan ji helbesta Ferhad Pîrbal re ew e ku Pîrbal li ser bereya desthilatê tê hesibandin.

Eger rexneya me ya sereke li desthilatê ew be ku hemû bend û movikên jîyanê zeft kirîye û derfet ji bo hinek kesên ku li derveyî vê desthilatê ne nemaye ku wek welatî ji mafên xwe sûdmend bin û di heman demê de heke em bên û mafê gotina helbestê jî ji kesekî bistînin çimkî girêdayî desthilatê ye û ji vê jî xirabtir em li ser kuştin û terorkirina kesayetîya wî mirovî kar bikin, êdî çi cudahîya me ji desthilatê heye? Gelo ev ne heman yeksanbûna wê "bilindî û nizmî" û wekhevbûna berhest û ne berhestîyê ye ku prensîba sereke ya André Bretonê surrealîst e?

Bi kurtî eger helbest û berhemên hunerî yên Ferhad Pîrbal surrealîst bin an ne surrealist bin, tiştekî asayî û normal e û dibe ku ji bo hinek kesan cihê rêz û pesindanê bin û hinek kesên din jî [ez yek ji wan im] çêj û xweşîyê ji wî cûreyê huner û edebîyatê wernegirin. Lê tiştê ne normal û derasayî ew bertek û karvedanên li hember helbesta Ferhad Pîrbal in.

Ew bertek û karvedan ji me re dibêjin civaka kurdewarî di krîzeke zanînê ya çiqasî mezin de dijî? Ji me re dibêjin em çi qasî di nav xeterî û metirsîya serdestbûna çanda redkirina yê din û qebûlnekirina rengê cuda de dijîn. Herwiha ji me re dibêjin ku em çi qasî gîroyê rotîn û dubarebûnê bûne û em çi qasî ji her deng û rengekî cuda heta asta dînbûnê erjeng dibin û vediciniqin.

Jêder: Dengekan

de yek bi yek dîyar dibin.

Dibe ku rû yan alîyekî wê dîyalektîka bêmane dirêjahîya kêşe û şer û aştîyên bêwate û berdewam ên herdu baskên bizava kurdayetîyê be ku, ji destpêka salên şêstî yên sedsala borî û heta roja me ya îro, heta radeya hêvîkuştin û bêzarkirinê, xewn û xeyalên çend nifşan dane ber bayê û kirin ar û xwelî.

Herwiha dibe ku rû yan alîyekî din ê wê dîyalektîka bêwate erjengî û tirsa civaka Kurdistanê ji reş û dêwê dewleta Iraqê be ku mîna heştpêyekî ev dora sedsalekê ye bi hezar û yek rengî lep û neperûşkên xwe di mejî û dilê her takekesekî civaka kurdewarî de asê kirine û em gelê Kurdistanê jî di ked û hewldaneke bêhûde ya xwe rizgarkirin û xwe xilaskirina ji wî dêwî de ne.

Em nifşên Enfal, kîmyabaran, zindan, ceng, êrîş û kampan di rewşa post-trawmayê de dijîn û van bobelat û bûyeran bandor û kartêkirineke herî kûr li ser hest û nestên me li şûn hiştine.

Dibe ku alîyekî din ê wê argumênta bêwate kêşeya herheyî di navbera du cîhanan de be ku, nasnameyeke astengdar ji bo tevahîya takekesên Kurdistanê afirandîye. Cîhanek e ku stûneke wê sedsalên navîn û çolistanên tarî ye û stûna wê ya din jî di cîhanekê de ye ku bi sedsalî daye pêşîya me û di her çavniqandinekê de me pêngaveke zêdetir li pey xwe dihêle.

Dibe ku hozana nivîskarê hêja Ferhad Pîrbal û karên wî yên hunerî ber û berhema tevahîya wan rewşan bin û dibe jî ku ne ti yek ji wan rewşan be û "wateya helbestê tenê di dilê helbestkar de" be. Her çawa jî be, helbesta Ferhad Pîrbal Surrealîzma civaka kurdî nîşanî me dide, civakek e ku heta dawî di nav nakokî û hevdijîyan de noq bûye.

Ez mibalexe û zêdegavîyê nakim eger ez bibêjim ku takekesên civaka me yek bi yek tûşbûyî û bergirtîyên heman wê gengeşe û cîhana nakok û hevdij in ku Ferhad Pîrbal bi sadeyî di "erê" û "na"yê de nîşan dide. Lê belê sê tişt hene ku Ferhad Pîrbal ji piranîya endam û takekesên civaka Kurdistanê cuda dikin: Paşxan û piştgeha wî ya marîfî û zanyarî, bandor û kartêkirina ekola Surrealîzmê li ser wî û çavnetirsî û wêrekîya wî. Van sedem û hokaran wiha kirine ku Ferhad Pîrbal berevajî takekesên din wêneyekî mirov û takekesê Kurdistanî di hundirê helbestekê de yan di tabloyekê de û yan jî di lêkolînekê de nîşan bide û derbibire.

Ji bo ku em bi radeya werbûn û gîrobûna takekesê Kurdistanî di nav wan nakokî û paradoksan de nas û serwext bibin, ne lazim e em dûr herin û tenê kesên ku helbesta Ferhad Pîrbal rexne kirine [ya rast êrîş kirine Ferhad Pîrbal] baştirîn mînak in. Surrealîzma takekesê Kurd di wan bertek û karvedanên "ne maqûl" û "dînikî" û "kêm marîfet" de derdikeve ku tijî "biçûkxistin" û "qerfpêkirin" in bi kesayetîya Ferhad Pîrbal û mafên wî yên herî sade û seretayî.

Wek mînak, reakisyon û karvedanên li ser helbesta Ferhad Pîrbal nîşan didin ku hinek kes hene rûpoş û maskeya exlaqan "rewiştan"

werger



■ Ferhad Pîrbal

di peyv û derbirîn û wêneyên wî de û herwiha di pêşkêşkirin û xwendina wî mirovê rêzdar de jî dîyar dibe.

Di helbesta Ferhad Pîrbal de, dîyalektîkeke kûr di navbera "na" û "erê" de heye. Ev dîyalektîk di dubarebûneke bêwate û bê bersiv û encameke bêwatetir de heta xêza dawî ya helbestê eşkere û dîyar dibe. Pêkan e ku ev dîyalektîk neynik û rengvedana nerîn û rewşa derûnî ya Ferhad Pîrbal bi xwe be. Lê bi ti awayî ji kêşe û pirsgirêkên derûnî yên civaka kurdewarî ne xerîb û veqetandî ye ku di nava me hemûyan

ekolên curbicur ên huner û edebîyatê, nemaze dibistana surrealîst nîşan didin. Her çi qasî ez nizanim ka gelo Dr. Ferhad Pîrbal xwe wiha dihesibîne yan na, lê ew mirovê rêzdar di analîz û derbirînên xwe de, di bin bandora ekola Surrealîzmê de maye.

Berîya ku ez dabaşa ekola Surrealîzmê bikim, baştir e ez dabaşa du sedem û faktoran bikim ku hevkar in ji bo ku Ferhad Pîrbal bikeve jêr bandor û kartêkirina wê ekolê. Yekem: Welatê Fransayê navenda derketin û geşbûna Surrealîzmê ye û zimanê fransî di edebîyata surrealîst de têr û dewlemend e. Bêguman Dr. Ferhad Pîrbal li wî welatî xwendîye û di zimanê fransî de şehreza ye û tiştekî pêşbînîkirî ye ku bikeve jêr bandor û kartêkirina ekolên dewlemend ên wêjeyî, fikirî û hunerî yên fransî bi giştî û ekola Surrealîzmê bi taybetî.

Duyem: Surrealîzm wek ekol û dibistaneke wêjeyî û hunerî piştî Şerê Cîhanî yê Yekemîn [rastir di navbera herdu şerên cîhanî de] geş û xurt bû. Vê yekê jî bi awayekî zelal û eşkere wiha kir ku reşbînîya şer û hêvîya aştîyê; dînîtî û hêçbûna şerkeran û hişmendîya aştîxwazan û di encamê de hevrikî û berberîya di navbera jîyan û mirinê û hişmendî û nehişmendîyê û şer û xêrê de di Surrealîzmê de cih bigirin û Surrealîzm bibe qadek ji bo nîşandan û berçavkirina van hemû nakokîyan. Ji xwe Surrealîzm hewldanek ji bo berhevkirin û wekhevkirina wan hevdijî û paradoksan e.

Em Kurdistanî jî [Ferhad Pîrbal jî wek takekesekî rewşenbîr ê Kurdistanî] ku me zarokatî û ciwanî û mezinbûna xwe di nav bêtar û pêlên şer, Enfal, kîmyabaran û şerê kambax ê birakujîyê de derbas kir; nakokî û paradoksên şer û aştîyê, bindestî û serfirazîyê, pêşketinxwazî û kevneperestîyê pir bi hêsanî cihê xwe di hundirê her yekî ji me de girtine û kok û rehên xwe kûr berdane.

Lê ji bo ku em bêtir Surrealîzmê nas bikin û jê fam bikin, divê em li teorisyen û bîrdozgerê sereke û hîmdar ê Surrealîzmê helbestvan, nivîskar û bîrmendê fransî André Breton (1896-1966) vegerin û wî bidin axaftin. Di pirtûka xwe ya navdar "Manîfestoya Surrealîst" de, Breton wiha dibêje: "Her tişt me ber bi wê yekê ve dibe ku em bawer bikin rewşeke dîyarkirî ya aqil heye ku tê de jîyan û mirin, xeyal û rastî, rabirdû û niha, gihandin û negihandin, bilindî û nizmî êdî wek nakok û dijberên hev neyên dîtin."

Bi wateyeke din, Surrealîzm şêwe û stîleke huner û edebîyatê ye ku bi rêya daxuyanî, derbirîn û nîşandanên xwe yên awarte û ne realîstîk girîngîya alîyên derhiş, ne realîstîk û ne berhest di xeyala mirov de teqez dike.

Di Surrealîzm de, mijar û babet pêşî di qalibekî realîstîk de tên nîşandan û berçavkirin, lê bi awayekî ne pêşbînîkirî berê mijar û babetê diguhere bi şêweyekî ku mirov di jîyana rojane de wan wêneyan nabîne û hinek caran weke xewn û derhiş û ne realîstîk tên ber çavên mirov.

Ev dîtin û nerîna surrealîst ne tenê bi awayekî zelal û eşkere di helbesta Ferhad Pîrbal de xuya dibe, lê belê

werger

Ferhad Pîrbal helbestvanekî surrealîst di civakeke surrealîst de

Em Kurdistanî jî [Ferhad Pîrbal jî wek takekesekî rewşenbîr ê Kurdistanî] ku me zarokatî û ciwanî û mezinbûna xwe di nav bêtar û pêlên şer, Enfal, kîmyabaran û şerê kambax ê birakujîyê de derbas kir..

Dr. Mihemed Refhet (Dr. Aram Refhet)
Wergera Ji Soranî: Besam Mistefa

werger

«Ez bi Ferhad Pîrbal re ne hemfikir û hevbîr im û ne jî ez bi nivîsên wî ciwanmêrî sersam û mendehoş im, lê dîsa jî ez amade me heta dawî berevanîya kesayetî û mafê wî yê nîşandana bawerî û nerînê bikim»

Berîya çend rojan helbesteke Ferhad Pîrbal bi dengê wî di YouTube û tor û malperên civakî de hate weşandin û gelek kom û grûpên cihêreng bi awayên cuda cuda (heta asta navnokirina kesayetîya Ferhad Pîrbal) helbesta Ferhad Pîrbal bi tundî rexne kirin. Dibe ku helbesta Ferhad Pîrbal rexnehilgir be, lê pirsgirêk di wê yekê de ye ku piranîya rexneyên ku li wê helbestê hatin kirin, nezanîn û hayjênebûna ji cîhana helbestê û

Navê pirtûkê: Hestin bi tîpên zêrîn
Nivîskar: Mihemed Elî Hiso
Naverok: (Helbest)
Di vê dîwanê de çend helbestên pir hêja û wa-tedar hene, mînak helbesta mêş û derdê ezîtiyê ko weke romaneke bijankêşî yê ve hatiye stirandin, rastiye,hûnaye,tevî têbiniyê di derbarê kiryarên kirêt yên cendirman bi dayikê re!! Ko beloq hatine şirovekirin. û helbesta ko hest û wijdanê mirov di hingêve, di hejîne apo revandin, wilo jî helbestvanê me bi pekrewaniyê ve ye, naxwaze mirar here.
Hejmara rûpelan:258
Ji Weşanên Mezopotamyayê
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2018

Navê pirtûkê: Rûprlên Jînê
Berhevkirin: Nêrgiz Ismayîl
Naverok: (Çîrok)
Gelek dayîk bûn mêvanên mirovê azad, roja bi rûmet a ku bi germahiya dilê xwe dilên bûyî qeşa gerim kirî, bi tîna dilê xwe yê mezin ve hêvî û bawerî dabû. Tiştên ku di xewnên xwe de nedîtibûn mirovê azad dabû wan, kiribûn xwedî vîn, bîrdozî hêviya ji-yanê. Êdî bi xwe bibûn jiyan. Di dema hêviyên xwe yên jiyanê windakirîn de ji nû ve hêviyên wan şîn bûn, dîrok ji nû ve zindîkirin. Xewin û xeyalên xwe yên salan pêkanîn. Rojên wan ên xweş vegeriyan, darên hişkbûyî fêkî da.
Hejmara rûpelan: 104
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2017



Navê Pirtûkê: Serdema nû ya şoreşan-şoreşa azadiya Rojavayê Kurdistanê-Pirtûka sêyemîn(Kobanê-Efrîn-Heleb).

Nivîskar: Mehmet Emîn Mutlu – Ersîn celîk

Naverok: (Dîrok)

Ev pirtûk dibe cilda sêyemîn lê ser şoreşa rojavayê kurdistanê, û di vê cildî de rewşa herêmên Kobanê û Efrîn û Heleb'ê hatiya şîrovekirin.

Beşa yekemîn: li ser çirûska 19'ê tirmehê Kobanê (ji milê civakî û siyasî ve Kobanê, xebat û amadekariyên şoreşê, çirûska 19'ê tirmehê, piştî şoreşê li Kobanê xebatên avakirinê).

Beşa duyemîn: li ser destana sedsalê berxwedana Kobanê (di salvegera şoreşê de êrîşên cebhed el nusra, êrîşên 15'ê îlonê yên daiş'ê; li hemberî tarîtiyê şerê rûmetê, şerê nava bajêr, rizgarkirina Kobanê, rizgarkirina gundan, rizgarkirina girêspî û yekbûna Kobanê û cizîrê, pêvajoya piştî rizgarkirina girêspî, Kobanê bajarê şehîdan e).

Beşa sêyemîn: li ser rewşa Efrînê (beriya şoreşê rewşa Efrînê û amadekariyên şoreşê, li Efrînê şoreşa 19'ê tirmehê, li Efrîn'ê xebatên xweseriyê, li Efrînê xebatên parastinê).

Beşa çaremîn: li ser rewşa Heleb'ê (di pengavên ewil yên şoreşê de rewşa Heleb'ê, li Helebê wane û taybetmendiyên şerê bajaran, li Heleb'ê êniya ypg-ypj'ê, li Helebê bênavber şerê 22 rojan).

Hejmara Rûpelan: 462

Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2017

Pirtûkên derketî

Navê Pirtûkê: Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk-Pirtûka Pêncemîn

(Parastina kurdên di nava pencê qirkırina çandî de, pirsgirêka kurd û çareseriya neteweya demokratîk)

Nivîskar: Abdullah Ocalan

Werger: Rêşad Sorgul

Naverok: (Raman)

Eger mirov sê xelekên pêşî yên parêznameyên serok Ocalan weke qonaxa gavavêtina gerdûnîtiyê şîrove bike, pênc cild parêznameyên wê jî bi awayê dawî dikare weke xwegihandina gerdûnîtiyê destnîşan bike.

Di beşa pêşî hin têgîn û teoriyên di beşên berê de wê hewl dabû rave bike. beşa duyemîn rastiya kurd, şert û mercên hundir û derve yên bi pirsgirêkê ve bi awayekî berbiçav hatiye analîzkirin. di beşa sêyemîn de hewl dide tevgera neteweyî ya kurd û têkiliya wê bi dewleta netewe re analîz bike.

Di beşên çaremîn, pêncemîn û şeşemîn de li ser diyardeya pkk'ê disekine û hûrdikole.

û di beşa heftemîn de statuya pirsgirêka kurd a li gelemperiya rojhilata navîn, û hêza çareseriyê ya hêmanên modernîteya demokratîk pêşkêş bike.

û di beşa encamê de alîkariya muhtemel a ku şoreşa kurdistanê li ya gerdûnî bike, tê nirxandin. û encamên herêmî û global ên çareseriya şoreşgerî ya pirsgirêka kurd di çarçoveya herdu modernîteyên cihê de careke din bi kurtî têne nirxandin.

Hejmara Rûpelan: 742

Ji Weşanên Mezopotamyayê

Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2018



avakirina jîyanê de dibînin.

Xak bi xwe jî di dîroka Kurdistanê de bûye kanîya çand û hunerê. Bêguman nabe ku rola jina Kurd neyê dîtin. Ji ber ku jina Kurd li ser axa bi berhem û bereket, di cihên wekî Kobanê, Cizîr, Amed, Wanê, Urmiyê, Hewraman û Efrînê de endazyarên jîyana civakî ne. Ev derên ku bi çandinî û berhemên wekî darên zeytûn û sinober û... hwd, Navdar in. Bi keda jinê hatine xwedîkirin. Ji ber herî zêde jin bi axê re mijûl dibe û bi hezkirneke mezin nêzî xweza û jîyanê dibe. Ji ber vê jî civak hertim ji bo karên çandinî û sererastkirna hesaban bi jinên temenmezin re dişêwire.

Jin di van herêman de wek dibistanekê ye, ku ziman û çanda gelerî diparêze, ji derdora xwe re hînker e. Herî baş jin xwedî li zimanê Kurdî derdikevin û bikartînin. Bitaybetî jî di şahî û cejnan de bi kincên xwe yên gelêrî xemleke xweşik çêdkin. Dibe ku pir zêde berhemên Kurdan ên nivîskî nebin, lê belê jinên Kurd bi stran û çîrokan bi zimanekî zîndî nifiş bi nfiş destan û efsaneyên xwe parastine. Herî zêde jî serpêhatîyên biêş û evînên mezin vegotine. Dîroka xwe heya roja îro veguhastine. Jin di şîn û tazîyan de dilorînin, di kêf xweşîyan de dilîlînin, lewre jin hunermend û sembola ruhê neteweyî ye, di tevahîya şêwazên rêya xwe de vê didin der. Jina Kurd di vê xakê de xwedî li nirxên xwe yên civakî û gelêrî derketine û bi berxwedêrî li hemberî êrîşên çanda dagirkeran nirxên xwe yên çandî parastine. Li djî çand û hişmendîyên ku hebûna Kurdan qebûl nekirine û herdem bi înkarê nêzî nasnameya Kurd bûne, jina Kurd sîper girtine. Bûne mertalên parastina çand û hunera Kurdî.

Bi pêşketina tekoşîna ji bo rêya azadîya gelê Kurd re, herî zêde jinên Kurd bi bawerî û bê dudilî hembêza xwe ji tekoşînê re vekirin. Wekî ku bi salan li benda azadîyê bûn, bi evîneke mezin ew pêşwazî kirin. Lewma derîyê mala xwe ji xebatên rêxistinê re vekirin, bi heyecaneke mezin tevlî xebatê bûn. Tevî zor û zehmetîyan jî bêyî ku nepejrînin û xwepaşve bikşînin hêza xwe tevlî kirin. Mîna (Eyşe şan, Rîhana Loristanî, Mizgîn, Meryem Xan... hwd) ji ber jina Kurd ev rastî hîskirin ku ancax tekoşîn ji bo rêya azadiyê dikare nirxên wan ên azadîyê ku wendabûne careke din li wan vegerîne. Ew nirxên ku di cewhera jinê da veşartî mabûn, bi rêya tekoşîna azadîyê careke din derketin holê û jinê cewher û hêza xwe derxist.

Dîsan di sedsala bîst û yekan de jî bi diruşma sedsala bîst û yekan dê bibe sedsala azadîya jinê, bi nasnameyek azad nîşa hemû jinên cîhanê da ku jin xwedî hunera aştî, azadî û viyanê ye. Îro jinên Kurd bûne sembolek di nava welatên cîhanê de û jina ku bi hezarên salan xwe nasnedikir di nava rêxistina jinên Kurd de li nasnameya jina azad digerin ku bibin xwedî ew nasnameya bi etîk û estatîka jinbûnê bijîn..

ke nû ya civakî ku jiyanê bi parvekrin, hezkirin, hevgirtin û qencîyê pîroz dikin, diafrînin.

Dîsan hunera aştî, azadî, vîyan, tekoşîn û berxwedêrîyê nîşanî cîhanê didin.

Mirov dikare bibêje ku li welat, şoreşa ku pêk hatîye û pêk tê bi reng û xweşkîya jinê ye. Ji ber hunermend, şoreşger û xwedawendên vê pergalê jin in.

Dem ne dreng e, hîna jinên Kurd ên mayîn li keda xwe xwedî derkevin..

Têkilîya di navbera delîveya çandê û şêwazê jiyana civakî, ji hêla tewrî û rastîyê ve, girêdaneke wan a ku ji hev nayê qutkirin heye. Çand bêyî hebûna civakî negengaz e ku hebe, civak jî bêyî çandê nikare bijî. Mirov nikare çandê bê civak, civakê jî bê çand bihzire. Çand rêya jîyana bi hevrebûna civakê nîşan dide, her wisa pîvana takekesa li pêşberî civaka xwe dîyar dike û amûrên ku takekes bikaribe pêdivîyên xwe ji bo pêşxistna jîyanê pêk bîne, dide wî/wê.

Roleke çandê ya giring di jiyana mirov de heye. Ji ber çand dibe sedema cudabûna di nav takekesan, an jî civakan de û bi awayekî dewlemend li cem hev kom dibin. Her weha çand mirov ji zinîdîyên din cuda dike. Di watayeke din de çand xisleta mirovbûnê dide mirovan. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku çand şêwazê fikrandin, tevgerîn, tevahî helwestên mirov û pîvanên însanan li beramberî hevdu diteysîne; ango ew neynika yekbûna civakê ye.

Huner jî amûreke ji bo pêşxistin û guhertinên civakî. Her wisa huner zimanê hest û gîyanê mirovan e. Jiyan bê huner mîna axeke zuha ye, lewma mirov nikare jiyaneke bê huner bifikre. Di jîyana her gelekî de huner xwedî roleke wisa ye ku ji hêla derûnî ve mirovan aram dike. Bi rêya hunerê civak asta pêşketina xwe ya civakî dîyar dike. Ji destpêka jîyana civakî ve, komên mirovan bi rêya xêzkirna ser dîwar û şkeftan, her wisa bi lasaykirina dengên gîyandaran xwestine ku raman û hestên xwe îfade bikin.

Xaka mezopotamyayê xwedî dîrokeke demdirêj e, bûye çavkanîya pêşketinên çandî û hunerî ji mirovahîyê re, ji bo pêşketina van herdu xalên giring gelek çavkanî pêşkêş kirîye. Dewlemendîya vê axê û xweşikbûna xwezaya wê bi xwe jî ji mirovahîyê re bûye îlhama gelek stran û helbestan. Vê axê gelek çand hembêz kirine. Gelê Kurd jî para xwe ya mezin û giring ji vê rastîyê girtîye. Bi taybetî jina Kurd, tevî gelek serpêhatîyên dagîrkerî û mêtîngerê karîye heya roja îro çanda hezarên salan li ser vê axê biparêze.

Dema ku mirov rewşa jinê bi taybetî di Rojavayê Kurdistanê de li ber çavan derbas dike, dibîne ku li van deveran çandeke dîrokî ya demdirêj jîyaye û hîna jî tê jîyîn. Efsaneyên ku ji dema xwedawenda bereket û xweşkîyê Îştar heya dema Zenûbîyayê şahbanûya Tedmurê, nevîya Nefertîtîyê ku bi delalîya xwe hatîye nasîn, di rastîya van efsaneyan de, em bi awayekî zelal rola jinê ya mezin bi zimanekî hunerî di

Jinên Kurd Tevî Dagirkerîyê, Çand û Hunera Kurdî Zîndî Dikin

Jina Kurd di vê xakê de xwedî li nirxên xwe yên civakî û gelêrî derketine û bi berxwedêrî li hemberî êrîşên çanda dagirkeran nirxên xwe yên çandî parastine.

Hêlan Çiya– Duhok

Huner bi awayekî estetîkî û bi şêweyên cihêreng, îfadekirina hest, raman, pêşnûme yan jî serpehatîyekê ye.

Mirov nizane bibêj jin dişibe hunerê yan huner dişibe jinê, ji ber ku ew huner tim di pêşektinê de ye û xwedî etîka jin e, lewma jî huner dibe kakila dil û rihê jinê.

Jinên Kurd bi tekoşîna azadîyê re çand û jiyaneke nû bi her awayî xwedî li mîratên xwe yên dîrokî derdikevin û li beramberî paşverûtî û bandora pergala destihlatdar û çanda modernîteya sermayedar têdikoşe, serkêşî û pêşengtîya vê jî jinên Kurd dikin.

Li herçar parçeyên welêt jinên Kurd di nava xebatên sîyasî, civakî, çandî, hunerî, aborî, tenduristî û serbazî ..hwd de cih digrin, wisa ew enerjîya ku bi hezarên salan hatibû zindankirin, bi azadî ber bi avabûna civaka demokratîk ve diherikînin. Bi vê mebestê jî çawa ku di her qadê de çalak in, di qada çand û hunerê de jî li her bajar, gund û herêmê bi rêxistin û huner bûne.

Îro jinên Kurd ne tenê bi stran, çîrok û cilên gelêrî, lê di hunera nûjen de jî xwe ber biçav didin pêş û çande-

û ji raya giştî û cîhanê re ragihîne. Her wisa ji bo gihiştina rastîyan hertim di nava ked û xebatê de be. Ger ku ragihandin vê yekê neke û tim pesnê rêveberîyê bide; an jî çavê xwe ji kêmasî, şaşîtî û qisûrên heyî bigre, wê gavê wê nikaribe bawerîya gel qezenc bike, Ji gel û rastîyên heyî dûr bimîne û wê nikaribe bibe ziman, çav, guh, deng û rengê gel.

- Birêz "Elî Roj" zor spas, gotina te ya dawî..

Pêwîste were zanîn ku pilan û leystokên pir mezin û demdirêj li ser paşeroja gelê Kurd û gelên herêmê tevahî têne rêsandin. Rojane li ser gelê Kurd qirkirina etnîkî û çandî tê meşandin û hêzên serdest û desthilat dixwazin gelê Kurd ji holê rakin. Li hember vê rewşa heyî şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi xwe re gelek guhertin û veguhertin pêkanîn û gelek şoreş di hindirê şoreşê de meşandin. Berxwedana bêhempa ya ku îro gelê heremê bi hemû pêkhateyên xwe li hemberî pilan û hewildanên hêzin dagirker ên ku dixwazin sîstema rêveberîyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkbibin, rastîya şoreşa Rojava û hêvîyên serkeftinê radixîne ber çavan. Lê ji bo ku şoreş ji hemû milên xwe ve bikeve rojeva cîhanê û bibe şoreşeke gerdûnî, di serî de ev yek erka ragihandinê ye. Herweha erka ragihandinê ew e, ku li hember şerê taybet ê ku ji milê hêzên serdest ê cîhanê û netew dewletan ve li ser civakê tê meşandin, civakê perwerde bike û rastîyên heyî bi gel bide naskirin. Lewma pêwîst e hemû endamên ragihandinê bi kar û xebata xwe deng û rastîya şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê bighînin raya giştî û cîhanê tevahî, û her tim şopdarê rastîyê bin.

ve di ber çavan re têne derbaskirin û asta wan a zimanî, fikrî, zanistî û kesayetî di ber çavan re tê derbaskirin. Wekî din ji bo her endamekî ku nû tevlî karê ragihandinê dibe, demeke ceribandinê jî heye û li gor vê yekê bi demê re tê xuya kirin ka wê karibe kar û xebatê bike yan jî na.

-Bi nerîna we, çima ragihandna Kurdî ne di asta pêşketinên siyasî de ye?

Ragihandina kurdî jî girêdayî pêşketina sîstema perwerdeya Kurdî ye û girêdayî asta edebîyat û pêşketina asta fêrbûn, xwendin û nivîsandina bi Kurdî ye. Ji ber asta kesên ku bi zimanê Kurdî ve mijûl dibin, dixwînin û dinvîsînin ne di wê astê de ne ku hemû beşên ragihandinê di milê Kurdî de pêşketina ku tê xwestin pêkbînin. Ji ber vê xebata ragihandina Kurdî bi hemû beşên xwe di asta navîn de ye. Nimûne di beşa nivîskî de mîna rojname û ajansan de bi vî rengî ye, û di beşa TV de li gor beşên nivîskî heya astekê baştir e. Lê li gor rewşa Rojava û astengîyên ku ji berîya şoreşê li pêşîya nivîsandin, xwendin û fêrbûna kurdî dibûne kelem. Rewşa ku îro me xwe gihandîyê de, bi serê xwe li gor dema borî pêşketineke gelekî giring e. Di encamê de mirov dikare bibêje ku tenê li ser asta Rojava bi dehan radyoyên ku weşana xwe bi zimanê Kurdî dikin hene. Gelek TV yên heremî jî hene ku weşana xwe bi zimanê Kurdî dikin û bi dehan rojname, kovarên ku bi Kurdî têne çapkirin û belavkirin hene. Ev yek bi serê xwe serkeftineke mezin e û roj bi roj li ser erdê pêşketin rûdidin û encama karê bi salan hêvîyê dide ku asta heyî hîn bêtir pêşkeve.

- Ragihandin bi giştî û bi taybetî ya Kurdî, bi rola xwe weke desthilata çaremîn radibe, yanî çiqasî nêzî gel e, gelo doz û kêşeyên gel dike rojevê, dişopîne, çareser dike, dengê gel digihîne alîyên peywendîdar, yan na. Heger ne wisa be sedem çi ne?

Em weke feresata pergala serdest ragihandinê mîna desthilata çaremîn nagirin dest. Berevajî vê yekê pêwîst e ragihandin deng û rengê gel be, gel hebûn û rastîya jîyan xwe, pêşeroj û paşeroja xwe bi rêya ragihandinê bi rengekî herî baş bibîne û nas bike. Dibe ku dezgehên me yên ragihandinê li Rojava car caran di navbera gel û sazîyan de diçe û tê. Carnan mîna ragihandina sazîyan tev digere û carnan jî mîna ragihandina gel tev digere. Di vî warî de pêwîst e ku heya astekê hevsengîyekê di navbera sazîyan û gel de ava bike. Ango ji gel ve nêzîk be, hemû pirsgirêk û azarên gel bike rojev, bighîne alîyên peywendîdar, bibe cihê bawerî û dilsozîya gel û tim ji bo xwegihandina rastîyê tevbigere û bo wê tekoşînê bike. Herweha kar û xebata sazîyan jî bişopîne û heger ku qisûr di kar û xebata wan de hebe, bê ku dudilîyê jîyan bike bi rexneyên avaker rastîya rewşa heyî têxîne rojevê û bal bikşîne ser. Erka sereke ya ragihandinê ew e, ku rastîyê derxînê holê

- Bi pirsa borî ve girêdayî; Di şoreşa Rojava de gelek rojnameger û raghîner derketin, tevî ku gelek ji wan ne di asta ku tê xwestin de ne, tu vê diyardeyê çawa dinirxînî. û Gelo çima asta pîvanên hilbijartina kesên di warê ragihandinê de dixebitin, daketiye?

Di serî de rewşa Rojava û şoreşê mirov dikare mîna rewşên awarte bigre dest. Ji ber vê pêwîst bû ku di demeke kin de hemû sazî û dezgeh rêxistina xwe ava bikin û dest bi karê xwe bikin, li gor rewşên asayî gelek derfet nebûn ku ev kar dereng bikeve. Lewma dema ku em li sîstema nava dewletê meyze bikin û karê ragihandin û rojnamegerîyê bigrin dest, helbet wê ew û rewşa heyî gelekî ji hev cuda bin. An jî heger ku em rewşa dezgehên ragihandinê yên din û ya me li Rojava bigrin dest wê rewşa heyî ji gelek milan ve ji hev dûr be. Ji ber hişmendî û nêzîkbûna wan a kar û xebata ragihandinê, derfetên wan û rewşa ku em tê re derbas dibin û derftên di destê me de,ne mîna hev in. Ji ber ku di hundirê sîstemê de pêwîst e, yek piştî ku asta amedeyî temam bike 6 salan bixwîne ji bo ku bibe rojnemevan. Û gelek dezgehên din yên ragihandinê her kesî nagirin nava xwe. Lê ji ber ku em di rewşeke awarte re derbas dibin û pêwîst e ev kar bi çi awayî be were meşandin. Lewre gelek kes cihê xwe di nava vê xebatê de digrin, lê wan rojnemevanî nexwendine û heger ku em hemû dezgehên me yên ragihandinê di ber çavan re derbas bikin, kesên ku rojnemevanî xwendine li ser telîyên destan têne jimartin. Carcaran ev yek bandora xwe li kar û xebata ku tê meşandin dike, lê glek caran jî kesên ku tu peywendîya wan bi beşa ragihandinê ve tune ye, lê tevlî karê ragihandinê dibin, ji rojnemevanekî bêtir karê xwe dikin û asta wan roj bi roj pêş dikeve. Ji milekî din ve hinek endam hene dema ku cihê xwe di nava kar û xebata ragihandinê de girtin asta wan îdare dibû, lê bi demê re nekarîbûn asta xwe pêş bêxin, asta kar bi xwe re bilind bikin û herçiqasî ku bi salane cihê xwe di nava karê ragihandinê de digrin. Lê ne asta wan a meslekî pêşketîye û ne jî asta wan a bîrdozî, siyasî, fikrî jî, berevajî wê dubarebûnê jiyan dikin. Ev rewşa heyî helbet bandora xwe yekser li ser karê ragihandinê dike û nûbûna rojnemevanî û karê ku tê meşandin bi xwe re pêknayîne.

Ji ber derfet vebûye û herkes dikare di nava karê ragihandinê de cihê xwe bigre, mirov dikare bibêje ku pîvanên rojnemevanîyê daketine û weke ku herkes dikare bi hesanî bibe rojnamevan derketiye holê. Lê di rastîyê de ne bi vî rengî ye û di dema kar û xebatê de ev yek bi rengekî hîn baştir xuya dike û asta her kesî tê naskirin. Lê her ku kar û xebata ragihandinê bi rengekî rêk û pêk tê tenzîm kirin, pîvanên rojnemegerîyê jî bilintir dibin, kesên ku ne li gor kar û xebata ragihandinê be û asta xwe pêş nexe, ew di karê ragihandinê de nikare cihê xwe mîna berê bigre. Her weha kesên ku ji nû ve tevlî karê ragihandinê dibin jî ji hemû millî

ku ji bo serkeftinê tu astengîyan nasnake avabike. Wekî din jî xwe bighîne asteke têr û tije û tu carî xwe temam nebîne û her tim ji bo ku asta xwe pêş bixe hewildanên wî hebin. Ji ber ku ger bi vî rengî nêzî kar û xebatê nebe wê xwe dubare bike û di kar û xebatê xwe de neserkeftî be. Di encamê de rojnamegerê serkeftî ji avakirina xwe dest pê dike. Her weha fersend û derfetên ku ji bo wî hatine pêşkêşkirin, bi rengekî rast nêz dibe, di ferqa cidiyeta kar û xebata ku dikeve ser milî wî de ye, her tim şopdarê rastîyê ye û ji bo gihiştina rastiyê bi rengekî xuliqkar û fedayî tevdigere.

-Ragihandina Kurdî bi hemû cureyên xwe, gelo di asta şoreşa Rojava de ne yan na, bi taybetî kenalên telvîzyonê û radyo û hejmareke baş jî heye, yanî ev kar bi awayekî pisporane tê meşandin yan na û çima?

Ger ku em ragihandina Kurdî li Rojava bi hemû dezgehên wê bigrin dest û nirxandina wê bikin. Em dikarin bibêjin ku heta roja îro me nekarîye ku em vegotin û rastîya şoreşa Rojava bighînin raya giştî û cîhanê. Me xwe negihandîye asteke ku em xebatên ragihandinê bi rengekî pisporî bidin meşandin. Lê ji milekî din ve jî û li gor dema borî em dikarin bibêjin ku me di warê ragihandina Kurdî de gelek pêngavên giring avêtine. Di serî de li Rojava cara yekemîn e ku rojnameyeke bi Kurdî û bi rengekî sîstematîk tê çapkirin û belavkirin. Wekî din jî, cara yekemîn e ku xebatên ajansê bi rengekî rêk û pêk kar û xebata xwe bi kurdî û bi gelek zimanên din jî dide meşandin. Weşana TV- Ronahî jî ya ku piranîya nûçe û bernameyên wê bi Kurdî ne, bi serê xwe gavekî dîrokî ye. Hebûna bi dehan radyoyên ku piranîya weşana wan bi Kurdî ye û gelek TV – heremî bi serê xwe mirov dikare bibêje ku di hindirê şoreşê de şoreşeke ragihandinê li Rojava pêkhatî ye. Lê mîna ku me di serî de destnîşankir, ev kar heya îro her çiqasî li gor dema borî roj bi roj bi xwe re guhertin û veguhertin pêkanî be jî û heta astekê serkeftî be. Lê hîn xwe negihandîye asta ku kar û xebata xwe bi rengekî pisporî bide meşandin. Li gor min herçiqasî perwerde tê dîtin, lê ji ber ku sîstema perwerdeya ku tê dîtin di hundirê akademîya ragihandinê de bi rêk û pêk nehate meşandin û têr û tije nebû, hem jî di warê pîşeyî de jî kêm ma. Lewre jî bandora xwe li ser naverok û asta karê ku tê meşandin jî kir. Ev bû sedem ku xwedubarekirin derkeve holê û dezgehên me yên ragihandinê hemû ji milê şêwaz û qalibê weşanê de weke hev bin, an jî nêzî hev bin. Wekî din jî gelek xebatkarên ku kar û xebata ragihandinê didine meşandin di heman astê de mane û dubarebûnê jiyan dikin, hewildanê wan ên guhertinê kêm dimîne û têrê nake ku rengekî nû, naverokeke têr û tijî bihewîne û bi şêwazekî afrîner tevbigere. Lê ev rewşa heyî wê bi rêya perwerda giştî û ya takekesî û hewildanên afrîner ên bê navber ji holê rabin û wê pêşketina pêwîst pêk were.

zin di warê teknolojiyê de, gelo ragihandin bi pêşxistin yan na û çima, Erênî û neyînîyên wê çine?

Ragihandin li ser du hêmanan pêşketina xwe ava dike, ew jî rexê xwe yê meslekî ye û rexê din jî yê bîrdozî û fikrî ye, heger ku alavên teknîkê çiqas pêşketî bin jî, lê hişmendîya kar û xebata ragihandinê pêş nekeve. Wê gavê tenê bi pêşketina alavan karê ragihandinê pêşnakeve. Ji ber ku pêşketina alavan dibe ku gelek tiştên nû û balkêş bi xwe re bîne, xebatên ragihandinê ne tenê bi alav û teknîka pêşketî tên meşandin. Ger ku hişmendîya kar, xebata ragihandinê, şêwazê kar û xebata heyî û sîstem neyê avakirin, di destê me de alavên herî pêşketî hebin jî wê karê ku tê xwestin dernekeve holê. Her weha gelek kes tenê karê ragihandinê di teknîkê de dibînin û nêzîkbûna wan ji vî karî re teknîkî ye. Lê berevajî vê yekê glek caran teknîk afrandin û xuliqkariyê ji holê radike, mejiyê mirovan hental dike û rê li pêşiya hizrîn û afrandinê digre. Lê heger afrandin, xuliqkarî û nûbûna fikrî bi teknîk û alavên herî pêşketî re bibin yek wê gavê wê kar û xebata ragihandinê pêş bikeve û bighêje armanca xwe. Yan jî dibe ku teknîk û alavên pêşketî xîtabê mîna pêşketinekê were nirxandin, lê heger ku naverok vale be wê ave wê nikaribe cihê xwe di hest, bîr û hizrê gel de bigre.

-Wekî tu dizanî di salên şoreşa Rojava de gelek kovar û rojname derketin, tu ji aliyê naverokê de van berheman çawa dibînî?

Bi şoreşa Rojava re derfet çêbûn û li gor wê gelek dezgehên ragihandinê kar û xebatên xwe bi rêk û pêk dane meşandin. Gelek rojname û kovar hatin çapkirin. Lê kovar û rojnameyên ku têne çapkirin ji milê naverokê ve nêzî hev in, tu cudabûna wan ji hev tune ye. Dibe ku di nav de çend kovar û rojnameyên bi naverok hebin, lê piranîya wan naveroka wan lawaz e û tenê bi nav kovar in, an jî rojname ne. Sedem jî ew e, ku her sazîyek dixwaze kovar an jî rojnameya wê hebe, derfet jî hene û van derfetên heyî jî ji bo vê yekê xerc dikin. Lê pêwîst e ku kovar û rojname xwedî naverokeke têr û tije bin, nivîskar û xwendevanên xwe jî roj bi roj zêde bibin. Dema ku ev yek pêk were wê xebatên kovar û rojnemeyan bighêjin armanca xwe û wê roj bi roj tora belavkariyê zêde û berfireh bibe, wê herkes bi baldarî bişopîne û bixwîne.

- Bi dîtina te, taybetmendîyên rojnamegerê serkeftî çi ne?

Gelek taybetmendîyên rojnamegerê serkeftî hene, lê mirov dikare çend taybetmendîyên sereke rêz bike. Rojnemevan pêwîst e ku ji karê xwe hez bike û her tim di nava lêgerînê de be. Pêwîst e, erkê ku dikeve ser milê wî nas bike û ji bo ku erkê xwe bi cî bîne roj bi roj xwe perwerde bike û demê xwe vala derbas neke. Xwe ji milê bîrdozî, çandî, zanistî, siyasî û meslekî ve pêş bixe û kesayeteke

bi rengekî rêk û pêk hate destpêkirin. Bi derfetên çapê yên kêm rojnameya "Ronahî" hate çapkirin û gihaşt destê xwendevanên xwe. Her weha ajansa "ANHA" jî hate avakirin û ev yekem car bû ku ajansek bi vî rengî li Rojava dest bi karê xwe dike û xwe dighîne vê astê. Wekî din jî "TV- Ronahî" dest bi weşanê kir û ew jî bi serê xwe gaveke gelekî giring bû ku xebatên TV yê li Rojava dest bi weşanê bike. Her wisa jî gelek radio û TV yên heremî jî dest bi weşanê kirin.

Dibe ku gelek kesan cihê xwe di kar û xebatên ragihandinê de digirtin, lê tu naskirina wan ji karê ragihandinê re tune bû. Lewma gelek endamên ku tevlî karê ragihandinê dibûn û derbasî perwerdeyê dibûn, bi zorê dikarîn kar û xebatê ragihandinê bidin meşandin. Gelek kes jî bi demê re ji ber ku nedikarîn vî karî bidin meşandin dev ji kar berdidan an jî ji kar dihatin derxistin. Ji milekî din ve jî hinek kesên ku tevlî karê ragihandinê dibûn heskirina wan ji vî karî re tunebû û mîna karekî ji rêzê nêzî xebatê ragihandinê dibûn, an jî mîna mamûran nêzî kar dibûn û di milê çand û pêzanîna giştî de kêm diman, di karê ragihandinê de pêşketina pêwîst pêknetanîn. Her çiqasî hewildan hebûn ku bi rêya perwerdeyê lawazîya heyî ji holê were rakirin, lê vê yekê jî nedikarî rewşa heyî ji kokê ve derbas bike. Van hemû sedemên ku me destnîşankirin dibûne asteng, herçiqasî kar û xebatên ragihandinê xwe gihandibin asteke baş jî. Lê ji milekî din ve jî hîn lawazî heye, hîn xwedubarekirin tê jiyan kirin û asta afrandinê kêm e, ev yek jî nahêle ku xebata ragihandinê roj bi roj mîna avzêmekî her tim pêşbikeve.

- Ji bo te ragihandin tê çi wateyê. Û gelo ragihandina serbixwe heye?

Ragihandin deng, reng û neynika civakê ye, pencereya ku pêwîste civak bi rêya wê hemû rastîyên nepenî bibîne. Her weha erka ragihandinê ew ku li hemberî hemû rêbazên şerên taybet ên ku li hemberî civakê ji milê hêzên desthilatdar ve têne meşandin, civakê perwerde bike. Wekî din jî di nava civakê de sîstema xweparastinê li hemberî qirkirina etnîkî, çandî û exlaqî ava bike, civakeke exlaqî û siyasî bide avakirin.

Her ragihandinek li gor bîrdozî û siyaseta weşanê ya girêdayî wê tevdigere, lewma ragihandina bê alî nîne. Nimûne ragihandina girêdayî dewletê heye û ew jî yekser li gor hişmendî û bîrdoziya dewletê tevdigere. Li aliyekî din jî ragihandina ku xwe dispêre civakê û rastîya civakê vedibêje heye. Nimûna wê jî ragihandina ku bi şoreşa Rojava re derkete hole, ji derveyî sîstema dewletê û desthilatîya wê sîstema xwe ya xweser avakirîye. Lê ew jî li gor bîrdozî û siyaseta weşanê kar û xebata xwe dide meşandin. Di encamê de hemû dezgehên ragihandinê li ku derê dibe û girêdayî kî dibe bila bibe, lê ragihandin bê alî tune ye.

-Alavên ragihandinê yên nû, bi taybetî piştî pêşketinên me-

- Berîya em dest bi pirsên xwe bikin, ji kerma xwe, xwe bi xwînerên Şermola bide nasîn, kengî û çawa tu derbasî warê ragihandin û rojnamegerîyê bûyî?

Ez di sala 1977an de li herêma Dêrika Hemko ji dayîk bûme, min xwendina xwe ya seretayî li gund û ya navîn û amadeyî jî li bajarê Dêrika Hemko temamkirî ye. Gelek helbest, gotar, bîranîn û serpêhatîyên ku min nivîsandine di gelek malpêr, kovar û rojnameyan de hatine weşandin. Ez bi wêjeya Kurdî ve mijûl dibim û di karê ragihandinê de jî cihê xwe digrim. Sê berhemên min yên helbestan, ji wan du bi zimanê Erebî û yek jî bi zimanê Kurdî li Rojava hatine çapkirin. Her weha pirtûkek jî li ser jîyana şehîdên Rojava bi navê (Istûret el şehade) bi zimanê Erebî hatiye çapkirin. Gelek bîranîn, serpêhatî û helbestên min yên ne çapkirî û li ber çapê ne jî hene. Ez ji destpêka şoreşa Rojava ve cihê xwe di nava xebatên ragihandinê de digrim û li gelek herêmên Rojava min kar û xebatên ragihandinê dane meşandin.

-Astengiyên ku di karê ragihandinê de derdikevin çi ne?

Di serî de li Rojava dibe ku beriya şoreşa Rojava kar û xebata ragihandinê bi rengekî veşartî dihate meşandin, ji ber serdestîya rejîma Baas û tûndîya wê li ser civakê tu derfetên ku kar û xebata ragihandinê mîna îro were meşandin li holê tune bû. Ji ber vê yekê kar û xebata ragihandinê bi rengekî sîstematîk û bi sazîbûn piştî şoreşa Rojava û bi destkeftîyên ku bi xwîna hezarên şehîdan pêk hat û li gor vê yekê bi rengekî rêk û pêk dezgehên ragihandinê hatin bi rêxistin kirin.

Ji ber vê yekê astengîyên ku di kar û xebata ragihandinê de derketin pêşberî me ew bû ku me ji nû ve kar û xebata ragihandinê bi kêm derfetên heyî, bi endamên nû û kêmek cerbandinên berê me ev kar bi rêve bir. Bi şoreşê re çawa ku hemû sazî, dezgehên rêxistinî, yên perwerdeyî û parastinê bi kêm derfetên heyî rêxistina xwe ava kirin û hin bi hin xwe li ser pîyan girtin; di encama vê yekê de gelek destkeftî bi destê xwe ve anîn, sîstema rêveberîya civakê avakirin û civak gihandin asta ku bikaribe xwe bi xwe bi rêve bibe. Xebatên ragihandinê jî mîna hemû xebatên ku me anîne ziman rêxistin û sazîbûna xwe avakir. Ango di destpêkê de ne endam û ne jî derfet di destê me de hebûn ku em karê ragihandinê li gor ku tê xwestin bimeşînin. Lê bi rêya xebata bê navber û bi rêya perwerde û avakirina sîstema kar û xebatê, bi tevlîbûna endamên nû û bi perwrdeyan jî asta heyî roj bi roj bilind bû û pêşketin di kar û xebatê de çêbû. Ji beriya şoreşa Rojava kovara "dengê Kurdistan" hebû, careke din û bi rengekî hîn aktîvtir dest bi karê xwe kir. Wekî din jî kovara "Rojhilata Navîn" jî ya ku li Rojhilata Navîn tevahî tê belavkirin li Rojava sazîya xwe avakir û dest bi karê xwe kir. Ji sazîyên ragihandinê li Rojava di serî de xebatên rojnama "Ronahî"

Nivîskar û rojnameger «Elî Roj» ji «ŞERMOLA» re:

pêwîst e ragihandin deng û rengê gel be

Hevpeyvîner: Aram Hesen

Bi karê nivîsandinê mijûl e, gotar, helbest û nivîsên wî di gelek malper, rojname û kovaran de hatine weşandin, her wisa di nava kar û xebatên ragihandinê de jî cihê xwe digre û li gelek herêmên Rojava karê ragihandin û çapemeniyê daye meşandin.

Elî Roj, xwedî çar berhem e, du ji wan bi zimanê Erebî û du bi zimanê kurdî ne.

-Birêz Elî Roj, di serî de em bi xêrhatina te dikin, û te spas dikin, ji ber ku te hinek ji dema xwe ji bo vê hevpeyvînê veqetand.

Destpêkê em bejna xwe li beramberî hemû şehîdên şopdarên rastîyê ditewînin û em soz didin ku armanc û hêvîyên wan bi cih bînin. Her weha em rêz, silav û heskirinên xwe ji bo hemû xebatkarên kovara Şermola pêşkêş dikin, ji ber ev derfet ji me re vekirin ku em nêrîn û bîrûçûnên xwe ji xwînerên kovarê re vebêjin û em di kar û xebata we de serkeftinê dixwazin.

xafil dibin heskirî û dostên wan. Ango kesên zana û biaqil zûbizû xwe nêzîkî desthilatdaran nakin. Eger nêzîk bibin jî ji bo ku tiştek neyê serê wan hay ji xwe dimînin. Lewre pir baş dizanin hema hinge serê derzîyê desthilatdar firsetê bibînin, wê weke maran bi wan ve bidin. Di vir de jî ku Xanî desthilatdar weke maran nîşan dane, dixwaze bêje bêbext û xayîn in, kengê jehra xwe berdin laşê mirovan ne diyar e. Ji ber wê kesên biaqil xwe ji wan vediçinin. Lê kesên xafil ji bêaqilîya xwe xwe nêzîkî wan dikin û di dawîyê de dikevin davikên wan. Li ser kesên li cem desthilatdaran pir biqedir jî Xanî wiha dibêje:

"Her çendî li nik bi izz û naz î
Her çendî di gel bi lu'b û baz î..."

Her çiqas tu li cem kesên desthilatdar bi qedir û qîmet bî, her çendî tu heskirî û dost bî û nazên te li cem derbas bibin, her çendî tu li cem wan rehet û biste bî, her çendî tu li cem wan mêrxas û lewend bî,...

"Cuz'î bibitin ji te texeyyur
Kullî diketin li te tedebur..."

Gava guhertineke piçûk li cem te diyar bibe, bi tevayî wê pişta xwe bidin te. Ango digel lehengî, qedir, qîmet, rûmet, heskirin, dostayî û rêzdarîya te li cem wan, dema hinge serê derzîyê kêmayîyeke te bibînin, heskirin û dostayî nayê bîra wan, li te naborin û wê ji binî te ji dergehê xwe biavêjin. Bêguman kesên ji dergehên wan bên avêtin, wê ji xişma wan jî rizgar nebin. Ji bo kesên neqenc yên li derdora desthilatdaran jî Xanî wiha dibêje:

"Xasma ku hebin xebîs û xennas
Bedxwah û bexîl-i bin mînennas..."

Nemaze ku li derdora desthilatdaran kesên xerab, fesad, gelac, zikreş, bêbext, kîndar û yên ji mirovan hes nakin hebin,...

"Tehqîqî xirabtir in ji şeytan
Yareb, meke wan qerîbê sultan..."

Bila gumanên we çênebin û ji sedî sed bawer bikin ku ew kes ji şeytên xerabtir in. Xwedayo, tu wan kesan nêzîkî desthilatdaran nekî! Çawa ku di malikên li jorê de jî dibêje, desthilatdar jixwe ne yên bawerîyê ne û zordest in, vêca ku yên li derdora wan jî neqenc bin, zordestîya wan sedqat dibe. Bi kurt û cewher helwesta Xanî ya derbarê desthilatdaran de diyar e û wan ji hev cuda nake. Ango nabêje, hin desthilatdar wiha ne. Tevan bi hev re dinirxîne. Lê xwestina wî ya padîşahekî ji bo Kurdan, ku dibêje;

"Ger dê hebûya me padîşahek
Laiq bidiya Xwedê kulahek.."

Eger padîşahekî me Kurdan hebûya û Xwedê taca padîşahîyê layîqê wî bidîta,... nayê wateya ku bi fikrê wî yê têkildarî desthilatdaran re nakok e. Xwestina azadîya Kurdan û hebûna rêberekî ji bo wan û nêrîna li desthilatdaran du tiştên ji hev cuda ne û ji hev re ne nakok in.

diçînin, xwedî dikin û diparêzin, kesên weke Beko ne. Lê ka çawa dexlê mîrtîya me diçînin û diparêzin, wê ji bo me bidirûn, bînin û bikin qûtê salê jî. Bi kurtayî yên weke Beko kursî û textê desthilatdarî û mîrtîya me dinecirînin, bi cih dikin û diparêzin. Bi saya yên weke wî em jî li ser textê xwe kumê xwe xwar dikin û fermanan li ser fermanan didin. Ku ne ji yên weke wî be ne em dikarin bibin desthilatdar, ne jî em dikarin desthilatdarîya xwe biparêzin. Ji bo wê çi dibin bila bibin, ev kes ji bo me lazim in.

Xanî nêrîna xwe ya derbarê desthilatdaran de wiha didomîne:

"Hukkam-i ji cinsê şahê mar in
Eshabê sumûm û mohredar in..."

Desthilatdar ji cinsê şahê maran in. Hem jehra wan heye, hem mohra wan. Di vir de Xanî desthilatdaran naşibihîne maran, wan dişibihîne şahê maran. Ango taybetîya wan ya weke ya maran di asta herî bilind de ye. Ne mar tenê ne, şahê maran in. Lê xetera wan ji ya şahê maran jî pirtir e, lewre hem jehra wan heye, hem di destê wan de mohr heye. Çawa ku bi jehra xwe dikarin mirovan bikujin, dikarin bi mohra xwe jî biryara kuştina mirovan bidin. Ango du hêz di destê desthiltdaran de hene; hêzek siyaset, leşker, sîxur û zêr û zîvên wan, ku Xanî wan dişibihîne jehrê, hêza din jî biryar, hukum û fermanên wan in, ku Xanî wan bi mohrê bi nav dike. Lewre her fermana dertînin binê wê mohr dikin. Biryarên ku binê wan mohr dikin jî, Xanî wiha pênase dike:

"Mohran ku didin, bizan ku jehr e
Mihrê ku dikin, bizan ku qehr e..."

Mohra ku desthilatdar li binê biryaran dixin, bizane ku hibra wê jehir e. Qenc, xerab biryar çi dibe bila bibe, hibra ji wê mohrê li ser kaxizê dikeve, ne hibir e, jehir e û dikeve xwîna her kesê têkildarî biryarê. Ango ji bo wan dibe kuştina bi jehrê. Tiştên desthilatdar dikin ku li ber çavan weke qencîyê xuya dikin, bizane ew jî êş, jan, kul û derd in. Bi kurt û Kurmancî wiha dibêje: Çi biryara desthilatdar didin û binê wê mohr dikin, berjewendîya civakê tê de nîne, tersê wê ji bo wan dibe pirsgirêk û belayeke wisa ku di dawîya wê de mirina bi işkenceyê heye. "Qencîya" dikin jî divê bê zanîn ku ne ji bo berjewendîya civakê ye. Li ber çavan her çendî weke qencîyê xuya bike jî, di dawîyê de ji bo wan dibe neqencî. Neqencîyeke wisa ku serê wan ji derd û kulan xelas nebe. Li hemberî xerabîya desthilatdaran ka pêwîst e civak çi bike, Xanî wiha dibêje:

"Aqil hezerê dikin ji maran
Xafil dibine muhibb û yaran..."

Kesên biaqil hizra xwe ji maran (desthilatdaran) dikin. Li hemberî wan bitirs û biguman tevdigerin. Kesên

barê me, desthilatdarîya me û mîrtîya me bi saya wî û yên weke wî dimeşin. Ku ne ji wî be em ê ji gelek tiştan agahdar nebin. Piştî ku evqas karên me pê diqedin em ê çima ji xwe dûr bixin. Di vir de jî diyar dibe ku ji bo desthilatdaran ya girîng kursîyê wan e. Kesê kursîyê wan biparêze di dinyayê de mirovê herî genî û gemar be jî, ji bo wan mirovê herî pîroz e. Lewre ji bo wan pîvanên pîroziîyê ewlekarîya desthilatdarîya wan e. Mîr bi malika li jêrê taybetîyên Beko û yên weke wî wiha tîne ziman:

"Ev zumre ku zalim û ewan in
Sûbaşî û şehne, dergevan in..."

Ev beşa mirovan ya em behsa wan dikin, ku zalim in, xerab in û gelac in, di heman demê de dergevan û parêzvanên bajêr in û ji kar û barê bajêr berpirs in. Ango bajarê me bi wan aram û ewle ye. Heta xerabîya wan negihe desthilatdarîya me wê li cem me biqîmet û birûmet bin. Û wiha behsa erkê wan dike:

"Aşêd-i me zaliman digêrin
Dexlêd-i me zaliman dihêrin..."

Ev kesên weke Beko, yên em behsa wan dikin, aşê me desthilatdarên zalim digerînin û dexlê me zordestan dihêrin. Ango çiqas girêj û çepel bin jî, eger ne ji wan be wê aşê desthilatdarîya me negere û em ê nikaribin serdestîya xwe bidomînin. Aşê me negere ti kes guhê xwe nade me. Bi saya wan mîrtîya me, desthilatdarîya me li ser pîyan dimîne. Ne ji wan be dexlê me, zadê me nayê hêran. Ango wê hukmê me pêk neyê û bandora biryar û fermanên me nemîne. Eger aşê desthilatdarîya me ava ye û bîst û çar saetan zadê mîrtîya me tê hêran, bi saya wan e. Bi kurtayî bi saya wan em serbilind in, bi saya wan em kumê xwe xwar dikin, bi saya wan hibra mohra me her tim şil e û bi saya wan em bi aramî û ewleyî li ser textê desthilatdarîyê rûdinin. Mîr di malika jêrê de bi awayekî eşkere dibêje, nanê em desthilatdar dixwin heram e.

"Aşê me eger çi weqfê am e
Gewrî tijî garisê heram e..."

Aşê me her çendî gîştî ye û ji bo civakê tevê ye, lê gewrîya wî ango kuna beraş ya zad tê re derbas dibe tijî garisê herem e. Ango mal, milk, serwet, dewlemendî sererd û binerdê welat, her çendî em dibêjin yên civakê tevê ne, lê di rastîyê de ne wisa ye. Her tişt di destê me desthilatdaran de ye û em çawa bixwazin wisa bi kar tînin. Em bi keyfa dilê xwe jê dixwin, vedixwin. Ji ber wê xwarin û vexwarina me tev heram e. Nanê helal li pişt qirika me nakeve. Lê Mîr dîsa vedigere ser egera xwedîkirina kesên weke Beko û wiha dibêje:

"Wî garisî harisek diçînit
Ew haris e dê bo me hilînit..."

Ew garisê heram yê di qirika me de, kesek, parêzvanek diçîne. Herwisa wê ew kes wî garisî hilîne. Ango yên zevîyên mîrtî û desthilatdarîya me

■ **Ehmedê Xanî**

nêzîkî wan bibe. Herî dawî Mîr nîyeta xwe eşkere dike û sedema dernexistina Beko wiha vedibêje:

"Her çend-i Bekir weledzina ye
Aşê me ji wî bi fetl û ba ye..."

Her çiqas Bekir ne ji bavê xwe ye, pîç e jî, aşê me bi wî fetil dikevinê û bi saya wî digere. Eger ne ji wî be wê aşê me bisekine. Ango Bekir çiqas xerab û gelac be jî, çiqas fesad û netitişt be jî, çiqas ne hêjayî dergehê me be jî, kar û

wê di gotina xwe de guhertinê dike:

"Her çend se û dergevan bira ne
Ekser se bimihr û bawefa ne..."

Her çiqas se û dergevan heman karî dikin û weke hev in, lê se ne bêbext in, ne xayîn in, dost û evînên xwedîyên xwe ne. Wefadar in, xwedîyên xwe ji bîr nakin. Lê çawa ku bizane wê pirseke wisa jê bê kirin, bersiva Mîr amade ye. Di bersiva daxwazîya Tacdîn de, hem egera dûrnekirina Beko dibêje, hem behsa hin taybetîyên desthilatdaran dike. Em guhdarî gotinên Mîr bixwe bikin:

"Ev rengehe Mîr digote Tacdîn:
"Fi'lêd-i Bekir meger nizanîn..."

Çawa ku di bin simbêlên xwe de bikene, Mîr bersiveke wisa dide û dibêje, maqey tu texmîn dikî ku em Bekir nas nakin û bi kirinên wî yên xerab nizanin. Ango dibêje, em ji te baştir Bekir nas dikin û axaftina xwe wiha didomîne:

"Em qismê emîr-î qismê aş in
Pirrfetl û gerr in û pêş û paş in..."

Em qismê desthilatdaran weke aş in. Çawa ku berê aş pir bifetil e û pir digere, em jî wisa bifetil in û pir digerin. Em geh ber bi pêş ve diçin, geh ber bi paş ve. Ango em li cîyê xwe nasekinin; rast û çepê me ne diyar e; bawerî bi me nayê; ka kengê em çi bikin û çawa bikin, ti kes nizane. Xapên me, lîstikên me pir in. Siyaseta me jî ne diyar e; geh li pêş e, geh li paş e, geh reş xuya dike, geh spî, geh bi rengekî din. Û sedema vê rewşa xwe jî wiha şîrove dike:

"Neçar e ji bo me aşivanek
Labudde ji bo me dergevanek..."

Em neçar in aşvanekî ji xwe re peyda bikin û pêwîstîya me bi dergevanekî heye. Ango em dewlemend in, em nikarin bi serê xwe her karê xwe bikin. Pêdivîya me bi xulam û xizmetkaran heye. Li alîyê din em desthiltadar in, qesrên me hene, divê hin zêrevanîyê, hin dergevanîyê, hin natorvanîyê, hin parêzvanîyê bikin. Kesê xizmeta me bike kesayeta wî ji bo me ne girîng e. Ka baş e, ne baş e, derewker e, gelac e, bêexlaq e, deyûz e, teres e em lê nanêrin. Ka karekî baş ji me re dike, yan na em li wê dinêrin. Taybetîyeke desthilatdaran jî wiha eşkere dike:

"Hindî bi hukumetê dikin dewr
Geh edl e ji bo me kar, geh cewr..."

Heta ku em desthilatdar in û hukum di destê me de ye, rast û çepê me ne diyar in; karê em dikin, biryarên em didin û fermanên em dertînin, ji bo hina wekhevî û edalet e, ji bo hina jî zordestî, bêbextî û xiyanet e. Di vir de jî Xanî bi devê Mîr dide ragihandin ku desthilatdar ka kengê qencîyê bikin, kengê xerabîyê bikin nayê zanîn. Di vê malikê de jî careke din xuya dibe ku divê bawerî bi desthilatdaran neyê û li hemberî wan civak her tim şiyar be. Ku qencîyê jî bikin divê biguman

bangî wan dike: Çi dibe bila bibe, kî dibe bila bibe, tu di çi rewşê de bî bibe, teqez xwe ji desthilatdaran dûr bigire û li hemberî wan bitedbîr be. Eger kesê desthilatdar kurê te be, bavê te be, yan dostekî te be jî, teqez divê tu ji wan, ji gotin û sozên wan bawer nekî. Ango dibêje; bi desthilatdaran neyên xapandin. Çiqas nêzîkî we bin jî, ne yên ewleyiyê ne, saeta hêrs bibin, yan gumanek ji wan re çêbe nabêjin, ev kurê min e, bavê min e, yan dostê min e. Kî dibe bila bibe, kesên ji bo kursîyê xwe asteng, yan ji bo desthilatdarîya xwe bixeter bibînin, çawa ku tu qurtek av vexwî, dikarin di cî de wan tine bikin. Çawa ku em dibînin ji bo desthilatdarîyê jin hemserê xwe, mêr birayê xwe, kurê xwe, kur bavê xwe dide kuştin. Yek ji wan mînakan jî sultanê Osmanîyan Mehmed e, ku ji bo desthilatdarîyê 18 birayên xwe yên piçûk dane kuştin.

"Xasma ku mûqerrebêd-i bedxwah nêzîkî bibin, neûzû billah!..."

Di vê malikê de jî ku girêdayî malika pêşî ye, Xanî wiha dibêje: Jixwe eger kesên ne baş û bêbext li derdora desthilatdaran hebin, hingê xerabîya wan qat bi qat zêde dibe. Ango desthilatdar jixwe pir xerab in, nemaze ku yên nêzîkî wan jî xerab bin, Xwedê me ji hêrs û xişma wan biparêze. Çawa ku agir li agir bê zêde kirin, yan jî benzîn li agir bê kirin, rewşeke wisa derdikeve. Ji van gotinên Xanî ev wate jî derdikeve: Ji ber ku desthilatdar -ji ber zordestîya li mirovan dikin- ji xwe bitirs in, zû dikevin binê bandora kesên derdora xwe. Ev jî wan çavsortir dike.

Bêexlaqîya desthilatdaran û bikaranîna kesên neqenc:

Xanî di van malikên li jêrê de jî bala me dikişîne ser hin taybetîyên desthilatdaran û derbarê rêbazên wan de me şiyar dike:

"Tacdîn-i digote mîr eyanî:
Mîr'im, bike der vî dergevanî..."

Di vir de Xanî behsa têkilîya di navbera Mîrê Bohta û Tacdîn de dike. Tacdîn hem parêzvan, hem dostê Mîr Zeydîn e. Di hemen demê de dostê Mem e jî. Tacdîn naxwaze kesên neqenc li derdora Mîr hebin; bi awayekî eşkere û dostane jê re pêşnîyar dike ku dergevanê qesrê ji kar derîne. Dergevan Beko ye. Yê nehiştî Mem û Zîn bigihin hev, ku di nava Kurdan de sembola bêbextî û xîyanetê tê naskirin. Jixwe di nava civakê de navê wî yê din "Beko Ewan" e. Ango Bekoyê fesad, gelac. Tacdîn egera pêşnîyara xwe jî ji Mîr re wiha rave dike:

"Ev laiqê dergehê te nîne
Ev kelbê nehindir ê bikîn e..."

Mîrê min, Bekoyê dergevanê te kûçikekî bêbext, xayîn û kîndar e. Mirovekî wisa ne layîqê dergevanîya te ye. Ji bo wê dixwazim tu derînî. Tacdîn, çawa ku poşman bûbe Beko şibihandîye kûçik, lewre di bawerîya wî de Beko ji kûçik xerabtir e. Ji ber

serokê eşîrekê, fermandarê artêşekê, berpirsê sazî û rêxistinekê be. Çi piçûk, çi mezin desthilatdar xwedîyên heman hişmendî û taybetîyan in. Gelo Xanî bi çi çavî li desthilatdaran temaşe kirîye? Çawa nirxandine? Çawa dane naskirin? Têkildarî wan ji bo civakê çi pêşnîyar kirine? Bersiva van pirsan di gotinên wî bixwe de weke rojê diyar in. Em ji çend malikên di Mem û Zîn´ê de dest pê bikin:

"Hukkam-i bi batin û bi zahir
Bê şubhe mûşabih in bi agir..."

Bila gumana we tinebe ku serdest û desthilatdar hem bi hiş, bîr û bawerîya xwe, hem bi kirin, reng, deng, şekil û şemala xwe weke agir in. Baş e, Xanî çima deshilatdaran naşibihîne tişteke din, dişibihîne agir? Lewre tiştek hinge agir êşê bide mirovan nîne. Ji bo her zindiyî êş û işkenceya herî dijwar agir e. Ji ber wê li gorî dînê Islamê cezayê herî giran şewitandina bi agir e. Ango dojeh e. Xanî jî desthilatdaran dişibihîne dojehê û zebanîyên wê. Di malikeke din de jî wiha dibêje:

"Zahir di spahî û binûr in
Batin ji midareê di dûr in..."

Desthilatdar li ber çavan xweşik, bedew, rûxweş, rûgeş û weke firîşteyan in, lê di zikê xwe de, di hundirê xwe de, di hiş, bîr û bawerîya xwe de ji qencî, başî û rindiyê pir dûr in. Herwisa derbarê rêveberî û meşandina karê civakê de, ji hestên mirovahîyê, wijdan û wekhevîya di navbera mirovan de bêpar in. Ango divê mirov bi şekil û şemala wan, bi rûgeşî û gotinên wan yên xweş û qelew neyê xapandin. Lewre rû û hundirê wan ji hev re nakok in. Li seranserê cîhanê -çi piçûk, çi mezin- dema em li desthilatdaran û kirinên wan dinêrin, taybetîyên Xanî behsa wan kirî tev li cem wan tên dîtin. Bêguman eger em bi çavê naskirinê li wan binêrin. Taybetîyên wan wiha didomîne:

"Rehmê ku dikin, ji rengê roj in
Qehrê ku dikin, cîhan disojin..."

Desthilatdar dema bixwazin qencîyê bi hina bikin, ji wan re bibin alîkar, -bêguman ne ji her kesî re, ji kesên derdora xwe re-, bêpîvan didin. Her daxwazîya wan pêk tînin. Di vir de wan dişibihîne rojê; ka çawa roj ji bo dinyayê çavkanîya jiyanê ye, desthilatdar jî ji bo derdorên xwe û kesên textê wan diparêzin çavkanîya jiyan, xweşî, aramî û bextîyarîyê ne. Dema ji hina hêrs jî dibin, ne wijdan bi wan re dimîne, ne exlaq, ne jî mirovayî. Dinyaya wan di serê wan de diroxînin û dişewitînin. Ango dema ji hina dixeyidin wan bi hebûna wan ve tine dikin. Di vir de jî dîsa wan dişibihîne agir. Û derbarê xetera wan de vê şîyarîyê dide me:

"Zinhar-i bi wan nekî tu bawer
Ger bab û pis î û ger birader..."

Xanî di vê malikê de têkildarî desthilatdaran bi gotinên pir zelal û eşkere mirovan şîyar dike û wiha

Xanî û Desthilatdarî

Mohra ku desthilatdar li binê biryaran dixin, bizane ku hibra wê jehir e. Qenc, xerab biryar çi dibe bila bibe, hibra ji wê mohrê li ser kaxizê dikeve, ne hibir e, jehir e û dikeve xwîna her kesê têkildarî biryarê.



Diyar Bohtî

Di nava gel û civakan de, hin bi dewlemendîya xwe, hin bi bedewîya xwe, hin bi neqencîya xwe, hin bi camêrîya xwe, hin bi zanabûna xwe û... hwd tên naskirin. Lê hin jê, ji ber ku gelek alîyên wan ên girîng û bisûd hene, mirov nizane ka kîjan alî derxe pêş. Hin mirovên pir mezin jî ji ber rewşa civaka xwe ya xerab, bi têrayî nayên naskirin. Hin jê weke cewherekî di binê xirbeyên dîrokî de li benda arkeologan in. Fîlozofê Kurd Ehmedê Xanî jî, mixabin ji ber rewşa neteweya xwe ya ji azadî û serfirazîyê bêpar mayî, baş nehatîye naskirin. Bêguman li ser kesayeta wî heta niha gelek hatîye nivîsîn û derbarê wî de nêrîn hatine diyarkirin. Hina alîyê wî yê fîlozofî û felsefî derxistiye pêş, hinan jî alîyê wî yê neteweyî û hinan jî alîyê wî yê wêjeyî. Lê her ku mirov berhema wî ya dîrokî Mem û Zîn´ê dixwîne mirov alîyên wî yên din jî dibîne. Û hin alîyên wî jî di nava peyvên destanê de veşartî ne. Bi yekbûna tîrêjên dil, çav û mejî û bi hunerîya zêrînkerekî encex mirov bikare wan alîyan derîne meydanê. Di vê gotara xwe de dixwazim li ser nêrîna wî ya li desthilatdaran rawestim. Lê yên dewletan bi rê ve dibin desthilatdar ne ew tenê ne. Kesê desthilatdar, dibe ku malxwê malekê,

rêkkeftin û komkirin û civat navbera mirovên civakê de û navbera netewe de peyda bibe.

Erkên rageyandinê:

Rageyandin pênc erkên wê hene:

1. Arastekirin û drustkirina helwêstan û rûkarîyan: Çendî madeya rageyandinê ji alîyê ziman û naveroka xwe ve li gor cemawer be, hewqas karêgerî zêde bû.

2. Zêdekirina rewşenbîrî û agahîyan di rêya amrazên rageyandinê de ku bîr, raman, zanyarî, fotograf û ra û boçûn, xelekên rêbervanîkirinê di rêya amrazên rageyandinê wek em bêjin rewşenbîrkiina cotkaran .

3. Pêwendîyên civakî û têkilîyên navberkî: Gehandina civakî danûstandineke di navbera xelkê xwe bi xwe de, navgînên rageyandinê pêwendîyên civakî kûrtir û geşetir dike, wek rûpelê pîrozbahîyan, mirîyan, zewac, her weha cemawer bi kesayetîyên sîyasî û hunerî û wêjevanî yên bilind bidin naskirin.

4. Dilxweşîya cemawer û mijûlkirina wî: Dagirtina valahîya dem û wextên xelkê, her weha berê xelkê bidin ser rêya rast û drust di rêya gelek navgînên rageyandinê de.

5. Cardan û agadarî li kelûpel û xizmetên nû, agadarkirina xelkê fermanberan bi cihên vala bo karkeran, vekirina mazatê, nasandina çi tiştên nû bo cemawer ligel biha û taybetîyê wê.

Amrazên ragehandinê

Şêweyên Amrazên ragehandinê bi çend awayên cîyawaz dîyar dibin:

1. Amrazên xwendinê weke rojname û govaran,
2. Amrazên bihîstinê weke radyo.
3. Amrazên dîtinê weke tilivizyon.
4. Navgînîyên internêtê ji yên dîtir çalaktir in, ji ber ku internêt hersê şêweyên jor li xwe digire.

Encam:

Cîyawazîya di navbera rageyandin û geyandinê de.

-Geyandin

1-Geyandin fereh û giştgîr e

2-Geyandin du rûkar tê de hene, pêwîst e ku nameber bersiveke bilez wergire.

3-Mebest ji geyandinê ew e ku karlêkî yan danûstandinê hebe ku wergir bibe nêrer di piroseya geyandinê de.

-Rageyandin

1-Beşeke ji piroseya geyandinê

2-Yekalî ye: agahî ji nêrer diçe bal wergir ve,

Armanc ji ragehandinê belavkirina agahîyan di rêçeke libar de û wergir agadar dike.

Çavkanî

Gotar ji Malperên Internêtê

1. Heyat Mekîd , Drûs fî miqyas alitîsal , 2016/2017

https://telum,umc.edu.dz course overiewfiles

حياة مكيد، دروس في مقياس الاتصال

2. الاعلام والجمهور https://sotor.com

3. Dr Aryana Ibrahim, Zimanî Rageyandin, çapxaney zankoy Selahedîn, Hewlêr, 2018 (pertûk bi zarê Soranî).

li ser pênaseya rageyandinê û hin taybetîyên wê rawestin.

Têrima rageyandinê çêl wî emrazî yan wê teknîka ku zanyarîyan û agahîyan li xelkê belav dike bi armanca zanyarîyan bixe destê gel de û xelkê bide naskirin bi hemî tiştên ku li deverê diqewimin. Rageyandin navgînîya herî giring e bo belavkirina rastîyê û rayên sîyasî û abûrî û geşepêdan. Herweha xelk dikarin pirsgirêk û pêşnîyar û rayên xwe di rêya emrazên ragehandinê de belav bikin.

Erk û Taybetîyên ragehandinê:

Ragehandin gelek erkên xwe hene ku yên herî berz ev in:

Nuwandina civaka hawîrdor ku ji xelkên normal pêkdihê, nuwandina dezgehên fêrkarî û geşepêdanê, bi armanca danîna pêwendîyên hevbeş di navbera xelkê û alîyên sîyasî û alîyên dîtir. Her weha pêşkêşkirina xizmeta rageyandkarî û rêberayetî bo pêkanîna aştîya giştî di nav xelkê de. Û belavkirina nûçeyên nû di civakê de bo ku xelk li ser bûyerên heyî agadar bibin.

Ji taybetmendîyên ragehandinê ew in, ku li gel pêşketina teknolojî xwe pêş dixe, her weha nûjentirîn teknîk bikar tîne, bi mebesta gehandina agahîyan bo pirtirîn jimar ji xelkê. Rageyandin li her deverê heye, em dikarin nûçe û dengûbasên deverên dûr jî binasin, her weha xwe bigihînin nav çanda miletên dîtir û li dab û nerît û folklora wan agadar bibin. Her ev jî bi zûtirîn dem çareser dibe û bi bihayekî kêm bidest dikeve. Rageyandin pencereyeke mezin e bo dîtin û naskirina arîşe û derdên mirov û miletan ji bilî xwendina zanyarî û lêkolînên zanistî û dahênerane di gelek buwaran de belav dibin.

Taybetîyên rageyandinê:

1. Rageyandin çalakîyeke pêwendîyê ye, berhêzîya wê çavkanîya zanyarîya ye, nameya rageyandinê, navgînên rageyandinê yên ku nameyan rêdikin, cemawerê wergirên nameya rgeyandinê û kartêkirina rageyandinê.
2. Ji sîmetên Rageyandinê rastî ye, wurdî(hûrbînî) û rastgoyî û pêşkêşkirina rastîyên cêgîr û nûçeyên durist.
3. Armanca rageyandinê şîrovekirin, hasankirin, ronîkirina rastîyan û bûyeran e.
4. Çendî civak komplêksa wê zêde bû, wilo jî giringîya rageyandinê zêde dibe, şaristanî pêşdikeve, û asta fêrkarî, rewşenbîrî û fikrî li gel civakê bilindtir dibe.

Armancên rageyandinê:

1. Berdestkirina dengûbas û zanyarîyan der barê hawîrdora xelkên deverê.
2. Guhastina kelepûrê rewşenbîrî ji nifşekî bo nifşekî dîtir û alîkarîya nifşê nû di perwerdekirina wan di buwarên (rewşenbîrî, fêrkarî, perwerdekirin).
3. Zêdekirina dilxweşîya xelkê û kêmkirina nexweşîyên jîyana wan.
4. Alîkarîya sîstema civakî bo ku

Şêweyên geyandinê:

1. Gehandin xweyî di navbera mirov û xwe de: Mirov xwe nas bike û pêwendîyên xwe bi cîhana hawîrdora xwe ve, û asta agadarîya wî bi şîyankarîya wî ve.

2. Gehandin di navbera tak û kesên dîtir: Naskirina mirov ji kesatîya wî re dibe bingeh bo pêwendîkirina wî kesên din re, pêwendîkirin ji zarokatî dest pê dike û hin bi hin pêş dikeve.

Astengîyên gehandinê:

Birrek ji astengîyan dikevin rêya gehandina nameyê bo wergir, ku ew jî ev in:

Astengîyên taybet bi nameber (nêrer):

- Nekarîya pilansazîyê di piroseya gehandinê de.
- Leyistin bi wata û bêjeyan ji alîyê nameber ve bimebest an bêmebest.
- Nekarîna nêrer di derbirrîna dirust û hilbijartina destewajeyên rast û berasan.
- Lawazîya têgehiştinê di navbera nameber û wergir de.

Astengîyên taybet bi wergir:

- Nekarîna guhdarîkirinê ji alîyê wergir di demeke dirêj de.
- Asta zanistî ya wergir di şîkirin û encamdanê de lawaz e.
- Delavê wergir nexweş e yan dijwar e bo wergirtina nameyê.

Astengîyên derve:

- Peydabûna ajawegêrîyê li nik nameber û wergir.
- Danîna sansor li ser geyandinê (jêbirin, lê zêdekirin, dûreparêzî)
- Şewişandin ji alîyê hin kes ve bi mebesta negihaştina nameyê.

7) Berhêzên gehandina çalak

1. çakîya hinartin û wergirtinê .

2. Nazikbûna hestê mirova der barê pêwîstî û pêdivîyên kesên dîtir hunereke giring e, bo danîna pêwendîyên mirovane li gel xelkê di danûstandinê de dîyar dibe.

3. Ronakîya zanyarî: Guhastin û wergirtina zanyarîyan, bi mercê ku ew kesên di gehandinê de beşdar in bi pêkhateyan agadar bin, ronakbûna armanc, rol, erk û pêwendîyan.

8) Têgehên nêzî gehandinê:

A) Têgeha ragehandinê:

Pênaseya rageyandinê:

Kareke bo hinartina agahîyan ji dezgehekî yan ji kesekî yan di rêya xwendina rojnameyekê, yan di rêya bihîstina dengûbasên radyo û Tv û gelek navgînên dîtir. Bi şêweyekî dîtir yek rageyandinê dide naskirin: “pêşkêşkirina agahî û zanyarîyên dirust û ronak bo xelkê”.

Têrma “rageyandin”ê amaje bi wê emrazê dike, ya ku xelk pê dihête ragehandin, ango di rêya wê re, xelk agadar dibin ka çi li dora wan dibe û diqewime, bûyerên deverê ji wan re bi tevavî dibêjin. Armanca binerетî ya ragehandinê agadarkirina xelkê bi hemû bûyerên deverê, ka çi çê dibe, çi diqewime? Her ev jî bi gelek navgînan dibe: navgînên bihîstinê, yên dîtinê, yên nivîsandinê. Di vê beşê de em ê

nameber bo wergir rêdike, bi mebesta karîgerîyekê lê bike bo guhartina reftarên wî kesî yan wan kesan. Name ji xwe naveroka pêwendîyê ye, hemerengîya nameyan li gor coreyên pêwendîkirinê û armanc û alîyên beşdar. Mercên nameyê ew in:

- Ku danîna dîzayn bi awakî bala wergir bikişêne xwe.
- Name bi dariştineke libar bi awakî ku li gor pêçêbûnên wergir di têgehiştinê de were hûnandin ,
- Dariştina nameyê li gor amrazên pêwendîkirinê (gehandin)ê ku li ber destê nameber de ye.

4-**Navgîn**: Ew dezgeha madî ku name têre dihête şandin, ew jî bi rêya çend kenalan hemecor dibe, wek:

1- Bêjekenal (kenalên gotinê): Ku wata wek nîşanên dengî rû bi rû dihêne guhastin.

2- Nivîsekenal (kenalên nivîsînê): Ku bi rêya nîşanên nivîskî têne xwendin û şandin.

3- Teknokenal (kenalên teknolojî): Wek telîfon, telegraph, interfon (interphone), teleks (telex), radyo, televizyon.

4- Wênekenal (kenalên wêneyî): Wek likandek (mulseqat), nivîsarên dîwaran, û tabloyên cardanê (lewhê i'lana).

5-Dengvedan:

Bersiva wergir e dema ku nameyê werdigire



Taybetîyên gehandinê:

1- Pêvejoyeke (Piroseyeke) armancdar e (guhastina agahîyekê, rayekê, bîrokeyekê, kartêkirinekê di wergir de.

2- Pêvejoyeke dînamîkî ye, berdewam e.

3- Pêvejoyeke zîvarkî ye (wergir dibê nameber, û nameber dibê wergir).

4- Pêvejoyeke orgenîzekirî ye (birêkûpêk e).

5- Pêvejoyeke hemereng e (zimanê vegotinê: devkî yan nivîskî ye, zimanê bêgotin: amaje, nîşan).

Erkên gehandinê:

Harold Lasswell erkên gehandinê weha dest nîşan dike:

1. Komkirin û ronîkirina zanyarî û agahîyan li ser hemî bûyerên hawîrdor yên deverê, çi yên hundur û çi yên derve, eva han jî dibe erkê ragehandinê (amrazên rageyandinê).

2. Girêdana parçeyên civakê bi mebesta ku bersiveke yekgirtî derbarî van bûyeran de dîyar bibê, ango ravekirina agahîyên jîngehê, wan bidin şîkirin û helwêsta pêwîst jê bê girtin.

3. Guhastin û belavkirina keleporê civakî: Ev erkekî fêrkarî ye bo perwerdekirin û şîyankirina takekes bi awakî ku li bayê aydîyal û bihamendîyên civakê were.

Piştî vê yekê Televizyon hat û agahî bi awakî dîtir hatine belavkirin ku du core erk dîyar bûn: aşîtkirin û cardan.

kakilê pêwendîyên civakî ye, mirov çiqas bikare serbikeve di pêwendîyên xwe de li gel xelkê, wilo jî di jîyana xwe de serdikeve, her ev jî di tendirustîya wî ya derûnî û civakî de dîyar dibe, ew miletê ku berdewam e li gel çand û rewşenbîrîya xwe ya dema berê, wilo jî serdema wî ya îro pê xweş dibe, weha jî pêwendîyên miletan bi hev re çiqas xweş dibin, wilo jî jîyana wan pê xweş dibe.

Inca geyandin piroseya guhastin û pêguhartina agahî, bîr û bawerî û çalakîyên di navbera du kesan de, yan du girûpan de, yan ji alavekî bo alavekî dîtir, bi rêya amêrekî ji amêrên geyandinê, bi armanca rêberayetî yan deskarî yan guhartina reftar û nerînan li nik kesekî yan jimarek ji mirovan. Ji ber wilo hin zana şaristanîyê li gor pêwendî û gehandinê dabeş dikin ku ew jî weha ye:

1. Şaristanîya bihîstinê û devkî: Pêwendî li gor dengan û amaje û hêmayan ku watayên hevbeş navbera wan de hebû.

2. Şaristanîya nivîskî: Ku di vê qûnaxê de nivîsîn wek amrazekî pêwendîyan navbera mirovan de bikar dihat, ev jî çar hezar sal berî Îssa digire.

3. Şaristanîya çapemenî: Ji dema ku zanistyarê Elmanî (Yohan Gtemberg) li bajarê "Mînz"a Elmanî li sala 1436 dezgeha çapkirinê bo cara yekem dahêna, ku vê dahênanê rêyeke nûjen û pêşketî vekir bo belavkirina zanyarîyan li ser pelan bi şêweya pertûkan, herweha vê yekê hişt ku rojname û govar berfereh belav bibin.

4. Şaristanîya telegraph, televizyon, sînema û radyo ku di nîvsedê yekem de ji sedeyê bîsten dest pê kir.

5. Şaristanîya elektron, atom û dagîrkirina asîman: ku heyvên deskird û dezgehên komputer bo xezinandin û analîzekirin û vegerandina agahî û zanyarîyan, herweha bikarhênana atom û layzer di buwarên aştîyane de wek pêwendîkirin.

Regezên piroseya pêwendîkirinê:

Sosyologê Amrêkî, Harold Dwight Lasswell (1902–1978) bo pilansazkirina nameyên rageyandkarî, di sala 1948'an de rêjeyek amade kir, ev rêje vê dawîyê bû yek ji bingehên karê ragehandinê di pêwendîyê li gel cemawer de û rêkirina name û agahîyan bi baştirîn rêçikan da ku karîgerîyeke çalak li xelkê bikê. Rêjeya Lasswell bi şêweya jêrî xwe ava dike:

(Çima û kî çi (dibêje) bo kê di kîjan kenalî de bi çi kartêkirinê)

Kî çi dibêje, bo kê, bi kîjan kenalên pêwendîkirinê, û bi çi kartêkirinê?

Inca regezên piroseya pêwendîkirinê ev in:

1- **Nêrer** yan **nameber** (jêder): Xala despêkirina piroseya pêwendîkirinê, nêrer yan nameber mirovek be yan amêrek be, inca pirose dest bi rêkirina nîşanên corawcor, name bo wergir dihête arastekirin.

2- **Wergir**: Ew kes an ew girûpa ku name jêre dihête şandin.

3- **Name**: Birrek ji watayan e ku

Gehandin û Ragehandin

Rageyandin pencereyeke mezin e bo dîtin û naskirina arîşe û derdên mirov û miletan ji bilî xwendina zanyarî û lêkolînên zanistî û dahênerane di gelek buwaran de belav dibin.

Amadekirin û wergêran: Berzo Mehmûd

Gehandin pêwendîyeke li gel alîyekî dîtir, ev pêwendî şêweyekî taybetî digire. Çi danûstandina bi ziman be ku herdu alî têdigihin, çi bi rêya xwendina rojname be, yan bi rêya axaftin û hevpeyvênê li ser ekrana TV. Di kurdî de beramberî "communication" pêwendîkirin pirtir li guhê bîser dihê ku bi heman wataya (communication). Peyva "communication" ji (communis) a Latînî hatîye bi wataya (hawbeş, baw). Di zimanê Kurdî de gelek peyv hene ku du-sê forman werdigirin wek (gehandin, gihandin, geyandin) ango الاتصال wilo jî (ragehandin, ragihandin, rageyandin) ango الإعلام.

Pênaseya "gehandin"ê (pêwendîkirin)

Ev dema ku em îro têde dijîn jêre dibêjin serdema gehandinê ku bi saya şoreşa teknolojî guhartinek kete cîhanê de ya ku rûçikên wê di nîvê sedeya bîstem de hatine xuyakirin, û jîyan ber bi serdemeke nûjen de çû. Gehandin

xebat kirin bû, ji bo dengê jinên Îranê bide bihîstin berê xwe da xeta sînorê Rojhilat. Şîlan a bi projeya dengê jinên herêmê gihandina cîhanê ketî rê li ser sînor ji alîyê pasdaran ve hedef hat girtin û di tîrmeha 2006'an de şehîd bû.

Deniz Firat di êrîşên çeteyên DAIŞ'ê yên tebaxa 2014'an ser wargeha penaberên Mexmûrê de hedef hat girtin û şehîd bû.

Nûjîyan Erhan a ji bo nalînên jinên Êzdî yên ji ber 74 fermanan mane, bide bihîstin di êrîşên ser Şengalê de bi çeka sîyokastê hedef hat girtin û giran birîndar bû. Piştî berxwedana şeş mehan şehîd ket.

Nûçegihanên ajansa ANHA'ê Dilîşan Îbiş, li gel du hevalên xwe yên rojnamevan Rizgar Deniz û Hogir Mihemed, di 12'ê Cotmeha 2017'an de di şopandina pêngava Bagera Cizîrê, ya dawî li xîlafeta çeteyên DAIŞ'ê anî de hedef hatin girtin. Dema ku berxwedana şervanan, rewşa sivîlên ku ji ber faşîzma DAIŞ'ê direvîyan, dişopandin rastî êrîşa DAIŞ'ê hatin. Dilîşan û Hogir li cihê bûyerê gihan şihadetê, Rizgar Deniz ê giran birîndar dibe piştî 75 rojan li nexweşxaneyê gihişt şehadetê.

Weke Dilîşanê gelek jinên ciwan di enîyên şerê berxwedana Rojava li hemberî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê û komên çeteyên dewleta tirk de cih digirin û bi cesaret rastîyan ji cihê bûyerê digihînin hemû deverên cîhanê. Yek ji wan jî Rûken Cemal e, ji enîya Serêkanîyê heta Til Temir gelek bername çêkirin û di ekranên tv yan de bûyer bi awayek zindî gihand temaşevanan.

Ne tenê li Kurdistanê, lê li tevahîya cîhanê hemû liv û tevgerên jinan tayîbetî jî jinên rojnameger ên cesareta şopdarîya heqîqetê qazanc dikin dibin hedefa êrîşan. Di dîroka gelan de mînakên weke Gerda Taro pir in.

Gerda Taro ya şahidîya şerê navxweyî yê Spanyayê kir û hovîtîya hat jîyîn bi wêneyên xwe bi belge kirî rojnamegera jin a despêkê li qadên şer ser peyîwirê, jîyana xwe ji dest daye. Gerda ku wêneyên wê di rupelên dîrokê de cih girtin, yekem windaya jin a dîroka wêneyan e.

Gauri Lankesh rojnamegereke Hindistanê ye. Ew parêzvana mafên jinan e, li dijî pergala kastê ya xwe dispêrse polîtîkayên cudakar aktîvîsteke. Ji ber ku rexne li fanatîzma Hindî dikir, bû qurbanê sûyqestеke sîyasî.

Ulrîke Meînhof a ku bircuwayek bû, şertên herî giran yên jîyana îlegal a şoreşgerîyê tercîh kir. Ulrîke di xebatê de hat girtin û heta dawîya jîyana xwe li girtîgeha Stammheîm ê di hucreyekê de girtî ma. Dawîyê, di 9'ê Gulana 1976'an li hucreya ku tê de girtî bû daliqandî hat dîtin.

Di sala 2019'an de 3 rojnamegerên jin di qadên cuda ên berxwedanê de ji alîyê pergala serdestîya mêran ve hedef hatin girtin û hatin qetilkirin. Ji rojnamegerên jin ên hatin hedefgirtin, Mena Mangal 12'ê Gulanê li Afganistanê, Albertîna Martînez Burgosa 22'ê Mijdarê li Şîlîyê û Urooj Ikbal jî 24'ê Mijdarê li Pakîstanê hat qetilkirin.

ceyî bi rêyeke wiha heye, li Bakurê Kurdistnê bi Jinnewsê weşana xwe didomînin û hîna jî di guherîna zimanê zayendperest de bi îsrar in.

Yekîtîya Ragihandina Jinên Kurdistanê RAJIN:

Li Qadên Parastinê yên Medyayê di sala 2013'an, di Konferansa Çapemenîya Jinê ya 2'an de, bi mebesta geşkirina rêça çapamenîya jina azad, Yekîtîya Ragihandinê ya Jinên Kurdistanê (RAJIN) hate avakirin. Ragihandina jinên Kurdistanê xwe li gelek deveran rêxstin dikin û li hemberî pergala hişmendîya mêr a zayendperest rastîya bûyeran radigihîne. Li hember şerê deshilatîya mêrê ku her roj dibe sedema qetilkirina jinan, şêwe û rêbazên tekoşîna jinan vedibêje. Ji bo ku jin li hemberî hişmendîya mêrê serdest xwe nas bike, rêxistin bibe û jîyana heyî weke qeder nebîne hêz dide û rênîşandere. Ji bo wê jî giringîya ragihandina jinê ji bo hemû jinên cîhanê heye û watedare.

Radyoya Star Fm:

Di bin banê Yekîtîya Jina Azad a Rojava – Bakurê Sûrîyayê de radyoya jinê "Star FM" li navçeya Tirbespîyê bi diruşmeya "Dengê Star dengê Jin û Jîyanê ye" di 15'ê Kanûna 2017'an de dest bi weşanê kirîye. Hîna jî bi 10 jinên ciwan ên xwedîyê vîna serkeftinê, dengê şoreşa jinên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê digihîne guhdarvanên xwe.

JIN TV:

Jinên ku mîrataya şehîdên jin ên çapemenîyê dewir girtin ku armanc dikin heta hilma xwe ya dawî rastîyê ragihînin, di salvegera bîranîna sê jinên sîyasetmedarên Kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan, Leyla Şaylamez de, di 9'ê Çile JIN TV vekirin. TV yê 8'ê Adarê, Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê bi diruşmeya ''Dengê Jinê, rûyê jîyanê' bi testê ket weşanê û 30'ê Hezîrana heman salê dest bi weşana xwe ya asayî kir. Di weşanên Tv yê de hunera jinê û kêrhatinên wê yên jîyanê hîn zêdetir baş tê dîtin.

Li gel van weşanên serbixwe di hemû rojname, kovar, radyo û tv yên kurdî de tekez beşa jinê bi serê xwe heye û edîtorên pela jinê taybet in.

Di geşbûn û pêşveçûna ragihandina jina Kurd de, cihê şehîdên jin ên ragihandinê giring e. Çawa ku tu tişt ji nebûnê çênabe, di qada ragihandinê ya jina Kurd de mirov dikare şopa gelek jinên şehîdên ragihandinê bibîne. Mîna Gurbetelî Ersoz bi nasnav Zeyneb, Ayfer Serçe bi nasnav Şîlan Aras, Nesrîn Teke, Esen Aslan, Deniz Firat, Nûjîyan Erhan û gelekên din…

Gerînendeya karê nivîsan a rojnameya Ozgur Gundemê "Gurbetelî Ersoz" bi bedewîya çîyayên Kurdistanê dilê xwe neqişand û bi wê hunera heskirinê pêşengîya jinan kir heya nefesa xwe ya dawî.

Nûçegihana ajansa Mezopotamyayê Şîlan Aras a ku xeyala wê avakirina ajansa jinê û rojekê jî be, tê de

''Kadinin Sesi' û ''Ozgur Kadinin Sesi'' domand. Sala 2007'an kovara Hêvîya Jinê derket, ku pirsa îdeolojîk, sîyasî, çandî, civakî ya jinê ji xwe re dikire mijar û heta niha jî didome. Li kêlek wan, Kovara Jina Azad, Dengê Jin, Dengê Jina Azad, Taniriça Zîlan, Kovara YJA STAR, Kovara Zîlan, Buhara Jin, kovara Dengê Jîyanê û Asoya Jin dewam dikin.

Li zindanan jî ku ji hêla Tevgera Azadîya Kurd ve qadeke giring a berxwedanê ye, girtîyên jin heta niha gelek kovar, broşûr û pirtûk derxistine.

Rojnameya Binefş:

Ji 8'ê Adara 2014'an ve, li Bakurê Kurdistanê destpêkê mehane derket, paşê li ser daxwaza xwînerên xwe bû heftane. Di nava demeke kin de xwînerên wê zêde bûn û jinan kelecaneke mezin jê girtin. Ne tenê ji alîyê jinan ve di heman demê de ji alîyê pergala deshilatîya mêran a dewleta tirk ve jî zu ket berçavan û bû sedema êrîşan. Gelek doz lê hatin vekirin û dawîyê di sala 2016'an de ji alîyê KHK ya dewleta tirk ve hat girtin.

Kovara Jineolojî:

Kovara zanist û teorîyê ya sê mehan carekê derdikeve jineolojî 8'ê Adara 2016'an dest bi weşanê kir. Kovar a hemû jinan weke gerdûnên biçûk û ahenga jîyanê dibîne, hemû kêlîyên jîyanê weke şoreşê binav dike û bi wê bawerîyê dinivîse. hîna jî digihe ber destên xwînerên xwe.

Newaya Jin:

Ji 4'ê Nîsana 2005'an ve rojnameya jinan li Ewropayê weşanê dike û Heta niha 178 hejmar jê derketîye. Mijara rojnameyê di hemû qadên jîyanê de dîtina ked û hêza jinê ye. Ji portreyên jinên navdarên cîhanê heta qadên ekolojî û aborîyê berhemê keda destê jinan dişopîne.

Ajansa Nûçeyan a Jinan "JINHA":

Bi armanca ku bibin alternatîfa zimanê nêr, zayendîparêz, jinên Kurd gava pêşî ajansek jinan vekirin û armanc ew bû ku siruşta zayendîparêz a nûçeyê biguherînin. 8'ê Adara 2012'an bi gotina nivîskar Virginia Woolf ya "Û em dinivîsin....Bêyî ku em bifikirin ka mêr çî dibêje" li bajarê Amedê yê Bakurê Kurdistanê dest bi weşanê kir. Di cîhanê de yekem ajansa jinan a li dijî zayendperestîyê dengê têkoşîna jinê berzkir û cara yekem ragihand ku Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê ye, JINHA bû. Nûçegîhanên wê ji ber hem jinbûn hem jî li hember hişmendîya mêrê serdest xwedî helwest bûn bi zextan rû bi rû diman û gelek caran di kolanan de rastî lêdanê hatin. Ajans di 29'ê cotmeha 2016'an de bi birîyara KHK'ê ya dewleta Tirk hate girtin.

Piştre Rojnameya Şûjin a li ser înternetê weşan dikir, berîya ku saleke wê çêbibe, 27'ê Tebaxa 2017'an hate girtin. Jinên bawerî pê anîbûn ku hew-

Bedirxan, Fato Nalî hebûn.

Di navbera salên (1932 û 1950) de jinan di çapemenîya Kurdî de nivîskarî û rêveberî kirine. Mînak: Rewşen Bedirxan hem qunciknivîs û hem jî rêvebera giştî ya Karê nivîsê bû di rojnameya Hawarê de. Keça helbestvan û rewşenbîrê Kurd Pîremerd Rahmexan piştî mirina bavê xwe, sala (1950) bû xwedîya îmtîyazê ya kovara Jîn.

Ji sala 1910'an heya niha li gor daneyên berdest 106 kovar, rojname, ajans û malperên înternetê bi pêşengîya jinên Kurd hatine vekirin. Tekez hîn zêdetir in, ji ber piranîya wan tenê nav gihaye dema me û tu agahî di der bare wan de nînin. Li gor pêvajoyan heger em ji hev cuda bikin hinek ji weşanên heyî li gor salan weha ne:

Di Salên 1950'an de 3 weşan, salên 70'an de 1, salên 1980'an 6, di navbera salên 1990-1999'an de 47, di navbera 2000-2009'an de 38 û di navbera 2010-2018'an de 23 weşan derketine.

Navên hinekan ji wan jî weha ne:

Afretî Azad, Afret, Huner, Dengî Jinanî Kurdistan, Karwanî Afret, Afretî Kurd, Xanzad, Dengî Afret, Kadınların Kurtuluşu, Jina Kurd, Tewar, Yekbûn, Jîyan, Sêber, Jinî Emro, Dengî Afretan, Mehabad, Peyamî Xuşkan, Jina Serbilind, Jîn, Dengê Jinên Kurdistanê, Jinê Rabe, Yeksanî, Ji bo Rizgarîya Jinan, New Day, Jin, Zîna Nû, Arjîn, Tiruske, Tewar-Javîn, Sinûr, Spêde / Spêdey Nwê, Dengî Jinan, Bêdarî Xuşkan, Ronahî, Roza, Dengê/ Dengêk, Jujin, Çarşêw, Îlaf, Nîwey le Yadkiraw, Jîyanewe, Ayinde, Jîyanî Azad, Mîşkat, Mafî Afret, Bangeşey Rastî, Yaşamda Özgür Kadın, Nivar, Jin û Jîyar, Xanimî Ku, Jin û Jîyan, Lawêj/Awêze, Dengî Xaniman, Dengê Jîyan, Nwêkar, Rasan, Pêge, Rêwan, Şawuşka, Dengê Jinan, Dengê Jîyan, Roşnayî, Jinan, Tanrıça Zîlan, Jin û Jîyan Nû, Xatûzîn, Îştar, Behare Zen, Berbang, Hêlîn, Rasan, Berew 8'î Mars, Newaya Jin, Dayik, Komarî Roj, Seday Wê, Hêvîya Jinê, Gulcar, Kiçan, Warvîn, Zînê, Rodoz, Rewşen, Raperî, Asoya Jinê, Binevş, KJA, YJA Star, YPJ Star, JINHA, Şûjın, Jinnews, Jineolojî.

Destpêka salên 1990'î bi mezinbûna Tevgera Azadîya Kurd û destpêkirina pêvajoya artêşbûna jinê re çapemenî-weşana jinê jî geştir bû. Kovara pêşîn ya îdeolojîk a jinê ya Tevgera Azadîya Kurd bi navê Jina Serbilind bûhara 1993'an li Ewropa dest bi weşanê kir.

Rojnameya pêşîn a jinan a Tevgera Azadîya Kurd 'Jîyana Azad' jî 8'ê Adara 1997'an li bajarê Silêmanîyê yê Başurê Kurdistanê bi pêşengîya Şîlan Kobanê heftane dest bi weşanê kir. Rojnameyê di sala 1999'an de navberek da weşanê, sala 2000'an berdewamîya Jîyana Azad rojnemeya Roj Hayat bi pêşengîya Vîyan Soran dest pê dike, heta 2004`an weşana xwe didomîne. Ji sala 2004'an ve jî bi navê Truska dom dike.

Li Bakurê Kurdistanê jî, di sala 1998'an kovara bi navê ''Ozgur Kadin'' dest bi weşanê kir, paşê jî bi navê

Jin
û rojnamegerîya kurdî

Ji sala 1910'an heya niha li gor daneyên berdest 106 kovar, roj–name, ajans û malperên înternetê bi pêşengîya jinên Kurd hatine vekirin.

Zehra Tunc

Rojnamegerîya kurdî bi pêşengîya malbata Bedirxanîyan li koçberîyê bi rojnameya Kurdistan despêkir. Xebatên ronakbîrên Kurdan weke Qahîrayê li Stenbolê jî bi navê Cemîyeta Tealî ya Kurdan û baskê wê yê jinan xwe bi rêxistin kirin. Armanca Cemîyeta Jinên Kurd a Tealîyê ya paralelî Cemîyeta Tealî ya Kurdan hatî avakirin ku piranî arîstokratên Kurd tê de cih digirtin. Ew ji bo ku 'hişmendîya neteweyî' ava bikin. Di wê pêvajoyê de bi pêşengîya rewşenbîrê demê Pîremêrd Kovara Jîn dest bi weşanê kir. Jin jî ketin nava xebatên kovarê û nivîskarîya wê kirin. Ji jinan despêkê Guzîde Xanim bi boneya 22'ê Nîsanê nivîsîye û cejna hemû rojnamegeran pîroz kirîye. Nivîskarên mîna Mezîyet Bedirxan, Fexrîye Bedirxan, Mesadet Bedirxan û Fato Nalî jî hebûn.

Li peyî kovara Jîn vê carê jî di heman pêvajoyê de kovara bi navê Dinyaya Jinan, ku hemû jinên ji neteweyên cuda yên Împaratorîya Osmanî derdixistin. Ji ber ku navenda polîtikaya kovarê bêyî cihêtîya ziman, dîn, mezheb û netew, pirsa jinê bû, jinên Kurd jî di vê kovarê de dinivîsîn. Kovar di sala 1913'an derket û heta 1921'ê domand. Di kovara "Jîn" de nivîsên Mezîyet Bedirxan, Fexrîye Bedirxan, Mesadet

ne pispor e, lewre çi dibîne yan jî dixwîne rastêrast bandorê lê dike. Dema civakek bê yek perwerde yan jî bê rêxistin û bîrdozî be ew civak bihêsanî sînorên wê hemû tên dabezandin, bo nimûne: Dema dewleta Tirk û çeteyên xwe yên kirêgirtî êrişî Serê Kanyê û Girê spî kirin, dewleta Tirk û alîgirên xwe gelek wêne û Vîdyoyên sexte û xapînok belav dikirin, tê de diyar dikirin qaşo leşkerên Tirik û çeteyên wê alîkarîyê di dema cengê de pêşkêşî sivîlan dikin, lê ajansên cîhanî û bi taybetî yên Emerîkayê ew wêne û vîdyoyên xapînok dan pûçkirin. Ji ber ku ew tiştên Tirkan didan belavkirin weke ku leşkerên Tirik bi raya giştî ya cîhanê re dida pênase kirin ku alîkarîya sivîlan di demên cengê de dike, lê ajansa Emerîkî ya bi navê asochîtêd prees yek bi yek hemû tespît kirin ku ew wêne û vîdyo hemû sexte ne, û weke cih jî li Pakistanê ew vîdyo hatine kişandin, ne li bakurê sûrîyê û leşker jî ne Tirk in, pakistanî ne.

Bi kurt û kurmancî em Kurd weke ku di gelek waran de û bi taybetî di warê ragihandina civakî de jî qelsî û nepesîyên me hene, ji ber vê çendê ev yek pêwîst e baş were çespandin û di dawîyê de were çareser kirin. Niha em gelek caran dixwazin û dibhîzin têgîna artêşa eloktironîk ew yekîneyên bi medyaya civakî re mijûl û xerîk dibin. Di armanca artêşa eliktronîk de girîngîya wê ne kêmî artêşa leşkerî ye, ji ber ku cenga eliktroîk berî cenga leşkerî li ser erdê tê amadekirin. Di şer de berî êrîşên asîmanî yan zemînî êrîşên eliktironîk dewlet li hember hev û li dijî dijminê xwe pêk tîne. Ha di vir de em weke Kurd careke din weke hemî caran kêmî derdora xwe ne, di vî warî de divê em li paş nemînin da ku em jî fena her kesî karibin xwe ji êrîşan biparêzin û bi taybetî ji êrîşên eliktronîk ku dijmin dixwaze li himber raya giştî ya cîhanê me reş bike, hem weke şervanên maf û mirwet xwe pênase bike û me jî weke çete bide pênasekirin. Di dûmahîyê de dixwazim bînim ziman ku heger kurd bixwazin mîna hemî gelên cîhanê têperî çerxa 21'an bibin, pêwîst e di hemû waran de serdem û serwer bin, bi taybetî û nemaze di cîhana çapemenîya hejmarî ya eliktronîk de.

Rola ragihandinê di şoreşan de, Rojava û Bakurê Sûrîyê bo nimûne

Pêşeroj cewherî

Em Kurd weke ku di gelek waran de û bi taybetî di warê ragihandina civakî de jî qelsî û nepesîyên me hene, ji ber vê çendê ev yek pêwîst e baş were çespandin û di dawîyê de were çareser kirin.

Dema em dabaşa raghandinê dikin bêguman mebeşta me ragihandin bi hemû cureyên xwe ye, çi kaxezî, dîmenî, guhdarî û her weha ragihandina medyaya civakî weke malper û rûpelên eliktronîk. Ji xwe pêwîşt e were zanîn ku raghandin bi hemû cureyên navborî, dixwaze nerîneke deştnîşankirî bi raya gişti re bi şêweyekî ji şêweyan par ve bike, lê tişta ku ez li ser tekez dikim di vê gotarê de, mijara ragihandina civakî ye, di vê beşa ragihandinê de xapandin gelekî li pêş e. Mijarên neraşt û nedurişt bi zanebûn û bipilan têne belavkirin û ev jî bandora wê pir zêde li ser civakê, ew jî ji ber çend egerên sereke ne, hindek ji wan ev in:

Navgînên vê beşa ragihandinê di nav civakê de gelekî hatîye belavkirin, ji ber ku her kes îro di civaḳê de di deştê wî/wê de bêrîkfonek heye û bi vê amûra biçûk nûçeyan xulek bi xulek di şopîne.

Ragihandina civakî bandora wê li ser gel zor heye, ji ber ku ew kesê jê re xwendevan tê gotin bi şêweyekî gişti

dewleta Tirkîyê û ragihandina opozisyonê û ya rejîmê jî dixwestin ku hewldanên xwe yên dagirkerîyê rewa bikin. Lewma ANHAyê jî di vê pêvajoyê de li kêleka berxwedana civakê di nava berxwedanê de bû û hewl da ku nûnerîya alîyên berxwedanê bike. Hêzên dagirker û êrîşkar di demên şer de berê ragihandina xwe didan civakê û dixwestin ku vîna wan têk bibin, agahî û nûçeyên berovajî derbarê şer û pevçûnan de biweşînin. Li hember van hewldanan ANHAyê di hemû pêvajoyên berxwedanê de li enîyên pêşî yên şer, li nava gel, li enîyên paşîn û her deverê nûçegihanên xwe belav kirin û agahîyên rastîn ji çavkanîyên wê ji bo civakê radigihandin.

Ji berxwedana Serêkanîyê ya yekemîn, ta berxwedanên, Kobanê, Efrîn, herêmên Cizîrê, êrîşa DAIŞ`ê li dijî Kobanê û berxwedana Kobanê ya dîrokî, têkoşîna demdirêj ya li dijî DAIŞ`ê li seranserî herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê, berxwedana Efrînê û herî dawîyê berxwedna Serêkanîyê, di van pêvjoyan hemûyan de ANHA li enîyên pêş bû û her dem her roj nûçe û agahî radigihandin.

Li hember artêşa ragihandinê ya dewleta Tirkîyê, ANHAyê û hemû sazîyên din ên ragihandinê di nava berxwedan û têkoşîneke giran de, bûne dengê civaka bindest. Hêzên dagirker êdî nikarîn bi hêsanî komkujîyan li dijî gel pêk bînin bêyî ku kes bibihîze, dîmen û wêne û agahîyên komkujî û binpêkirinên dagirkerîya Tirkîyê her tim ji hêla ANHA`yê ve hatin belavkirin û weşandin.

Di berxwedana azadîyê de 4 nûçegihanên ANHA`yê şehîd bûn:

Roja 12`ê cotmeha sala 2017`an, gelek welatîyên sivîl yên gundewarên Dêrazorê hewl didan ku xwe ji çeteyên DAIŞ`ê rizgar bikin û xwe bigihînin herêmên ewle. Wekî her car nûçegihanên ANHA`yê her li cihê bûyerê bûn, sê nûçegihanên ANHA`yê Dilîşan Îbiş, Hogir Mihemed û Rizgar Adanmiş ji bo ku bûyerê bişopînin berê xwe dane wê herêmê, di demên êvarê de çeteyan êrîşeke bombeyî pêk anîn û tirmbêleke bombekirî di nava sivîlan de teqandin, di encamê de nêzî 9 sivîlan jîyana xwe jidest dan, her wiha nûçegihana ANHA`yê Dilîşdn Îbiş jî şehîd bû, nûçegihan Hogir û Rizgar jî birîndar bûn û rakirin nexweşxaneyê, piştî sê rojan nûçegihan Hogir Mihemed û piştî zêdeyî du mehan hûçegihan Rizgar Adanmiş ji ber birînên xwe şehîd bûn.

Di pêvajoya berxwedana Serêkanîyê de jî nûçegihanên ANHA`yê lê kêleka berxwedanê her li enîyên pêş bûn. Roja 13`ê cotmeha sala 2019`an karewanekî welatîyên sivîl berê xwe dan bajarê Serêkanîyê da ku piştgirîya berxwedana gelê bajêr bikin, dema ku karwan gihişt bajêr ji alîyê artêşa Tirk û çeteyan ve hate bombebarankirin, di encamê de 11 sivîlan jîyana xwe ji dest dan yek ji wan jî nûçegihanê ANHA`yê Seed Mihemed bû.

Her wiha di pêvjoya berxwedanê de gelek caran nûçegihanên ajansê ku li cihê bûyerê bûn ji alîyê artêşa Tirkîyê yan komên çeteyan ve hatin gule-

dike ku li hemberî desthilatdarîyê di qada ragihandinê de tevlî têkoşîna ji nû ve avakirina civaka exlaqî û polîtîk bibe. ANHA bawerîya xwe pê tîne ku yek ji rêyên bingehîn ên jîyanîbûna pîvan û rêgezên jîyanê û sekna kesayeta civaka exlaqî û polîtîk ku hemû reng, deng û bawerî cihê xwe tê de digirin jî têkoşîna di warê çapemenîyê de ye. Amûrên çapemenîyê êdî wekî hêza yekemîn ku dikarin desthilatdarîyan hilweşînin û ava bikin, di heman demê xwe bigihînin bi milyonan kesan, lewre jî ANHA di wê bawerîyê de ye ku çapemenî ji bo avakirina civaka demokratîk hêmanek bingehîn e. Di vê çarçoveyê de hedef dike ku di serî de gelê kurd, ji bo danasîn û pêşketina nasname, ziman, çand û dîrok gelên bindest, yên têne înkarkirin û bi komkujîyên fîzîkî û çandî re rû bi rû dimînin di qada çapemenîyê de têbikoşe."

Piştî damezrandina ANHA`yê ta niha nêzî 7 salan derbas bûn, di nava van salan de, ji bo pêkanîna armancên xwe yên di rêziknameyê de hatine dîyar kirin, li herêmên Rojava û bakurê Sûrîyê tora xwe ya nûçegihanan ava kir û li gelek bajar û navçeyan navendên xwe vekirin.

ANHA ji wê çaxê de bi 6 zimanan (Kurdî, Erebî, Tirkî, Ingilîzî, Ispanî û Rûsî) li ser malpera xwe weşanê dike, nûçe, rapor û dosyayên bi wêne û dîmen amade dike.

Ajansa nûçeyan ji bilî şopandina bûyeran û ragihandina wan, erkên din jî hilgirtibûn ser xwe. Di hêla sîyasî de civaka herêmê ji xwe re rêyeke têkoşînê hilbijartibû, ji alîyê gelek derdoran ve ev rêbaz dihate reşkirin, carnan weke ku Kurd li dijî şoreşa Sûrîyê ne, carnan jî weke ku Kurd parçebûna welêt dixwazin dihatin tewanbarkirin, lewma ANHA`yê bi rêya nûçe, rapor, dosya, şîrove, lêkolîn û analîzan hewl da ku bibe dengê vê civakê û rêya sîyasî ya ku hilbijartîye ji cîhanê re ragihîne.

Di hêla rêveberîyê de jî civaka herêmê hewl da ku xwe birêve bibe, rêveberîya xwe ragihandin û di hêlên civakî, aborî, xizmetguzarî, tenduristî û perwerdeyê de sazî ava kirin, ANHA`yê jî di vê pêvajoyê de kar û barên rêveberîyê şopandin, cihên ku kurt û kêmasî hene rexne kirin û ronî avêt ser û ji bo rêveberî pêşbikeve bi rêya ragihandinê piştgirî kir.

Li kêleka berxwedanê di nava berxwedanê de bû:

Alîyekî pir girîng jî ew bû ku şoreşa gelê Rojava û bakurê Sûrîyê di pêvajoyeke berxwedana çekdarî ya bi rumet re derbas bû û hîna jî dewam dike.

Ji destpêka şoreşê ve, herêmên Rojava rastî êrîşa komên çekdar yên girêdayî hin hêzên derve hatin, civaka herêmê li hember van êrîşan ji destpêkê ve hêzên xwe yên çekdarî ava kirin û li seranserî herêmê bê navber berxwedaneke parastinê ya dem dirêj destpêkir.

Hêzên ku êrîş dikirin bi piştgirîya hêzên derve yên mîna Tirkîyê dihatin herêmê, her wiha ji alîyê ragihandina

karanîn, rastîya bûyeran tê veşartin û nixumandin, di nava civakê de dijberî, nakokî û hestên şer gur û geş dike. Civaka ku dişewite jî bê ziman û deng hatîye hiştin.

Li Rojava ragihandin dengê civaka rêya sêyemîn e:

Di pêvajoya şerê Sûrîyê de Kurdên li Rojava beramberî bijarteyên aloz bûn, li alîyekî ew ne ji alîyê rejîmê, ne jî ji alîyê hêzên dijber ve weke beşek gelê Sûrîyê yê xwedî nasnameya cuda nayên dîtin. Her du alî bêyê ku nasnameya Kurdan bipejirînin û bibînin û nas bikin, dixwestin wan wekî ardûyê şerê desthilatdaryê bikar bînin. Li hember vê rewşê Kurdan û gelên din ên herêmê ji xwe re rêya sêyemîn hilbijartin. Ji bo ev bijarte bibe ya civakê pêwîstî bi ragihandina civakê hebû, li ser vê pêdivîyê li Rojava tevgereke ragihandinê bi giranî û bi gavên biçûk destpê kir. Bêguman wekî tevgera giştî ya gelê Kurd, tevgera ragihandinê jî beramberî gelek zehmetî û dijberîyan rû bi rû mabû.

Ragihandina rêya sêyemîn hewl da ku li hundir bibe dengê gelê Kurd û hemû gelên herêmê ku beşek in ji gelên Sûrîyê, xwedî piroje û helwestin û dengekî cuda û bihêz in. Di vê der barê de bi navê civakê atmosfereke jîyana hevbeş a nîjad, netewe û çandên cihêreng da avakirin, ta radeyekê pirsên girîng yên civakê anîne rojevê û gotûbêj kirin. Her wiha di hêla agahdarkirin û nûçedayinê de jî hewl da ku dengê civaka vê herêmê bilind bike. Lewma civaka herêmê di bin sîwan û desthilata ragihandina alîyên dijber û dijminên derve de nema, gelên herêmê jî xwe dîtin ku xwedî deng in û dikarin proje û helwestên xwe ragihînin û biparêzin. Her wisa li hember hewldanên reşkirinê jî rastîya xwe ragihandin.

Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA):

Di pêvajoya şerê li Sûrîyê û têkoşna gelê Kurd li Rojava, Ajansa Nûçeyan a Hawarê weke yekemîn ajansa Kurdî li Rojava dest bi xebatên xwe kir.

Li ser malpera xwe ANHA xwe wiha pênase dike: Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) di 1'ê Adara sala 2013'an de ji alîyê çend rojnamevanên kurd ve li Belçîkayê hatîye avakirin. Lê li rex Ewropayê, di serî de li Rojavayê Kurdistanê, li perçeyên din ên Kurdistanê û welatên Rojhilata Navîn bûyer û geşedanên diqewimin, radigihîne.

Der barê regez û armancên ajansê de jî di rêziknameya ANHA`yê de wiha hatîye nivîsîn:

"Di serdema îroyîn a ku zihnîyeta desthilatdar bi amûrên teknolojîyê yên pêşketî dezenformasyoneke gelekî mezin dide meşandin, qirêjîya agahîyan di afirîne û civakê bêpar dihêle, piralî, pirdengî û pir rengîyê tune dike, her wiha hewl dide ku hemû sazî û dezgehên çapemenîyê jî ji bo vê yekê bikar bîne de, ANHA armanc dike ku agahîyên rast ji çavkanîya bingehîn bigire û ragihîne civakê.

Di vê çarçoveyê de ANHA hedef

bê deng hiştîye. Eger ji bo xizmeta berjewendî û ideolojîya wan de be, cîhana desthilatdar dikare dengê girîyê zarokekî sêwî li devereke cîhanê pir berz bike, bighîne hemû alîyên cîhanê û bi milyonan kesan jî pêre bigirîyêne, lê eger ne li gorî wan berjwendîyan be, qêrîn, wêne û dîmenên bi dehan zarokên ku li ber çavan têne şewitandin jî, nayên dîtin, nayên bîhîstin û nayên gotin. Mixabin em nifşê cîhaneke wiha ne…!!

Bijarteya civakan her berxwedan e:

Her ku civak rastî zordarî û neheqîyê hatîye, li dijî wê zordarîyê berê xwe daye şêweyekî berxwedanê. Dema ku civak hatîye birçîkirin û nanê wê ahtîye desteserkirin, ji bo nanê xwe li ber xwe daye û bi têkoşînê nanê xwe ji destê zordaran standîye, her weha dema ku azadîya wî hatîye destgîrkirin, an jî mafên wî yên jîyanê hatine destgîrkirin, ji bo azadîya xwe û ji bo parastina jîyana xwe berê xwe daye berxwedanê û gelek şêwe û awayên berxwedanê afirandine.

Di mijara ragihandinê de jê rewş weha ye. Îro deng û zimanê civakan hatîye destgîrkirin û biryar û vîna civakê jê hatîye standin, ango mirovahîya hejar û bindest bê ziman û deng û helwest hatîye hişitin, lewma bêguman dê civak li hember vê rewşê gelek şêweyên berxwedanê biafirîne da bibe xwedî ragihandina xwe ya civakî.

Li Sûrîyê desthilata çaremîn di destê desthilatê de bû:

Li welatê me Sûrîyê, ji ber ku welat ji alîyê rêveberîyeke navendî hişk, di bin sîya yek partîyê de dihate birêvebirin, ragihandin jî, ku desthilata çaremîn e, bi temamî di destê rejîma desthilatdar de bû, lewma çanda ku ragihandin a civakê ye û dengê civakê ye li welêt pêş neket, her weha sazîya medyayê bi gştî nebû alava şênkirin û geşkirina nirxên demokrasîyê û hevgihîn û dîyalogê. Di vê rewşê de civak ji pirsgirêkên sereke yên welêt hate dûrxistin. Pirsên netewan, etnîk û cudahîyên nîjadî, çandî û olî li welêt bi rêya ragihandinê ne ketin rojeva civakê û nehatin gotûbêj kirin, lewma ew pirsgirêk her wekî volkanekê di laşê çivaka Sûrîyê de dikelî û her kêlî divîyabû biteqe, ji xwe dawîyê teqîya û ta niha jî agirê wê her ku diçe belav û gur dibe û di serî de civaka hejar dide ber xwe.

Kambaxîya mezin piştî sala 2011`an pêk hat, çaxê ku li Sûrîyê li şûna şoreşê şerê navxweyî destpê kir, di pêvajoya vî şerê kambax de civak ne tenê bi çek, bombe û agirê her du alîyan şewitî, lê ragihandina her du alîyan jî şweitî. Ragihandin di destê alîyên şer de weke alaveke tundî û rewakirina tudnîyê û kuştinê hate bi-

Li kêleka berxwedanê di nava berxwedanê de bû Ajansa Nûçeyan a Hawarê -ANHA

ANHA bawerîya xwe pê tîne ku yek ji rêyên bingehîn ên jîyanîbûna pîvan û rêgezên jîyanê û sekna kesayeta civaka exlaqî û polîtîk ku hemû reng, deng û bawerî cihê xwe tê de digirin jî têkoşîna di warê çapemenîyê de ye



Kemal Necim

Pir dîyar e ku rewşa cîhana me ne aram e, mirovahî jî êş û azarên giran dikşîne. di pêvajoyên dîrokê de her tim çînên jêr û civakên hejar bûne alava pêkanîna daxwaz, ferman û çavnebarîya desthilatdaran, lê rewşa îroyîn dibe ku ji hemû pêvajoyên dîrokê cudatir be, tê dîtin ku çawa hêzên desthilatdar ên cîhanê bi saya hêza pere û aborîyê, hêza tekonlogîya çekirinê û hêza alavên ragihandinê, hov û har bûye. Li alîyê din jî civaka mirovan, bindest û hejaran bê deng, bê biryar û bê ziman hatîye hiştin. Di roja îroyîn de civaka mirovahîyê di guhên ker de diqîre, dîmenên kuştin, mirin û şewitandina mirovan êdî mîna ku li pêşberî çavên kor in, nayên dîtin, ne jî wijdanan dilivîne.

Gelo çima? Ji ber ku cîhana desthilatdar destên xwe danîye ser çav, guh û zimanê civaka mirovan, ango destên xwe danîye ser sazîya ragihandinê, civak jî bê ziman, bê parastin û

de beşa ragihandinê were pêşxistin. Li gor zagonên navdewletî beş, matryal û hemû pêwîstîyên wê werin peydakirin. Bi vê yekê em ê karibin ragihandina xwe ya ku wekî berhemekî şoreşê derkete holê, hîn zindîtir bikin. Bi vî awayî wê hemû kêmasîyên heyî werin derbaskirin. Di heman demê de derfetên hîn baştir ji xebatkarên ragihandinê re werin vekirin. Her çendî ragihandian dîtbarî zêde li ber çavan tê dîtin, lê ev ji bo beşên din ên ragihandinê jî derbasdar e.

Yenî tu kes nikare bêje ku rola ragihandiana azad di nava şoreşa Rojava de biçûk bû, lê ya dikare were gotin, xebatên çapemenîyê heta radeyeke pir baş gavên mezin li gor derfetên hayî avêtin. Ew gav gihiştin astеke pir bilind, lê niha nikarin ji pêşketinên mezin ku di şoreşa me de hatin avêtin re bibin bersiv. Ji ber wê jî pêwîstî bi gavavêtinên hîn mezintir û pêşketîtir heye.

Em jî di wê bawerîyê de ne ku şoreşgerên Bakurê Sûrîyê yên ji tunebûnê hebûn afirandin û gavên pir mezin pêk anîn, wê bi hêsanî karibin gavên hatine avêtin, pêş de bibin. Em niha vê gotinê bi awayekî gelemperî dibêjin. Ev wê di xebatên ragihandinê de jî derbasdar be. Ji bo gavên mezin werin avêtin, pêwîstî bi sekna hevbeş a hemû xebatkarên ragihandinê heye. Bi taybetî jî kesên ji destpêkê de kedek mezin dan û hîn jî didin. Di heman demê de divê rayedar, berpirs û hemû civaka me ku sazîyên me yên ragihandinê rexne dikin, bizanibin rexneyên wan jî hêmanekî bingehîn e ji bo pêşxistina vê xebatê. Lê gelek kes gavên mezin ku di ragihandina Bakurê Sûrîyê de hatine avêtin, ji nedîtî ve hesab dikin. Ev gavên bi vî rengî şaştîyek pir mezin e. Wekî me berê jî got gavên mezin hatine avêtin, ev rast e, lê niha pêwîstî bi gavên hîn mezintir û pêşketîtir heye.

Bi vî awayî jî em ê karibin bi hev re bikevin rêza ragihandina herî pêşketî li cîhanê. Ji xwe ji vê re jî demek dirêj divê, ji ber xebata ragihandinê xebateke girêdayî bîrdozî, fikir û bawerîya civakê ye. Di heman demê de ew berê civakê a ber bi kîjan alîyî de nîşan dide. Ez jî di wê bawerîyê de me ku ne pir nêzîk be jî, lê wê rojek were, ragihandina Rojava wê ji hemû herêma Rojhilata Navîn re mînak be. Wê ciwan ji hemû alîyên Rojhilata Navîn werin da ku di vê herêmê de fêrî xebatên ragihandinê bibin. Dibe hin kes niha bêjin, ev xeyal e û gengaz e pêk were. Ez ji wan re dibêjin: Çawa piştî sala 2011'an ragihandina me ji nav çeperên dijminan derket û roj li pey rojê gavên herî mezin avêtin. Tevî hemû kelem û kêmasîyan jî ev dar her ku diçe mezin dibe û ne mumkine ji vir ve careke din gav paş de werin avêtin. Berevajî vê yekê gavên hîn mezintir ji bo xurtkirina zemîna ragihandinê li herêmê têne avêtin. Ev ne xeyal e, lê belê rastîyeke em di nav de dijîn.

dighandin navenda kenalê.

Ev rewş heta destpêka sala 2011'an dewam kir. Di wê demê de heta mirov çend sanî dîmen bigihanda navendê pêwîstî bi çend saetên xebatê hebû. bi destpêka şoreşa Rojava re jî rewş heta demekê weha dewam kir. Ji xwe wê demê Roj tv hate girtin, lê Stêrk tv û hin kenalên din dest bi weşanê kiribûn. Dema şoreşa gel li Sûrîyê dest pê kir, televizyonên Kurdî roleke mezin lîstin. Ji xwe internêt jî hate pêşxistin, îcar bername li hindirê welat dihatin çêkirin û di rêya internêtê re dihatin şandin. Di 21'ê mijdara sala 2012'an de gavek din a mezin di dîroka ragihandina Rojavayê Kurdistanê de hate avêtin. Yekem televizyona ezmanî ya taybet bi Rojavayê Kurdistanê û tevahî Bakurê Sûrîyê RONAHÎ TV dest bi weşanê kir. Weşana Ronahîyê destpêkê ji Ewropa hate kirin. Dîmen, nûçe, bername û herwekî din li vir dihatin çêkirin, bi rêya internêtê dihatin şandin. Paşê û bi demê re weşana Ronahî tv êdî ji bajarê Qamişlo hate meşandin. Ev ji hemû ciwanên Rojava û tevahî Bakur û Rojhilatê Sûrîyê re bû şensekî mezin.

Ronahî tv û Ajansa Hewarê (ANHA) dema ji vir bi derfetên herî kêm dest bi weşanê kirin. Ne tenê rola sazîyeke ragîhandinê lîstin, lê belê di heman demê de ji ciwanên herêmê re bû derfetek û wekî zanîngehekê tevgerîyan. Bi sedan ciwanên herêmê di wan sazîyan de dest bi xebatên çapemenîyê kirin, fêrbûn û paşê berê xwe dan sazîyên din. Hin ji wan niha di sazîyên ragîhandinê yên kurdistanî û cîhanî de jî dixebitin. Bi demê re sazîyên ragihandinê jî zêde bûn, gelek televizyon êdî ji vir dest bi weşanê kirin. Bi sedan rojnamavan di herêmê de çêbûn. Ev xebat hîn jî roj li pey rojê pêş dikeve. Di van çend rêzên me nivîsandin, me behsa pêşketin û gavên di qada ragihandinê de û bi taybetî di alîyê dîtbarî de kir. Lê em ê tu carî nikaribin bi hêsanî behsa zehmetî û rewşa avakirina vê xebatê bikin. BI rastî ji salên destpêkê yên şoreşê û heta roja îro kedek pir mezin hate dayîn û hîn jî tê dayîn. Gelek ciwanên herêmê di vê xebatê de şehîd jî bûn.

Em li vir ne di warê pesindayînê de weha dibêjin, lê ev rastîyeke tu kes nikare veşêre. Di heman demê de jî nayê wê meneyê ku kêmasî û rexneyên li ragihandina Rojava têne kirin, ne rast in. Bêguman rewşa ku ragihandina Rojava tê de hate avakirin, rewşa şoreşê bû, hemû xebatên hatin meşandin li gor pêwîstîyên şoreşê dihatin pêkanîn. Ev jî dibû sedema ku kêmasî û şaştîyên pir mezin di wî warî de derkevin. Ew şaştî di gelek alîyan de hîn jî dewam dike.

Di nerîna min de hewaya şoreşê ji bo afirandinê gavên mezin bi xwe re tîne. Şoreşa gel li herêmê di gelek alîyên xwe de pêşketinên pir mezin pêk anîn. Bi taybetî di alîyên leşkerî û niha yê dîplomasî de jî ev pêk tên. Di alîyê ragihandinê de jî dibe ev yek pêk were. Dê çawa pêk were? Ev pirsek pir giring e, li gor min divê gava yekem were avêtin, di zanîngehê

■ Ronahî tv

Tirk, rêjîma Sûrîyê û hemû dijminên şoreşê hatin aşkerekirin. Êdî gel nema derewên wan bawer dikir. ragihandina azad wekî çavkanîya sereke ya agahîyan wergirt. Di wê demê de xebatkarên ragihandinê jî pir kêm bûn. Lê di hemû qadên ragihandinê de gav dihatin avêtin. Ji ajansan, heta radyo û televizyonan xebat roj bi roj dihat pêşxistin. Di nava 9 salên şoreşê de ragihandina azad di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê de gavên pir mezin avêtin. Gavên herî mezin jî di xebatên dîtbarî de pêk hatin.

Rojava û ragihandina dîtbarî:

Me berîya niha jî behsa rewşa xebatên ragihandinê di dema rêjîmê de kir. Her çendî xebat bi dizî bû jî, lê mirov nikare xebatên dihatin kirin ji ne dîtî ve hesab bike. di wê demê de jêrzemîna xebatên ragihandinê û bi taybetî di alîyê dîtbarî de hate danîn. Di sala 1995'an dema yekem televizyona Kurdistanî Med tv ji Belcîka dest bi weşanê kir, li Rojava jî baş dihat şopandin. Di wê demê de bi awayekî veşartî bername dihatin çêkirin, nûçe dihatin parvekirin. Bi pêşketina weşana ezmanî ya Kurdistanê re bi derketina kenalên din wekî Medya tv xebat hîn zêdetir hate pêşxistin. Bi derketina televizyona Roj tv re Serhildana 12'ê Adarê hatibû destpêkirin. Roj tv roleke pir mezin di veguhestina dengê gel ji raya gişti re, lîst. Ew bû çavkanîya herêmê, li herêmê nûçegîhan hatin belavkirin. Ew nûçegîhan ne bi navê xwe yê rast kar dikirin. Tenê agahî û dîmen

Ji xwe bêyî tiştekî hemû sazîyên dihatin vekirin, tenê sazîyên rêjîmê bûn û ji alîyê partîya Baas ve dihatin birêveberin. Ev ji xebatên nivîskî bigre û heta xebatên radyo û dîdbarî jî derbasdar bû. Wekî din jî bi navê opozisyonê hin xebatên bi dizî bi awayekî pir sînordar dihatin kirin. Yanî bi gotinek din mirov dikare bêje, xebatên ragihandinê di nava çar dîwarên ji batonê û bê derî hatibû qeydkirin.

Li Rojava hinekî partîyên Kurdî bi awayekî veşartî tekoşîn dikirin, ev xebata wan xebatên çapemenîyê jî digirt nava xwe. Partîyên sîyasî yên Kurd bi hin kovaran sînordar bû, her partîyekê jî bi dizî rojnameya xwe ya heftane çap dikir, ew jî bi destan û bi dizî dihate belavkirin. Gelek caran rayedarên wan partîyan çapxane peyda nedikirin ji bo kovar an jî rojnameya xwe çap bikin. Kesên ev xebat dikirin jî dihatin girtin û bi salan zindan li wan dihate birîn. Ev rewş piştî Serhildana Qamişlo ya 12'ê Adara sala 2004'an, hîn girantir bû. Zor û zehmetî di hemû alîyan de li ser Kurdan zêde bû, ji xwe rêjîmê bi destekî ji hesin destê xwe da ser çapemenîya Kurdî. Di wê demê de internêt jî dest pê kiribû û sal li pey salê ev xebata veşartî dihat pêşxistin. Ev rewş heta şoreşa gel a Sûrîyê ku di sala 2011'an de destpê kir dewam kir.

Şoreşa Gelê Sûrîyê destpê kir

Piştî şoreşa gelê Sûrîyê dest pê kir, rêjîm qelis bû, ji xwe bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re bajarên Rojavayê Kurdistanê ji rêjîmê hatin rizgarkirin. Xebatên ragihandinê û bi teybatî bi pêşketina teknoljîyê re gelekî pêş ket, gavên mezin hatin avêtin. Her kes êdî dikarî bi telefonên xwe dîmen û wêne bigrin û di rêya malperên civakî re belav bikin. Ev pêşketina teknîkî, pêşketinên din jî bi xwe re anîn. Êdî hêzên desthildar nema dikarin kiryarên xwe veşêrin, dîmen û wêne ji hemû bajarên Sûrîyayê derdiketin. Gelek kovar, rojname, radyo û tv dest bi weşanê kirin. Hin ji wan di hundirê welat de û hin jî ji derve. Ji xwe dijminên gel berê xwedî hêzek mezin a ragihandinê bûn. Hemû alavên xwe li dijî şoreşa gel û ji bo bandorê li ser gelên herêmê bikin, bikar anîn. Îcar nûçeyên ji rastîyê dûr weşandin, dîmenên kevin li ser navê nû ye belav kirin. Herî zêde jî dewleta Tirk di vî alî de ket liv û tevgerê da ku şoreşa gelên Rojavayê Kurdistanê rawestîne.

Di rêya ragihandinên xwe re hiştin gel wekî wan tevbigere, mînak meşên li dijî rêjîmê ji ber Mizgeftan dihatin destpêkirin. Diruşme û navên wan dihatin dîyarkirin. Hemû jî di çarçoveya xizmeta xeta islama sîyasî û Ixwan El-Muslimîn de pêk dihat. Bi gotinek din, mirov dikare bibêje ku hemû hêza xwe bikaranîn da ku şoreşa gel di xizmeta berjewendîyên xwe yên desthiltdarîyê de bikar bînin.

Di vir de ragihandina azad tevî ne xwedî tecrubeyeke mezin bû û nû hatibû destpêkirin. Rolek pir mezin di dîyarkirina rastîyê de lîst. Bi saya xebatên ragihandinê pilanên dewleta

Ragihandina di şoreşê de mezin dibe

Piştî sala 2011'an ragihandina me ji nav çeperên dijminan derket û roj li pey rojê gavên herî mezin avêtin..

Dilyar Cezîrî

Berîya em behsa pêşketinên di qada çapemenîyê de ku di encama şoreşa Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûrîyê de hatin bi destxistin bikin, giringe em behsa rewşa xebatên çapemenîyê berîya şoreşê, ango berîya sala 2011'an bibîr bînin û behsa zehmetîyên wê demê bikin. Di wê demê de ne tenê li Rojava û Bakur-Rojhilatê Sûrîyê, lê belê li tevahî Sûrîyê xebatên çapemenîyê ji civakê re girtîbû û tenê bi partîya Baas ve sînordar bû. Tu sazîyên çapemenîyê yên li derveyî sazîyên rêjîmê nîn bûn. Di zanîngehan de jî di beşê ragihandinê de tu kes ne dihat qebûlkirin, ên dihatin qebûlkirin jî nedikarîn li welêt di vê xebatê de bixebitin. JI lewma ciwanên zanîngeh diqedandin jî derdiketin derveyî welat û li wir dixebitîn. Ên li vir diman jî rastî şertekî dihatin. Ew şert jî divîyabû ew kes endamê partîya Bass baya. Ne tenê weha dema xwendina xwe diqedand ne dikarî bi hêsanî di sazîyeke ragîhandinê ya rêjîmê de bixebite. Heger ew şens bi destxistiba jî divyabû pir nêzî berpirsên rêjîmê ba û li gorî berjewendîyên wan ên desthiladarî tevbigerîya. Yenî divyabû bibe xizmetkarê wan.

hmetîyên karekî wiha hêşta jî hene.

2. Sedema din ew meqbûlîyet an jî bawerîya hemû çînên civakê bi rojaneme û kovarên kurdî bû ku bi zimanekî sade û rewan dihatin nivîsîn. Ev jî bibû sedem ku kesên kêmxwende jî bikarîbin wan bixwînin û heta çîna civakê ya ku piranî nexwende bûn bi rêya wan rojnameyan qet nebe hestên xwe yên kurdînîyê bi germîyeke welathezîyê geştir û baştir jî diparastin. Çavê gel li rêberên olî, sîyasî û çîna rewşenbîr bû ka kîjan rêbaza xebatê li ber wan datîin. Kesekî rewşembîr û zana dikarî di qehwexaneyekê de tenê di çend deqeyan de dehan agahîyan bi rêya xwendina rojnameyê bide kesên nexwende jî û peyamên rêxistin, rêber an jî zanayekî di nava civakê de belav bike. Wiha pareke mezin a xelkê ji naveroka rojnameyê agahî distandin û hêdî-hêdî hesta sîyasî û civakî ya gel bilind dibû.

Pêvajo li pey hev derbas bûn û tevî hemû zextên sîyasî li Kurdistanê dewletên totalîter û dijberên ragehandina kurdî jî nekarîn rê li ber geşkirin û zêdebûna rojameyên kurdî bigirin.

Di guherandinên sîyasî û civakî de rola ragehandinê roleke sereke û pir erênî bûye. Ji ber wê jî carnan hinek kesên otorîter nîvrûpelê rojanemeyekê ku di hişyarkirina xelkê de xwedî rol bûye, ji hemû çekên li jêr kontrola artêşa dijminê xwe metirsîdartir dîtine. Kesên wiha zû pêhesîyane ku hişîyarbûna şiûra sîyasî ya gel peywendîyeke rasterast bi azadî, cudahî, hejmar û tîraja rojnameyên belavbûyî ve heye. Di vê derbarê de guherandinên gîştî û mezin li welatên Fransa, Almanîya û Rûsya bi van sedeman ve girêdayî ne.

Di Kurdistana mezin de li kêleka xebata gel û partîyên sîyasî karê rojnamevanî û ragehandinê kêm-zêde carnan zêdetir ji şerê çekdarî dewletên dagîrker xistine hewldanên bêdawî ku zû bi êrîşên leşkerî rê li ber pêngavên wiha pêşketinxwazane bigirin. Mînaka vê yekê vekirina yekemîn xwendingeha modern li bajarê Xoy di serdema serhildana Simkoyê Şikakî de li sala 1916'an an jî di 1922'an belavkirina yekemîn rojanameya Kurdî ya bi navê "KURD" e. Raportên dewleta Îranê yên wê demê li dijî hevkarîya Rûsîya û tirsa Tirkên Ciwan ji van çalakîyên me bi gelek peyamên dîrokî dihesîne. Lê ya girîng ew bû, ku di wê serdemê de pêngaveke pir giranbûha ji hêla Simko, Ebdulrezaq Bedirxan, Cemaledîn Hekarî û Mihemed Turcanîzade ve hate avêtin ku dîrok nikare ji bîr bike. Armancên wan karên çê pir pîroz û dûrbînane bûn.

Hewldanên mamosta Cegerxwîn û Mîr Celadet Bedrixan ne tenê dewleta Sûrîyê, belkî di alîyê din yê sînor de jî dewleta Tirkîyê li dijî wan hewldanên rewşenbîrîyê sekinîne.

Herî dawîyê dixwazim bêjim ku azadîya bîr û raman, hebûna ragehandineke azad û xwedî şax û çiqlên berfireh xwedîk an jî awêneya sîstemeke demokratîk li her welatekî ne.

Hîvîdar im partîyên me yên sîyasî ji vir û şûn de jî alahelgirên vê rêbaza pîroz li çar alîyên welatê xwe yê dagîrkirî bin.

zindî dikin, ku di dema du-sê salan de ronesanseke fikirî, sîyasî û ragehandinê di nava sînorên bertesk yên dewleta xwe de kirin mîratekî dîrokî û bêmirin ji me re.

Êdî di sedsala teknojîyê de bi hebûna ewqas torên civakî, ajans, malper, TV, kovar, rojname û sedan derfetên din re ku rojane têne guherandin re agahîyên gel çûne jor û di mijarên zanistî, wêjeyî, aborî, sîyasî, bawerî û dîrokî de civak hişyar bûye. Kes nikare di bin banê derewan de xwe veşêre û hebûna kurdan înkar bike. Rola ragehandina Rojava di eşkerekirina hovîtîyên Daîş û çeteyên girêdayî dewleta Tirkîyê û reaksyona hêzên navnetewî li dijî wan pir zêde bûye. Gelo ev biserê xwe şoreş nîne?

Bandora rojname û kovaran:

Di roja me ya îro de tevî hemû pêşketinên qada ragehandinê rojname hêşta jî xwedî rol û sûdê herî zêde di warê bilindkirina asta rewşenbîrya civakê de ne. Di şoreşa li dijî nezanîn, hejarîya fikirî û çandî an jî bêxeberî ya ji rewşa welat û cîhanê rojname bi awayê çapkirî zêdetirîn û erzantirîn amaraz e. Di civakên pêşketî û ew ên di halê pêşketinê de hêşta jî belavkirin û xwendina rojanemeyê nîşana rewşenbîrî, fêmkirina kûr û bilindbûna hesta sîyasî û civakî ye. Ji min re xwendina rojnamê hingî xwedî tameke taybetî û tije hez e ku di nava du destên min de ye û li gor heza xwe kîjan mijara ku jê hez dikim, dixwînim.

Li welatê me Kurdistanê, çapkirina rojnameyê xwedî çend pêvajoyên girîng û dîrokî ye, ku ji sala 1898'an û şûn de li Qahîrê dest pê dike heya tê Urmîyê û di serdema serhildana Simkoyê Şikakî, Celadet Bedirxan û Ronahî, Komara Kurdistan a 1946'an, çêbûna komele û rêxistinên sîyasî yên kurdan li Istembol, Silêmanî, Kirmaşan, Şam û Amedê didome. Li ser wan pêvajoyan biqasî ku pêdivî be agahî hene û li vir ez tiştekî nanivîsim.

Rojname ji ber taybetmendîyên weke erzanbûn, zêdebûn, awayê nivîsîn, vegotina rast û belavkirina nûçeyên curbecur, sadebûna zimanê nivîsîn û rengînîya gotarên tê de cih digirin dikarin bala hejmareke zêde ya hemû çînên civakê ber bi xwe ve bikişîne an jî bêxe bin bandora zanîyarîyên di nava rûpelên xwe de. Her wiha di vegûharandina agahî û zanîyarîyên rojê de hevkarîyeke mezin didine civakê. Agahîyên ku piralî, berfireh û rengîn in. Di salên berê de ji ber du sedemên jêr rojname bêtir ji roja îro xwedî bandor bûn:

1. Di destpêka sedsala bihûrî heya salên 1990'an tenê rojname weke amrazekî gîştî û ragehandineke komî li welatan dihate hesibandin ku nûçeyên rast li dor rewşa navxweyî û derve ya welat di nava xelkê de belav dikirin. Tevî ku wan salan carnan di anîn û birina rojanameyan an jî kovarên heftane û mehane de derengîya çend rojan jî hebû, lê pêşkeftineke baş di rastî û dema nûçegehandinê de jî hebû ku piştre ew kêmasî jî kêm û kêmtir bûn. Elbete li Îran û Tirkîyê ze-

بەڕێوەبەرایەتی چاپەمەنی هاوبەش

کوردستان

بلاوکەرەوەی بیری حزبی دیموکراتی کوردستان

کوردستان لە لایەن هەیئەتی تحریریەوە دەردەچێ

ئابونەمان
بە کاڵە ٣٠٠ ڕیال
شەش مانگە ١٦٠ ڕیال
دانەی ٢ ڕیال

ژمارەی ١٠ ساڵی یەکەم دوشەممو ١٥ ڕێبەندان ١٣٢٤ ٤- فیوریە ١٩٤٦

جێژنی سەربەخۆیی واستقلالی کوردستان

کۆکەردەوە سید محمدی حمیدی

یا

* دەرەوشینی استیرەی خۆشبژی سەرۆک و کوردو کوردستان بەختی کوردان *

ڕۆژی ٢٨ ی مانگی بەفرانبار (دیماە) ی ١٣٢٤ شمسی هەیئەتانی مدیریەی هەموکەکانی حزبی دیموکراتی کوردستان وئویەڕانی قابل وعشایرو تەواوی طبقات لەمالک وغیرەمالک

کان خریك بو پاشان بە فراهم کردنی زمینەوایجاد واستعدادی کومەل لە ربی داناتی فرقەی دیموکراتی اقدامی فەرمو ای کوردستانی مەزن.

هومیدی سەر بەستی لە ڕەگوشارەکی واندا دەگەری ونوختەی بە کەبەتی اتصال هەموان وجودی مسعودی رهبەری گەورەمە. لەم ئاڵەدا بزوکی پیشوای خۆشەویستلە نیو سلامی نظامی و چەپك

■ **Rojnameya KURDISTAN- كوردستان - Hejmara (10) - 4 sibata 1946 -di dema komara kurdistanê de.**

bînim bîra çîna rewşenbîr, sazîyên ragehandin û bitaybetî jî rayedarên desthilata Rojavayê Kurdistanê ew e ku:

1. Hîvîdarim bi dilekî fireh û mejîyekî xwedî ramanên gerdûnî bi ragehandinê re xwedî danûstandinên lojîk bin. Derîyê wan li ber ragehandina kurdî û cihanê vekirî be û rihet bikarin bên û biçin.

2. Bi rêgirtina li ber gendelîyê di qada aborî de nehêlin qet û qet dengê ragehandinê bê fetisandin.

3. Di vekirina çapxane û sazîyên ragehandinê de karekî bikin ku dengê şoreşa Rojava ya demokratîk û bêmînak li Rojhilata Navîn li her dera cîhanê belav bibe.

4. Teşwîqa hemû çînên civakê ji bo xwendinê bi zimanê xwe yê zikmakî bikin.

5. Bi bihaya herî erzan firotina rojname û pirtûkan ku dikare bi sobsîdên desthilata heyî li wir sal ji salê zêdetir xwendin pêş bikeve.

6. Bi çavekî bilind liberçavgirtina azadî û hurmeta pêsnûsê heta heger li dijî sîstema desthiltdar jî be bi mercekê ku di tevlîhevîyên asayêşa neteweyî de xwedî rol nebe.

7. Li dijî belavkirina derew, bîr û ramanên kevneşopîyane û fesada civakî ya hemû alî yasayên rêveberîya herêmê xwedî bandor bin.

8. Amadekirina hemû îmkanên weşandin û belavkirina pirtûk û rojnameyan bi kuvalîta herî baş û di dema herî kin de.

9. Kontroleke baş li ser rastnivîs, rêzman û rewannivîsîya gotar û nûçeyên ku têne belav kirin.

10. Tenê bi van rê û rêbazên tije tolerans û realostî re ye ku dengê meşrûyet û peyamên demokratîk ên şoreşa Rojava dikarin baştir bandora xwe li derdorê belav bikin.

Pêngavên ku şoreşa Rojava di qadên cuda ji hev de tenê di 7-8 salên bihûrî de avêtine bîra komara Kurdistan û ramanên Pêşewa Qazî Mihemed

em îro li bakurê Kurdistanê dibînin. Li wir heta partîyên sîyasî jî zêde nakevin pey faktura ziman û di xema wan de ye ka bandora rêzefîlmeke li ser civaka kurd çend alî û xwedî kîjan zîyanên mezin e!

Temenê „ragehandina azad“ li Rojavayê Kurdistanê sava ye û hê negehaye deh salan jî, lê hewldanên mezin ji bo avakirina sazîyên ragehandinê hebûne. Weşanxane û ajansên kurdî li rex kar û xebatên ji bo pewerdeya kurdî û vekirina akademîyên ku bi zimanê kurdî waneyên xwe pêşkêş dikin, pêngavên bingehîn in ku xwedî peyamên şoreşeke nû ne jî. Dema li Efrînê zarokên kurdan bi zimanê xwe yê zikmakî waneyên xwe dixwendin, dilê hakimên Enqerê hejîya. Hêzên paşverû li dijî vê yekê derketin û mixabin hinek caş-belaşên kurd jî dilgiran bûn ku êdî zimanê erebî weke zimanê perwerdê li Rojavayê Kurdistanê namîne.(!!)

Pêngavên bingehîn ji bo avakirina sîstemeke ragehandinê li her welatekê pilana yekê ya piranîya wan welatan bûye ku nû hatine avakirin. Ev vê yekê li Rojavayê Kurdistanê dibînin.

Xala balkêş li Rojava ew e ku berevajî bakurê Kurdistanê, kurdî zimanê rojane û yê jîyanê ye, lê kêmasîya ku carnan tê ber çavan ew e ku heta hinek rewşenbîrên naskirî jî postên facebook û Twitterên xwe bi zimanê erebî dinivîsin û belav dikin. Dema sedema vê yekê ji wan dipirsim, bersiv wiha ye:“ Bi zimanê kurdî kes naxwîne û kurte nivîsên me like nakin...(!!!!)“

Rola ragehandin û şoreşê li her welatekî bi hev ve girêdayî ye û ger lihevhatin di navbera wan de hebe dikarin ji bo gelek armancên pîroz bibine temamkerên hev jî. Ji serdema şoreşên kilasîk bigire heya şoreşên ku hinek ji yên berê moderntir û berfirehtir bûn, ragehandina kurdî bi xwîna dilê gelek rewşenbîrên weke Midhet Mêqad Bedirxan, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Dr. Nûrî Dêrsimî, Refîq Hilmî, Hêmin Mûkrîyanî, Mîr Celadet Bedirxan, Huznî Mûkrîyanî, Mûsa Anter, Enwer Mayî û bi dehan kesên din ve sal ji sala berê zêdetir geştir bûye. Em di cîhana îro ya ragehandina kurdî û tije sedan derfetên ji hev cuda de pir deyndarê keda wan kedkarên nemir in.

Li Rojava peywendîyek di navbera ragehandin û sîstema desthiltdar da hingî wateya xwe ya cewherî baştir eşker e dike dema ku li pey şehîdbûna hezaran şehîdan îro bi xwîna wan şitlên nû di kirasê sazîyên weke akademî, zanko, ajans û ragehandinê de hatine avakirin. Rijd li ser pêşxistina vê yekê jî xwedî peyamên xweş ji bo pêşerojê ne. Tevî hemû dorpêçên aborî, sîyasî û derfetên herî kêm êdî em dibînin ku dengê ragehandina Rojavayê Kurdistanê ji salên berê bilindtir e. Rengê nûçegehan û ajansên me li wir xwedî delalîyeke taybetî ye. Tê payînkirin ku TV´yên herêmî û esmanî zêdetir û dengê doza kurd a neteweyî-demokratîk bilindtir bikin.

Kovar û pirtûkên ku êdî li Rojava têne belav kirin, xwedî naveroke standard û dwelemendin.

Tişta ku li vir dimîne ez bêjim û

Rola ragehandinê, desthilat û şoreş

Rola ragehandin û şoreşê li her welatekî bi hev ve girêdayî ye û ger lihevhatin di navbera wan de hebe dikarin ji bo gelek armancên pîroz bibine temamkerên hev jî



Kakşar Oremar

Di dirêjahîya dîrokê de desthilatdar û rewşenbîr, otorîter û rojnamevan qet û qet dostên hev nebûne û ji hev jî hez nekirine. Berevajî wê, sîstemên demokratîk rukneke serkeftina xwe di hevkarîya bi ragehandina azad re didin dîyarkirin. Ji ber wê jî piştigîrî dane çîna rewşenbîr, sazîyên ragehandinê hatine vekirin û dema ew bi rêya rexnegiran hatine hişyarkirin êdî bi kuştin û zindanê re rû bi rû nemane, belkî heta hatine xelatkirin û rêyên tije derfetên mezin jî ji bo pêşketina wan hatine dabînkrin.

Rewşa îro ya li Sûrîyê û Rojavayê Kurdistanê, bakurê Kurdistan û Tirkîyê, Îran û Rojhilatê Kurdistanê, başûrê Kurdistan û Îraqê taboleyekî tije gotinên eşkere li ber çavên me datîne. Bi milyonan Kurd di nava sînorên sîyasî ên wan welatan de hene, lê hêşta jî nikarin weke ku daxwaza wan zimanê xwe bikarbînin. Tirajedîya herî mezin a asîmîlasyonê

rastîya Kurd re hebûn, di kategorîya gunehên xeter de hatin hesibandin. Her sê netew-dewlet jî –Tirk, Fars û netewa Ereb- ji çand û zimanê dewletê wêdetir li ser hemû hebûna wê helandin dûrkirin û kampanyayeke bi çand û zimanê serdest ve girêdan û bi dijwarî dan meşandin. Perwerdehîya bi zimanê zikmakî Kurdî jî tê de hemû dibistanên perwerdeheyê lê hatin qedexekirin. Lê derfet û îmkanên wî yê hebûnê dikaribûn li dibistanên neteweyên serdest modernîzm hînbibûya Kurd û Kurdî di her warî de li derveyî modernîzmê hate hiştin. Çapkirina pirtukan, rojname û mûzîkeke herî normal a Kurdî weke Kurdewarî hate hesibandin û di çerçoveya guneh de hate qebûlkirin. Lê wan bi xwe di zimanê xwe de netew-parêzîyeke Hîtler li dawîyê bihêlin dikirin. Ji teorîyên wan ên neteweyîn herî mezin gav nedihatin avêtin. Miletê necîb navê Ereban bû. Tirkîtî rastîyeke bextewerîyê bû. Farisî esilzadeyîya herî mezin a dîrokê bû. Hisên netew-parêzîyê yên kapîtalîzmê şîyar kirin. Bûn xwedî bandoreke narkotîkane, ku hemû rewşên paşverû binuxûmîne.

Lê sêyemîn pêngava mezin a globalbûna kapîtalîzmê mezinbûna lokaltîyê weke nirxekî pêşveçûna teknolojîyê ye. –radyo, tv- qedexeyên li ser ziman bêwate kirin. Xebatên li derveyî welat kirin ku hindekî Kurd û Kurditî bi ser xwe ve werin. Bêguman di bingehê vê rastîyê de bandoreke dîyarker a têkoşîna hemdem hebû. Berxwedana demokratîk a netewî bi xwe re nasnameya Kurd, ziman, çand û ji xwe piştrastî anî. Li dijî zora şer –îqtîdarê ya asîmîlasyonê- bi darê zorê afirand. Ji berxwedana xwe parastinê ji nû ve derketina çand û zimanên netewî re pîriktî dikir.

Hebûna Çandî Bi Ziman Pêkan e

Yê ku qeyd û kelepçe li zimanê wî hatibe xistin, li mejîyê wî, dilê wî nerîna wî jî qeyîd û kelepçe hatîye xistin. Hîn ez di heft –heşt salîya xwe de dema diçûm dibistana seretayî ya Cibînê, gundê cîranê me, min yek peyv jî bi Tirkî nedizanî. Di çûn û hatina dibistanê de min her dem ji xwe dipirsî; çima em bi Kurdî fêr nabin û çima dibistanên bi Kurdî nînin? Bêmafîya bi ser me de tê rêvebirin, di wan salan de min ferq kiribû. Perwerdeya bi zimanê dayîkê, mafê herî girîng û bingehîn e; di nava mafên sê nifşan de cih digire. Di hevpeymanên Ewrûpa de heye. Di hevpeymana mafên kesî û şaristanî û hevpeymana mafên aborî, civakî, çandî ya Neteweyên Yekbûyî de jî ev maf heye.

Hebûna çandî bi ziman gengaz e. Di vê mijarê de ziman, faktorekî herî girîng e. Ger zimanê dayîkê tê qedexekirin, ev nijadkujîya (jenosîd) çandî ye… Ji nijadkujîya fîzîkî tirsnaktir e. Ma bila Kurd tune bibin? Ger ev wiha bidome, wê Kurd bihelin û biçin. Ma em ê nikaribin zimanê dayîka xwe bixwazin? Divê mijarê de, divê dayîk û zarokên Kurdan xwestekên xwe bi dengekî bilind bînin ziman, reaksîyonên xwe yên demokratîk raber bikin; ev yek mafê wan ê herî xwezayî ye.”

Tu neteweyeke bêziman nikare were hizirandin, lewma divê xebatên di berbarê zimanê Kurdî de çalaktir bin.

Li Kurdistanê BZ di salên 300-250'an de di heman qralîyetên Helen de hebûna xelkê bi koka xwe, Helen û nemaze giranîya wan a li bajaran nîşan dide. Ku zimanê Helenî demeke dirêj hatîye bikaranîn. Mîna rola zimanekî mêtîngerîyê rol dilîze fena di roja me ya îro de bajarên Kurdistanê bi çand û zimanên bîyanî dijîn. Xelkên li derveyî bajaran jî bi çand û zimanên xwe yên herêmî dijîn.

Bi Îslamîyetê re zimanê derdikeve pêş zimanê Erebî ye. Erebî ku berê zimanê bedewîyan bû, bi bajarbûn û derketina Îslamîyetê re li Rojhilata Navîn bû zimanê herî xwedî prestîj. Zimanê zanist û wêje yê. Erebî weke zimanê fermî yê îqtîdar û şer serdestîyeke mezin bi dest xist. Li hemberî zimanê qels ên bi koka xwe Efrîqî li hemû bakurê Efrîqa û heta başurê Zagros-Torosan serdest bû. Çand û zanist jî bi Erebî tê kirin û tê jîyîn. Xwedî cihekî cihêwaz e. Yên zimanê Erebî bi kar tînin, dikarin di nava bûrokrasîyê de cih bigrin, dikarin di nava çîna ilimdaran de cih bigrin û ilim bikin. Ji lewre Erebî zimanê mezinbûn û berjewendîyan e. Girîngîya wê ya hetanî îro jî deyndarê van rastîyên madî ye. Piştî Erebî rola Farisî hîna bisînor e. Ew jî nexasim bi desthilatdarîya Selçûqîyan li Îranê bû zimanê fermî û belav bû. Kengî Selçûqî Anatolyayê zevt dikin û dewleteke navenda wê Konya, avadikin û zimanê wê yê fermî Farisî ye. Mewlana berhema xwe ya bi navê "Mesnewî" bi Farisî nivîsandîye. Zimanê Tirkî jî weke zimanê Kurdî wê demê xelkê li derveyî bajaran weke amurê axaftina devkî û wêjeyê bi kar tînin.

Serdestîya Erebî, li Kurdistanê bitesîr bû. Nemaze tebeqeya meleseydayan zimanê Erebî weke zimanê îbadetê dibînin û ev yek dibe sedema bandoreke dijwar. Her wiha xelkê li bajaran dilê xwe dibijînin şêwaza jîyana Ereban. Em ji kinc lixwekirinê şikil û şibût bigrin hetanî dara nifşan a xwe digihîne Ereban, dibe mode. Di çîroka her xanedayîyê de qulbeke Erebî pir normal dibe. Serdestîya di warê perwerde, hîndekarî, mode, sîyaset, dîplomasî, huner û zanistê de li ser zimanekî mîna Farisî ku di warê dewletê de xwedî ezmûn bû jî, bandor kir. Nîv bi nîv dagirkerîya Ereban diqewime, hemû Rojhilata Navîn nav û leqebên Erebî li xwe dikin. Ev serdestî hetanî pêşketina têgihiştina netew-dewletan û netewan bi awayekî dijwar didome.

Bi belavbûna sîstema kapîtalîst û şikilgirtina netew-dewlet ve pêvajoya asîmîlasyona li ser çand û zimanê Kurdî hîna dijwartir dibe. Li zordestîya Erebî û Farisî ya Tirkî jî zêde dibe. Di serdema seretayî û navîn de çand û zimanê Kurdî yê di nava etnîsîteyê de hebûna xwe parast. Bi derfetên teknîk û zanistê yên zêdebûn sê çand û zimanên serdest weke çand û zimanên fermî bi bandora xwe zimanê Kurdî baş pelixandin û helandin. Çand û zimanê ku di serdema navîn de jî gelek berhemên wêjeyî (mîna Ehmedê Xanî, Mem û Zîn) dan, di bin zexta sîyasî de her ku çû teng bû. Kurdîtî weke çand û ziman xistin rewşeke biguman. Kirin mijara guneh û gunehkarîyê, her ku çû Kurdbûyîn krîmînalîze kirin. Bi pratîka herî dijwar a guneh-zindan a bûrjuvazî re rûbirû hate hiştin. Pirsgirêkên têkîlîya xwe bi

onê diqewimin û di nava fermîyetê de cihên xwe digrin. Zordarî aborî û berjewendîyên sîyasî çiqas bikevin rojevê, helandin jî ew çend zû dibe.

Li ser hebûna çanda Kurdistanê herî kêm bi qasî şer û terorê asîmîlasyona bi darê zorê roleke texrîbkar leyîstîye. Em dikarin heman rêbaza dîrokî pêk bînin û biçin hetanî serdemên seretayî. Heger em bibêjin çand û zimanê Sumerî ziman û çanda herî mezin a asîmîlasyonê bû, divê weke gotineke nepixandî neyê dîtin. Em vê yekê ji nîzama hevok û peyvên wê fêm dikin. Berê zimanê Sumerî û li gor rêzê Hûrî, Mîtanî, Urartu, Medî û Persî, piştre jî li gor rêzê zimanê Babilî û Asûrî çavkanîyên wan Aramî ne. Paşê jî Aramî di serdemên seretayî de li Rojhilata Navîn zimanên asîmîlasyoneke mezin bûn. Mirov dikare vê rastîyê di pirtûkên Hîtît, Urartu, Mîtanî, Med û Persan de bibîne. Mîna İngîlizîya îro zimanê Aramî jî weke "înteretnîsîte" ya wê demê zimanê hevpar ê ji hev du fêmkirinê bû. Nexasim arîstokrasî û bûrokrasîya dewletê yek ji zimanên zêde bi kar tîne jî zimanê Aramî ye. Zimanê herêmî tevî zimanê Aramî tê bi karanîn. Mîna ku em îro jî dijîn, zimanê fermî yê îqtîdarê di danûstendinên fermî yên dewletê de esas tê dîtin û di wê demê de Aramî, hîna berî Akadî û Sumerî zimanê esasî ye. Zimanên herêmî zêdetir di nava gel de ku kesên xwendin û nivîsandina wan nîne weke amurekî ragihandina devkî bi kar tînin. Mirov vê rastîyê dikare di pirtûkên Urartuyan de bibîne. Çawa ku piranîya rêveberên dewletên bindest bi zimanên İngîlîzî û Fransî dipeyivin.

Di pirtûkên Persan de cihê Aramî eşkere ye. Di wê demê de li hemû Rojhilata Navîn him zimanê dîplomasîyê him jî zimanê bazirganîyê ye. Di hemû tomarên pêwendîdar de tê dîtin ku asîmîlasyon di mîmarîya rêveberîya dewletê, wêjeyê û hiquqê de roleke mezin leyîstîye. Heta tê texmînkirin ku Îsa jî bi Aramî zanîbûye. Zimanê Suryanî ku şêweyekî neteweyî yê Aramî ye. Amurekî din ê asîmîlasyonê ye. Zimanê Îbranî hîn di qadeke bi sînor de xwedî bandor e. Lê Helenîzm ji ber ku di rewşa dijber de belav dibe, zimanê Helenîzmê li Rojhilata Navîn xwedî bandor e. Mîna İngîlizî û Frensîya îro. Helenî û Suryanî jî bi hev re di rêyekê de ne. Her du jî li Kurdistanê nemaze li bajaran ji bo bitesîr bibin têdikoşin. Riha ji bo vê yekê mînakeke xweser e. Aramî çandeke kûr e ku Ermenî, Suryanî, Erebî, Kurdî û herî dawîyê jî Tirkî jîyaye. Lê belê di heman demê de rê li ber asîmîlasyoneke dijwar û kozmopolîtîzmeke zêde vedike. Mirov ji rewşa îro ya Rihayê vê rastîyê baş dikare fêm bike. Rola zimanê Suryanî di çanda Kurdistanê de ji Erebîya paşê li pêştir e. Mirov dikare bibêje weke zimanê ronîbûnê rol lîstîye. Ya esas ji ber ku Suryanî li bajaran rûniştin, ev encam derdikeve holê. Kurd weke xelkê Komagene zimanê devkî yê koçerî û gundîtîyê zaraveyên Kurdî bi kar tînin. Çavkanîyên wan ên nivîskî bisînor in, lê nayê wê wateyê ku qet nînin. Nemaze li paytexta Mîtanîyan Waşûkanîyê (li ser sînorê îro yê Surîyê-Tirkîyê bajarê Serekanîyê û Amûdê) gelek tomarên nivîskî raber dikin ku BZ di salên 1500'an de proto-Kurdî weke zimanê nivîsê hatîye bikaranîn.

Li Ser Çanda Kurdistanê Polîtîkayên Asîmîlasyonê Yên bi Darê Zorê

Hebûna çandî bi ziman gengaz e. Di vê mijarê de ziman, faktorekî herî giring e. Ger zimanê dayîkê tê qedexekirin, ev nijadkujîya (jen–osîd) çandî ye… Ji nijadkujîya fîzîkî tirsnaktir e.



Abdullah Ocelan

Yek ji polîtîkayên civakî yên blokên îqtîdar û şer, herî zêde serî lê dane polîtîka asîmîlasyonê ye. Bi gotineke giştî asîmîlasyon, helandin û bişaftina çandê ye. Blokên îqtîdarê û şer bi polîtîka asîmîlasyonê dixwazin komên ku di bin destên xwe de digrin, ji qabîlîyeta berxwedanê bixînin û ji bo vê yekê jî amurên destên wan de distînin. Di serî de li ser zimanê herêmî ku zihnîyetê îfade dike zimanê serdest tê ferzkirin. Bi rêya zimanê fermî çanda zimanên herêmî têne baskokirin û nikarin di jîyanê de rol bilêyîzin. Çand û zimanê serdest weke zimanê xwendin, sîyaset û aborîyê ji bo kesên bi kar bîne xwedî sûd e. Kesê çand û zimanê bindest jî bi kar tîne wenda dike. Di nava vê dualîyê de zehmet dibe zimanê herêmî xwe li dijî zimanê îqtîdarê ragire. Hela heger ev ziman nebibin ên nivîsarîyê û zaravayê xwe yê sereke dest nîşan nekiribin. Wê dawîya van ziman û zaraveyan tarî be. Asîmîlasyon ne tenê li ser ziman her wiha li ser hemû sazîyên civakî yên îqtîdarê şekil dane wan tê meşandin. Dîn û neteweyên serdest di her astê de li gor rastîya sazîyê tê dawerivandin. Sazî hetanî di warê sîyasî, civakî, aborî û heta zihnî de bi awayekî fermî were naskirin û bi awayekî hiquqî were parastin, sazîyên hindikayîyên din û yên têkçûyî xwe li gor sazîyên serdest an bi zorê yan jî bi dilê xwe, li asîmîlasy-

û rêgezên wê her wiha veguhestina rastîyan bi berpirsyarî û rastdarî ji bo raya giştî. Ragihandin girêdayî ye bi kêşeyên civakê û nirxên civakbûyînê, mirovatîyê û mîrateya şaristanîyê diparêze ji hêleke din ve di rêza gelan disekine beramber metirsî û gefxwarinên hundir û derve yên li derdora hermê ne. Her wisa rewşa şoreşan û berxwedanan vediguhêze.

Bi sedema geşedanên ku li herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê ku ji destpêka sala 2011'an z ve û destpêka şoreşa 19'ê tîrmehê 2012'an z û di nav de damezrandina Rêveberîya Xweserîya Demokratîk û ji ber ku rêjîmên desthilatdar ên ku li gor polîtîka "jev veqetîne, desthilatdar be" li beramberî pêkhate û gelên Sûrîyê tev digerin. Vê yekê bandoreke pir mezin li têkilîyên di navbera ereb, kurd û suryanan de dike, lewre pêwîst bû ku ragihandinek li ser bingeha xurtkirina pêwendîyên di navbera gelan de bê avakirin, derkeve holê. Her wiha her pêkhate û gel bikaribin çanda xwe ya taybet dîyar bikin û bixin pratîkê. Ji bo vê belavbûna dezgehên ragihandinê yên cihêreng bi awayekî berbiçav ew refleksyoneke xwezayî ye di vê rewşa ku gelên bakur û rojhilatê Sûrîyê azadîyê dijîn û ji bin zora desthilatîyê derketin, her wiha xwesteka bikaranîna çanda xwe, li gel nêzîkatîya xwesteker di navbera gelan de bi cih bikin.

Li alîyê din êrîşên derve bi nûnertîya çeteyên serdemê "Daiş û xwişkên wê" û dagirkerîya tirkan ji herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê "Efrîn, Serêkanîyê, Girê Spî" re û berxwedanîya hêzên cîgayî (xwecihî) mîna QSDê; pêwîst dike ku ragihandineke berxwedêr û pabend hebe, da ku piştgirîya şoreşê û berxwedana gel û hêzên gel ên rewa bike, li beramberî plansazîyên dagirkerîyê û êrîşên wê li ser gelên herêmê.

Û bi sedema rola mezin a ragihandinê ku mîna çekekî bibandor di şoreş û berxwedanan de ye; me weke desteya sernivîserîyê ya kovara Şermola ev mijar weke dosyayekê ji hejmara pêncemîn re pesend kir. Jixwe wê hejmara nû çend mijar û berhemên binirx ên mijarên wêjeyî yên curbicur di nava xwe de bihewîne. Bi hêvîya ku xwînerên me yên hêja û delal qezenc û sûda herî mezin jê bigirin.

Pêşekî

Ragihandin û bandora wê li berxwedan û şoreşê

Desteya sernivîskariyê

Di seranserî dîroka mirovahîyê da ragihandin roleke belî lîstîye, di dema rabirdû de dûkela êgir li cihên bilind, kevok, name yan mirov bi xwe jî weke alaveke ragihandinê dihat bikaranîn, da ku nûçe û agahîyan veguhezîne, lê bi demê re amûr û dezgehên ragihandinê; bipêşketin û di şêweyê rojname, kovar, belavok, kenalên televizyonê û radyoyan de; derketin pêşber mirovan. Di vê dawîyê de tora enternêtê jî bi malperên pêwendîyên civakî derkete pêş.

Ji ber rol û peywira ragihandinê di tomarkirina bûyeran, analîzkirin û veguhestina wan ji bo cemaweran her wiha rola wê ya arastekirina raya giştî, êdî navê "Hêza Çaremîn" lê kirin. Hin jî navê "Hêza Yekemîn" lê dikin. Êdî teknolojîya nûjen di rêya dezgehên ragihandin; hişên mirovan kontrol dike.

Ji sala 2010'an, dîyar e ku dezgehên ragihandina nûjen rola xwe lîstin di warê domkirina şoreş, protisto û alozîyên herêma erebî de.

Êdî ragihandin xwedî roleke çalak e di veguhestina bûyerên rojane yên şoreş û berxwedanan, û belavkirina raman

• **Pirtûkên derketî** .....
- Pirtûkên derketî.. (Destеya sernivîskariyê) 58

• **werger** .....
- Ferhad Pîrbal helbestvanekî surrealîst di civakeke surrealîst de .. (Dr. Mihemed Refhet, Wergera Ji Ji Soranî: Besam Mistefa)..... 61

• **Huner** .....
- Sê Cerdevan.. (Beşîrê Mele Newaf) 66

• **Çîrok** .....
- Çar bîranîn.. (Elî Silêman) 71
- Çar bira.. (Luqman Silêman) 74
- Gelo ez ê ber bi ku ve biçim?.. (Aras Hiso) 77

• **Helbest** .....
- Sêwî.. (Salihê Heydo) 80
- Delala Baranê.. (Nûrî Yekta) 83
- Xewnek ..(Ehmed Tahir) 85
- Hîna li xwe digere.. (Gêlo Îsa) 86
- Cenga li ser qafê min.. (Yasin Ahmad) 89
- Eşqa te.. (Zerdeştê kal) 91

• **Serbest** .....
- Gundê Şekerîyê.. (Şerîf Mihemed- Welîd Bekir)..... 92
- Wêje û Jiyan .. (Mehmûd Misto) 94

Naveroka Hejmarê

• **Pêşekî** .....
- Ragihandin û bandora wê li berxwedan û şoreşê... (Desteya sernivîskariyê) .. 5

• **Analîzên hizrî** .....
- Li Ser Çanda Kurdistanê Polîtîkayên Asîmîlasyonê Yên bi Darê Zorê ... (Abdullah Ocelan) 7

• **Dosyaya hejmarê** .....
- Rola ragehandinê, desthilat û şoreş.. (Kakşar Oremar)..... 11
- Ragihandina di şoreşê de mezin dibe.. (Dilyar Cezîrî)..... 16
- Li kêleka berxwedanê di nava berxwedanê de bû-Ajansa Nûçeyan a Hawarê ANHA .. (Kemal Necim) 21
- Rola ragihandinê di şoreşê de û Rojava û Bakurê sûriyê bo nimûne.. (Pêşeroj cewherî)..... 26

• **Lêkolîn** .....
- Jin û Rojnamegerîya Kurdî... (Zehra Tunc) 28
- Gehandin û Ragehandin... (Berzo Mehmûd) 33
- Xanî û Desthilatdarî... (Diyar Bohtî) 39

• **Hevpeyvîna hejmarê** .....
- Li gel nivîskar û rojnameger Elî Roj e (Aram Hesen) 47

• **Jin û çand** .....
- Jinên Kurd Tevî Dagirkerîyê, Çand û Hunera Kurdî Zîndî Dikin .. (Hêlan Çiya) 51

Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî , herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

ŞERMOLA
شـــرمولا

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane û serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û rojhilatê sûriyê tê weşandin.
-Di 24 Êlûna 2018›an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019›an de derket.
-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê girtîye, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019›an Hatiye Dayîn.

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.
-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.
-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.
-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.
-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:
Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.
-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên giştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê giştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:
Aram Hesen

Beşa hunerî:
Rêvan Yûsiv

Desteya sernivîskariyê:
Aram Hesen
Ehmed Alyûsiv
Fatma Sîdo

-Malpera kovarê:
www.shermola.net
-E-MAIL:
shermola2018@gmail.com
-Telefon û whatsapp:
0998149668

-Kovar li çapxaneya Sîmav – Qamişlo tê çapkirin.
-Belavkirin û firotin li bakur û rojhilatê surî beşgeha Alşemal – Qamişlo 0998234958.
-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.
- Nirxê kovarê (1000 L.S).

ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye Hejmar: 5 Zivistana 2020 z

Dosyaya Hejmarê

Rola ragihandinê di şoreş û berxwedanê de

Tabloya Qapê: Şerîn Ismayîl

Tabloya: Eslan Mamo

Hevpeyvîna hejmarê li gel nivîskar û rojnameger Elî Roj e

Jin û rojnamegerîya Kurdî

Ferhad Pîrbal helbestvanekî surrealîst di civakeke surrealîst de